



Naverok

Sal 2 • Hejmar 7 • Payiz 1996

Yên ku qehir û barê dinê kişandine:
Cimaeta hemalên Kurd li Constantînopelê 3
Rohat Alakom

Di bîranînên Refîq Hilmî de
provakasyoneke Îttîhad û Terakkî 22

Mem û Zîn:
Şax û şovên zargotî û şîra EhmedêXanî 28
Michael L. Chyet

Mustafa Kemal û pirsê Kurdistanê 33
Zinar Soran

Ji bo rastnivîsîna Zazakî destpêkeke hêja 43
Osman Aytar

Siyaseta bi zimanê Tirkî 46
Salim Çeliker

Di Kurdî de guherîna dengên "R" û "L" 50
Malmîsanij

Nêçîra Çiyayê Evdal Begê 56
Berhevkar: Şefîk Kaya

Derheqê rastnuştina kirdkî (kirmanckî) de
kombiyayîşê Stockholmî 72

"De vaji Margos, ti kotî ra yî?" 84
Migirdîç Margosyan

Kurd û bajar (The Kurds and the City) 91

Nûçeyên komeleyê 93

Sal 2
Hejmar 7
Payiz 1996

Xwedî

Komeleya Nivîskarên Kurd
li Swêdê

Redaksiyon

Rohat Alakom
Osman Aytar
Firat Cewerî
Mahmûd Lewendî
Zinar Soran

Şertên abonetiye

Salek: 200 SEK
Niv sal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din mesrefa
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan

Rûpelek: 1 000 SEK
Niv rûpel: 500 SEK
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan

Osman Aytar

Rismên bergê pêşî

Hemalên Kurd ên li Îstenbolê
*(Dr. Walter Philipp Schultz, Die
welt des Îslam, 1917, München).*

Postgiro

46 32 31-1

ISSN

1400-528X

Çap

Apec-Tryck

Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

Navnîşan • Adres • Adress:
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

Yên ku qehir û barê dinê kişandine: Cimaeta hemalên Kurd li Constantînopolê (*)

Rohat Alakom

Nivîsîna dîroka Kurdên ku di destpêka sedsala me û berî wê li paytextê Osmanî, Constantînopolê (Îstenbolê) jîyane, warekî lêkolînê yê gelekî nû ye. Tiştên ku di vî warî da hatine nivîsîn bi sînorkirî ne. Eger em hinekî pêşta herin, em dikarin bêjin ku di vê babetê de tiştekî rêk û pêk nehatiye nivîsîn. Ev babeta ne tenê di warê dîroka sîyasî, ji aliyê dîroka civakî de jî babeteke giring e, ev yeka bi dîtîna û peydabûna dokumentên nû ve hin jî giringtir dibe. Heta niha zêtir bi çavekî sîyasî an jî bi çavekî kulturî li cimaeta Kurdên Îstenbolê hatiye nihêrîn. Lê belê bi perspektîfa Îstenbolê an jî bajarekî mezin wek Îstenbolê li vê cimaetê nehatiye nihêrîn, tûnebûn an jî kêmbûna *lêkolînên bajar* di vî warî de valahîk pêk anîye. Ev realîta jî bo cimaeta Kurdên Îstenbolê jî derbas dibe.

Ji alîkî de bêkarî û belengazîya li Kurdistanê, ji aliyê din ew *romantîzma Îstenbolê* ya ku ji çîrok û efsaneyên li ser Îstenbolê hatine vegotinê, pêkhatiye, vî bajarê mezin wek navendeke rengîn Kurdên belengaz berbi xwe kişandine.

Piraniya Kurdên ku çûne Îstenbolê, debara xwe bi hemalîyê (barbirî, barkêşî) kirine. Karê hemalîyê çawa tê zanîn bi dirêjahîya dîrokê wek karekî giran û dijwar hatiye hesabîn. Hemalîyê gelek caran şibandîye dîlîtîyê (koletî) û mirovên here belengaz û xizan yên civatê bûne daxwazkarê hemalîyê. Ew

(*) Ev gotara di konferanseke navneteweyî ya bi navê *Kurd û Bajar* (The Kurds and City) de hatiye pêşkêş kirin, konferans di rojên 19-21 Ilonê 1996'an de li bajarê Sewrê li Fransê hatiye pêk anîn.

kesên ku hemberî peran barên giran kişandine, li Împaratoriya Osmanî de belengazîke mezin dîtine. Divê ji ber van sedeman be ku ew karên here giran û erzan bi çavê civatê wek "hemalîye" hatîye dîtîne, wek mîsal ew kesên di hin karan de şev-roj dixebitin, lê belê hemberî keda xwe hatineke nimz distînin: "ya em dikin hemalî ye..." dibêjin. Bi vî tehrî di zimanê Tirkî de peyva hemalîyê di dereca verbal (gotîne) de jî bûye nîşana bindestîyê û belengazîyê.

Di destpêka sedsala me de li Constantînopelê (Îstenbolê) bi hezaran hemalên Kurd diman. Piraniya cimaeta Kurd ku li Îstenbolê dijîya, hemalan pêk dianî. Karkerên ku hemalî ne dikirin jî hebûn, lê belê hejmara wan angorî hemalan kêm bû, ji ber vî sedemê ew jî hemal dihatin hesibîn û bi nav kirin. Yek ji wan dîndarên Kurd, Seîdê Kurdî hejmara hemalên Kurd li Îstenbolê li cîhekî 20 hezar, li cîhekî mayîn 40 hezar nîşan dide. Ev hejmaran, ji hejmarên hemalan zêtir, hejmara hemû Kurdên Îstenbolê dikare nîşan bide. Karkerên Kurd yên mayîn ku li Îstenbolê diman, wek parêzkar, berdestî, garsonî, xedemetî, kesê daran dişkênin, paqijkar, kesên di dezgah û kargehên piçûk de dixebitîn. Di çavkanîyan de qala *Partîya Emeleyên Kurd* jî tê kirin ⁽¹⁾. Hebûna wan cîwanên ku ji devera bajarê Wanê dihatin û di qonaxên mezin de kar dikirin û bi navê "ayvaz" dihatin nasîn, hêjayî lêkolînan e: "*Kesên ku li Îstenbolê di qonaxên mezin de kar dikirin, piraniya wan ji Wanê dihatin, ya Ermenî bûn yan jî Kurd bûn. Di nîveka sedsala 19'an ya duwemîn de hejmara ayvazan her çûye zêtir bûye. Di çaryeka sedsala bîstan ya yekemîn, piştî salên şer di qonaxan de ayvaz nemabûn. Daîreyên resmî bi vî navî xedeme hildidan ser kar*" ⁽²⁾.

Derheqa hemalên Kurd ku hejmara wan digihîste bi hezaran, qasî ku em pê dizanin heta niha lêkolînek û xebateke zanistî nehatîye nivîsîn. Ew mirovên ku hêzeke dînamîk pêk dianîn, car caran bûne hedefê zordestîyên aborî, polîtîk û etnîkî. Ji aliyê din ji ber nezaniyê û bêgavîyê ew bi xwe jî mecbûr mane tevî hin bûyeran bûne. Gelek neheqî hatine serê wan.

Ji ber van sedemên negatîf, hemal mecbûr diman tevî hin bûyeran dibûn û mercên vê tevbûnê hertim hebûn. Di vê babetê de hesabên hin dorberan jî hebûn. Hemalan ev دنیا û jîyana xirab ji xwe re wek dijmin dîtine, mecbûr mane vê carê ew bi xwe dijî vî yekê derketine. Ew dorberên ku diketine bin hemalan, bi vî tehrî hemal ji armancên xwe re kirine hacet. Lê belê mirov divê bide dîyar kirin ku hesabên wan hertim bi hev negirtîye.

Di lîteratura derheqa hemalên Kurd de em rastî çend peyvan tînin ku nîşan didin weki hemalên Kurd qet nebe di nav xwe de nîv-rêzkirî, nîv-rêxistinî bûne, wek *serokhemal, keyayê hemalan, reîsê hemalan, tehsildarê hemalan, lonçayên hemalan...* Derheqa rêxistinên hemalên Kurd de li ber destê me agahdarî û zaniyarîyên teknîkî pir mixabin gelek bi sînorkirî ne. Lê belê ew îfadeyên li jor rêzkirî jî bi vekirî nîşan didin ku, hemalên Kurd di nav xwe de

bi tehrekî resmî, nîv-resmî an jî rêxistinên ne resmî yên kevneşopî pêk anîne. Çawa emê paşê jî bibînin hemalên Kurd, bi taybetî piştî salên 1918 êdî hêzên xwe kirine yek û di nav wan de bendên grubê pêk hatine. Di vî warî de pêwîstiya çêkirina zêde lêkolînan li meydanê ye.

HEJMARA HEMALÊN KURD Û DEVERÊN KU JÊ HATÎNE

Hejmara hemalên Kurd di navbera dawîya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de her çûye zêde bûye. Derheqa hejmara wan de reqemek dayîn, gelek dijwar e. Hejmara wan ji hezaran derbas dibe. Hin çavkanî hene ku hejmara wan bi deh hezaran nîşan didin. Ev nezelaîya hejmara hemalan, bi giştî ji nezelaîya nifûsa Kurdên ku wan salan li Îstenbolê diman, tê. Di vê babetê de têzên cuda hene. Di jimartinên nifûsan yên ku di wan salan de dihatin çêkirin, ji der nifûsên cimaetên Rum, Ermenî û Cihuyan, nifûsê cimaetên etnîkî yên mayîn bi giştî di bin kategoriya "misilman" de dihatin nîşan kirin. Bi vî tehrî di nav xwe de belavbûna nifûsê misilman û di vê babetê de hejmarên nifûsên cimaetên etnîkî yên mayîn derbasî ser kaxizan nebûne û nehatine qeyd kirin.

Di nivîseke ku derheqa hemalên Kurd de di sala 1918'an de hatîye nivîsîn, hejmara wan "pênc-deh hezar" tê nîşan dan⁽³⁾. Çavkanîke mayîn jî nîşan dide ku Kurdên Îstenbolê ku piranîya wan hemal pêk tînin li Unkapanîyê dijîn û hejmara wan qasî deh hezaran e⁽⁴⁾. Eger mirov ji van çavkanîyan rê bikeve, mirov dikare bêje ku hejmara hemalên Kurd li Îstenbolê navbera pênc û deh hezaran de diguhire.

Ji berê de li Îstenbolê civateke Kurdan ya dînamîk hebûye, mirov vê yekê raste-rast nîn be jî, ji hin çavkanîyan derdixe, wek mîsal di şerê Uris-Osmanî yê sala 1877'an de Ali Şamîl Bey ji malbatan Bedirxanîyan qasî 3000 kes bi daxwaza wan li Îstenbolê berev kirîye û şandîye şer. Piranîya wan di şer de mirine⁽⁵⁾. Ew kesên ku sal û hêza wan ji şer re dest daye, mirov fam dike ku ji nav hemal û karkerên Kurd hatine hîlbijartin.

Yek ji wan dîndarên Kurd, Seîdê Kurdî ku bi derdên hemalên Kurd re mijûl bûye, di berhemeke xwe de hejmara hemalên Kurd 20 hezar nîşan dide⁽⁶⁾. Li her aliyên Îstenbolê hemal hebûne. Di wan salan de pirtûkên ku ji bo turîstan hatine weşandin, ji bo zanîne didin dîyar kirin ku li serê her kuçeke Îstenbolê hemal hebûne. Li îskeleyan, deriyên gumrikê, meydan, serê kuçan, çayxane, li dorberê kanîyan û pêşîya camîyan cîhê berevbûna hemalan bûne, hemalên Kurd wek taxên Gedikpaşa, Unkapanı, Galata, Sirkeci û gelek taxên mayîn diman. Sibê heta êvarê li wan deran berev dibûn, hêvîya kar bûn. Li Îstenbolê kîtleke Kurdan ya belangaz û xizan hebûye: "Camîya Sînan Paşa ya muhteşem, bi cihê ketinê yê wek devê şkeftan yê bêderî li meydanê hukim dikir. Ji tîrêja berbangê ya pêşîn heta tarîya êvarê ji serî heta binî bi mirovan ve tijî dibû. Gişt li ser pîyan, mil didan milên hev. Li kuça ku ji Beşiktaşê heta Ortaköyê dirêj

dibû, li qerekola Hesên Paşa ya mezin, kanîyên her alîyên wê zûr dibûn, mêze dikirin... Ji kanîyan ya li jêr bi muslix, ya li milê çepê bê muslix bû, sibê heta êvarê dikşîya. Tramvayan deh û panzdeh deqeyan carekê, ji cîyê dûr, derbas dibûn. Ji bo ku li ser wan xetên di bin gihê de bûn, mirov tune bin, rê vekin, zengil dixistin. Pîranîya şênî Kurd bûn. Kurdên bajarên Erzîrîmê, Bitlîs û Wanê bûn” (7).

Ji her alîyên Kurdistanê hemal hatine Îstebolê. Pîranîya wan ji deverên Erzîrîmê, Bitlîs, Wan, Muş, Elazîxê û yên mayîn hatine. Hemalên Ermenî yên ku li Îstebolê diman jî, ji eynî deveran bûne. Ew hemalên Kurd û Ermenî yên



Hemalên Kurd li qehwexaneyê (Dr. Walter Philipp Schultz, *Die welt des Islam*, 1917, München).

ku ji berê de hatibûne vira, paşê derheqa îmkânên kar li Îstebolê hemwelatîyên xwe agahdar kirine û ji efrandina ”kolonîyên hemwelatîyan” re zemîn amade kirine. Hinek ji wan mehên zivistanê hatine li vir kar kirine, hinek jî heta ku hewcedarîyên wan yên bîngêhîn pêk bûn, du-sê salan li vir mane, wek mîsal yek ji wan temsîlkarên hemalên Kurd yên here kevn Zaro Axa, hemû jîyana xwe li Îstebolê derbas kirîye. Ji ber ku Kurd û Ermenî ji eynî deveran dihatin, mirovên ji herdu cîmaetan rîya Îstebolê nîşanî hevdu didan û derheqa mercên kar û jîyana bajarên mezin de şîret li hev dikirin. Bi kurtî li ser Îstebolê di nav mirovên van herdu cîmaetan de toreke înfomasyonê ya bi hêz pêk hatîye.

DERHEQA HEMALAN DE ÇEND DÎTIN

Di demên kevn de jîyana kuçan ya rengîn û jîndar li Îstenbolê timê bala kesên ku Îstanbol zîyaret kirine, kişandîye, wek firotkarên gerok, parsek, hemal, derwêş û seyên bêxweyî li kuçan elementên here berbiçav bûne. Ji nav cimaetên ku zêde ezîyet û cefa kişandine ya here bingehîn cimaeta hemalan bûye. Barên wusan giran kişandine ku mirovan bawer nekirîye, ji ber vê yekê jî ew bi navê "herkul" hatine bi nav kirin. Dema gerokan dîtîne ku barê ku çar kes hildidin, kesek hildide, şaş-metel mane. Hemal hebûne carekê de pîyanok hildane ser piştta xwe û di kuçên Îstenbolê de meşîyane, di bin van barên giran de gelek guhartinên anatomîk di bedena wan de pêk hatine, bi taybetî damarên wan hatine dereca teqînê, vê yekê gelek bala mirovan kişandîye. Hin gerokan hemal wek "kerên mirovî" bi nav kirine.

Gerokêkî Swêdî bi navê Birger Mörner ku tevî hemalên Kurd bûye û wextê wan yên vala ji nêzik ve teqîb kirîye, dibêje ku barên wan hildida, dikaribû "piştta gayekî bişkenda". Birger Mörner, şeveke remezanê diçe çayxanekê, li wir dibîne ku hemalên Kurd ji bo bîna xwe derxin çawa govend digrin. Birger Mörner van listikên Kurd dişibîne dansên Katalonyayê yên bi navê "zardanas" ⁽⁸⁾.

Barên ku hemalên Kurd dikşandin ne tenê tiştên bêcan bûn. Di wan salan de bi taybetî ji ber ku birin-anîna mirovan zêde pêşta neçûbû, hemalan dianîn, nexwaş, seqet, kal-pîr û zarok didane ser piştta xwe û bi peran ji cîhekî dibirine cîhekî din. Di nav van kesan de nivîskara Tirk ya navdar Halide Edip-Adıvar jî hebûye. Ew, di bîranînên xwe de qala vê yekê dike: "Nayê bîra min ku çawa ez ji Beşiktaşê heta Köprüyê peya kirim. Lê belê li Köprüyê ez dame hembêza hemalêkî, vê yekê di dilê min de hîseke şermkirinê û piçûkdîtîne ya ku ez tu caran ji bir nakim, peyda kir. Heta Silêmanîyê gelek rê hebû, bi taybetî wek Mercanê hevrazekî dik û berjor hebû. Heta wê demê, wexta Hamîneyê ezê bibirama cîhekî ya ez tramvaya bi hesp ya jî erebeyê sîyar dikirim. Ew zarokên ku min di hembêza hemalan de didîtin, min ji jor ve li wan mêze dikir, disekinîm. Ji wê rojê şûnda min li zarokên di hembêza hemal de bûne, min ji gelek nêz ew hez dikirin. Hemal yekî bejn bilind, qemer û wusan dihate xuyan Kurdekî dilnêrm bû. Qet nedisekinî hema suretên min, porên min miz didan û hewl dida min bide axaftinê. Hetayî cîhekî sekinî, eger Bacî dijî dernekeve bi kîsê xwe yê vala ve ji min re wê şekir ji bistenda. Xweydana ku ji bedana wî dihat, pozê min dagirtibû. Ew hezkirina li enîya wî ya mezin û li rûyê wî bala min nekişandibû. Ez ketibûme rewşeke wusan bêheysîyet, te digot hemû Îstenbol derketîye li min mêze dike, di hundirê min de şermek peyda bûbû. Min ji wî hemalî gelek nefret kiribû. Lê belê niha ji wî re û kesên wek wî yên ji derva ve bi hov û heywanî, hundirê wan sade û hebûnên mirovahîyê vedibêjin, pîr û pîr ji xwe re nêzik dibînim" ⁽⁹⁾.

1836 - BELAVKIRINA HEMALÊN KURD

Hemalên Kurd tam çî wextî hatine Îstenbolê mirov nizane. Lê belê Kurdên ku cara pêşîn bi kitlewî hatine Îstenbolê mirov dikare bêje ku hemalên Kurd in. Gelek hemal endam û hevalbendên *Ocaxa Yeniçeriyân* ya ku sala 1826'an de hat belav kirin, bûn. Hemalên Kurd di gelek şer û lêdan û serhildanan de wek hêzeke xurt şer kirine. Di sala 1826'an de dema *Ocaxa Yeniçeriyân* hate belav kirin, piranîya hemalên Kurd jî karên xwe wunda kirine û bi salan wek hêzekê bandûra wan nemaye ⁽¹⁰⁾.

Li cîhê hemalên Kurd, hemalên Ermenî tijî kirine: ”*Hemû hemalên Tirk û Kurd ji loncên xwe hatin bi dûr xistin û beşek ji wan bi şertê ku careke din venegere Îstenbolê, bi keştîyan ve, ew şandin Asîyayê*” ⁽¹¹⁾. Lê belê hemû lêkolînan di vê bawerîyê de nîn in: ”*Ji paytext bi temamî avîtina hemalên Tirk û Kurd divê ne rast be. Lê belê ji ber hevkarîya wan ya bi Yeniçeri û Bektaşîyan re, ew karên ku destê xwe de digirtin, bi eşkere tê fam kirin ku wunda kirine*” ⁽¹²⁾. Piştî ku Ebdulhamîd II derdikeve ser text, sîyaseteke pro-Kurd dimeşîne, dema mirov vê yekê difikire, mirov nikare bêje ku paytext Îstenbol jî hemalên Kurd re wusan wextekî dirêj girtî maye.

1896 - HEMALÊN KURD ÎSTENBOLÊ ”FETİH” DIKIN

Komek şorişvanên Ermenî di roja 26.8.1896'an de li taxa Îstenbolê ya bi Galata êrîşî *Banka Osmanî* dikin, bankayê zevt dikin û piştî vê bûyerê li Îstenbolê gelek xwîn tê rijandin. Bi sedan Ermenî, bi taybetî gelek hemalên Ermenî yên ku li Îstenbolê kar dikirin, di van bûyeran de tên kuştin. Li cîhê hemalên Ermenî ku mirine an jî karên xwe berdane û revîne, hemalên Kurd tên cîwar dibin. Hemalên Kurd yên ku sala 1826'an de dest ji vî karî berdabûn, bi vî tehrî di sala 1896'an de dîsa dibin hukumdarê hemalîyê ⁽¹³⁾. Bi taybetî hemalên Ermenî yên ku li taxa Kumkapiyê kar dikirin, hukumdarîya wan wunda dibe ⁽¹⁴⁾. Siltan Abdulhamîd II, ew hemalên Kurd ku anîye Îstenbolê, li dijî Ermenîyan wek hêzekê bi kar anîye û bi vî tehrî navê hemalên Kurd di medya cîhanî de xirab derketîye.

Di dawîyê de ew Ermenîyên ku êrîşî *Banka Osmanî* kirin, direvine dervayî welat. Ew bûyerên ku di roja 26.8.1896'an de dest pê kirine, bi rojan ajotîye. Ev êrîşên li dijî Ermenîyan li taxên mayîn yên Îstenbolê jî belav dibin. Rojnameyên bi 28.8.1896 terîxî dinvîsin ku hejmara mirîyan gihîştîye hezar kesî ⁽¹⁵⁾. Hejmara hemalên Ermenî yên ku di van bûyeran de mirine an jî dest ji karê xwe berdane navbera 400-500 kesan de diguhire ⁽¹⁶⁾.

Hemalên ku di van salan de tevî van bûyeran bûne tenê Kurd nîn in, hemalên ku bi koka xwe Tirk in an jî, ji kêmanîyên mayîn in jî tevî van bûyeran bûne. Bi taybetî hêzên resmî û yên leşkerî ku ev bûyera wek firsendekê dîtine, bi zanetî piştgirtîya van bûyerên li dijî Ermenîyan kirine. Lê belê kesên ku navê

wan xirab derketine, dîsa Kurd in. Di van salan de lîteratureke *contra-Kurd* hatiye efirandin û li cîhanê belav bûye. Maria Yordanidu, romana xwe ya bi navê *Loksandra* de qala "Kurdên bi bivir ku Abdulhamîd ji Kurdistanê anîne" dike. Angorî nivîskar, ev Kurd li dijî Ermenîyan wek hêzeke êrîşkar hatine bi kar anîn. Ew Kurdên ku li Îstenbolê daran dişkênin, di romanê de waha tên pêşkêş kirin: "Sibê zû sî çekî (250kg) dar li orta kuçê vala kirine, paşê Kurdên zenda wan bi quwet yê wê wek dêwan ku li dora fesên xwe destmal girêdane, bi bvirên xwe yê dibiriqin û tûj ve hatine daran bişkênin. Kurd heyrana bivirên xwe bûn. Li gundên xwe yê Kurdistanê jî bivirên xwe hildidin bal xwe û dema diçin xerîbîyê, dayîkên wan wek jinên Ispartayî çawa mertalan didin kurên xwe, wan jî bivir didan destê kurên xwe. Zarokê Kurd dema dikeve çardeh-panzdeh salîya xwe û dest pê dike kelecana cîwanîyê hîs dike, kulîlka nade destê xwe, bivirê xwe davêje namîla xwe: "derdê min heye, derdê min" waha diqîre, dest pê dike li taxên bajêr digere, li pencerên wek qefesan mêze dikir. Keça ku qebûl dikir wekî ji derdê wî re bibe derman jî pencera xwe vedikir: "ji derdê te re dibim gorî" digot û bersîv dida. Li ser vê yekê, zavayê berendam ku digot: "Ez jî bivir li vira dixim", bivir li ber derê keçikê dixist. Paşê diçû malê, ji bo ku bivir şunda bîne, diya xwe dişand û saya vê firsendê dê jî keçik didît. Kemala bivir ji bo Kurd gelek bû. Ji balteyên Kurd re çêr kirin, ji pêxember re çêr kirinê xirabtir bû" (17).

Di dezgahên *Qesra Yıldızê* (Yıldız Sarayı) dar û şivên bi taybetî dihatin çêkirin, ev daran di van bûyeran de hatine bi kar anîn. Di dawîyê de navê Siltan Ebdulhamîd II, wek "*Qizil Siltan*" derketîye (18). Hemalên Kurd yê ku berî sed salî hukumdariya hemalîyê li Îstenbolê xistine destê xwe, piştî van bûyeran, çawa emê paşê jî bibînin, vê carê dibin gorîyên zordestî û dekdolavên cihêreng.

1906 - ÇAVTIRSANDINA MEZIN

Hemalên Kurd tevî bûyerên piçûk jî bûne an jî dema bûyerek li Îstenbolê çêbûye, cara pêşîn hemalên Kurd hatine bîra mirovan. Di sala 1906'an de serokê beledîya Üsküdarê, Ridvan Paşa tê kuştin û hatiye gotinê ku Bedirxanîyan ev bûyera pêkanîne. Di dawîya vê bûyerê de gelek Kurd hatine girtinê. Di nav van kesan de hemal û *tehsîldarê hemalan* jî hene (19). Kesên çekdar ku li Göztepeyê Ridvan Paşa kuştine, angorî îfadeyan ji Bedirxanîyan Ali Şamîl Beg û xarziyê wî Abdurrezak Beg çek silah dane wan û kesên suçdar ji alîyê wan de hatine parastin.

Bûyera Ridvan Paşa, bûye bayîsê zordestî û teroreke mezin li ser Bedirxanîyan ku hejmara wan li Îstenbolê gelek zêde bû. Pêşîyê Alî Şamîl Paşa û gelek Bedirxanîyên mayîn nefîyê Trablusgarbê bûne. Ne tenê malbata Bedirxanîyan, navê Kurdên din ku li Îstenbolê dijîyan jî tevî van bûyeran bûne û ji van hinek cezayên giran dîdine. Di nav kesên ku hatine îdam kirin hin Kurdên Wanê,

Bitlîsê, Heqqarîyê hene. Ev kes hemal in an na, em pê nizanin, lê belê di çavkanîyên ku li ser vê bûyerê disekin, îfada : ... *bi tevbûna gelek hemalên Kurd*” cîh girtîye ⁽²⁰⁾.

Piştî vê bûyerê nêçîra ku li Îstebolê li hemberî Kurdan dest pê kirîye, gelek fireh bûye. Suc ji ferdîbûnê derketîye, dema em mezinahîya nefîkirinan mêze dikin, serokên Kurdan bi malbatanên xwe ve tevayî hatine ceza kirin. Ev yeka di warê sîyaseta Ebdulhamîd ya Kurdan de qonaxeke nû ye. Bi vî tehrî ew teza ku di gelek çavkanîyan de cîh girtîye û dibêje ku *”Ebdulhamîd Kurd parastine!”* dihate çî menayê, êdî eşkere dibû. Bandûra vê bûyerê ya xirab ku bi giştî ji cimaeta Kurdên Îstebolê û bi taybetî jî ji hemalên Kurd re gelek buha bûye, ancax bi îlankirina Meşrutîyeta II ve karîbûye ji holê rabe.

ÇEND HEWLDAYÎNÊN HEMALAN YÊN BOYKOTÊ

Di sala 1908’an de piştî ku Împaratorîya Avusturyayê hinek erdê Osmanîyan xiste bin destê xwe, pêwendîyên Osmanî-Awusturî berbi xirabbûnê diçin. Dema hêzên Avusturyayê erdê Bosna-Hersekê zevt kir, li Îstebolê li dijî



Xweyê qehwexaneyekê û hemalê Kurd (Dr. Walter Philipp Schultz, *Die welt des Islam*, 1917, München)

malên Awusturî bûyerên boykotê dest pê kir. Îttihatçîyan piştgirîya van bûyeran dikir, hemalên Kurd jî bi kîtlewî alîkarîya wan kirin. Malên Awusturî di gumrikan de dimîne. Malên ku di dikkanan de de dihatin firotên jî hatine

boykot kirin. Pêşengîya hemalên Kurd hemalekî bi navê Kîbar Elî dikir. Tevera Kîbar Elî û berxwedana hemalên Kurd ya wan salan di medya Awusturî de jî cîh digre. Rojnameke Awusturî bi Kîbar Elî re hevpeyvînekê jî çêdike ⁽²¹⁾. Kîbar Elîyê ku pêşengîya hemalên Galatayê dike wek kesekî : ”...*bêxwendî, kinik, bedena wî xurt, Kurdekî kose*” hatîye tasvîr kirin ⁽²²⁾.

Di van deman de kesekî hewl daye ku hemalên Kurd aş bike, dîndarê Kurd Seîdê Kurdî bûye, deverên ku hemalên Kurd zêde lê diman gerîyaye, çûye ”*cihên umumî û qawexanan*”, Seîdê Kurdî hemal tenê nehîştine, li dijî wan hêzên ku ketine binê hemalan derketîye û hemal hişyar kirine. Seîdê Kurdî gazî hemalên Kurd dike û wan re dipeyîve, ji bo Ermenîyan : ”...*emê bibin dost, emê destê xwe bidin hev*” dibêje. Seîdê Kurdî bi van gotinan ve, bi ihtîmaleke mezin xwastîye xirabîya bûyerên bi xwîn ku di sala 1896’an de qewimîne û sertîyên ku navbera hemalên Kurd û Ermenîyan de peyda bûne, careke din bîne bîra hemalên Kurd. Çawa tê zanîn di van salan de navê hemalên Kurd gelek xirab derketibû. Bi kurtî Seîdê Kurdî dijî vê tevgera hemalên Kurd derdikeve. Di cîhekî de dibêje ku bavê wî jî hemal bûye ⁽²³⁾. Ji alîyê din di nivîseke xwe de hejmara hemalên Kurd 20 hezar ⁽²⁴⁾, cîhekî mayîn de jî 40 hezar nîşan dide ⁽²⁵⁾. Ji ber ku piranîya cimaeta Kurd ya Îstenbolê hemalan pêk dianî, ev hejmarên ku Seîdê Kurdî pêşkêş dike, ji hejmara hemalan zêtir bi giştî hejmara Kurdên Îstenbolê dikare îfade bike. Ji ber ku ev reqemên Seîdê Kurdî gelek reqemên bilind in.

RONAKBÎRÊN KURD Û HEMAL

Di destpêka sedsala me de li Îstenbolê ronakbîr û welatparêzên Kurd ku li vîra organîze bibûn, dereng be jî ew mercên dijwar û zordestîya mezin ku hemalên Kurd di nav de bûn, dîtine û hemberî vê yekê nerehetîya xwe îfade kirine, li gel wan piştgirtîya xwe nîşan dane. Çawa em dibînin *Komela Pêşketina Kurdistan (Kürdistan Teali Cemiyeti)* ya ku di sala 1918’an de saz bûye, *Komela Malbata Bedirxanîyan, Komela Kurd Ji Bo Belavkirina Zanîn û Weşanan (Kürd Tamimi-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti)* di vê babetê de hewl dane.

Organa *Komela Pêşketina Kurdistan* ya nîv-remî *Jîn* de derheqa hemalên Kurd çend nivîs derketine. Di hejmara 24’an de bi navê *Sînorên Wezîfeyê - Ji Hed Derbasbûn* nivîseke bê îmza hatîye weşandin. Rewşa hemalên Kurd yê ku îskela Sirkeciyê kar dikin, hatîye zimîn, nivîs li dijî hêzên ku hemalên Kurd dizêrînin û zordestiyê li wan dikin, derdikeve: ”...*Ji berê de û niha jî kolonîke Kurdan ya li Îstenbolê pêkhatî, heye. Ev kolonî, ji alîyê karkerên Kurd ku hejmara wan zêde ye ku kesên din wan ”hemal” bi nav dikin, pêk hatîye. Ev rebenan him ji bo aborîya xwe, him jî bona rizqê malbata xwe ji deverên Kurdistanê yê cihêreng hatine. Ev belengazan li vîra bi namûs, bi heqê xwe, bi xweydana enîya xwe ve ji sibê heta êvarê diwestin, ber xwe didin û*

diperitin. Wek her welatî, li vira jî îdareke wan ya lonçayê heye ku ji alîyê hukumetê de hatîye testîq kirinê. Ev îdare pîrsên derheqa wan de, dubendîyên ku ji ber karên wan yên şexsî di navbera wan de peyda dibin û karên mayîn çareser dike û cîhekî de girê dide. Hukumet bi saya beledîyan vê îdarê û teugerên karkeran çavdêr dike. Bi kurtî her şuxilê karkeran, bi tehrekî baş û xirab bi rêxistinekê ve, bi serokatîke resmî ve girê daye. Ji derva kesek an jî hêzek dest dirêjî wê bike, ev yeka hetê xwe nezanîn e û bi peyvên xwenezanîne ve jî nikare bê îfade kirin û jî wê jî zêtir kirêtî û tevgereke reş-tarî ye” (26). Di nivîsê de tê dîyar kirin ku nivîskarê pêşîn yê rojnama Alemdarê Refî Cevad Beg û mudirê berpîrsîyar yê rojnamê Ahmed Kadrî Efendî çûne bal hemalên Kurd li Sirkeciyê, ji bo yekî ku bi dilê wan bibe serokê lonçayê, zor li hemalên Kurd kirine. Di hejmara kovarê ya 25’an de vê carê bi navê *Karkerên Kurd*



Kuçek lı Galatayê (Carl Ramberg, *Profetens söner*, 1912, Goteborg).

li *Îstenbolê* nivîseke mayîn hatîye weşandin. Nivîs bala xwendevanan dikşîne ser mercên dijwar yê jîyîne ku karker û hemalên Kurd di nav de nin û divê Kurd bi xwe alîkarîya van mirovan bikin: ”...Bi kurtî em dixwazin bêjin ku bi karkerên Kurd re em mijûl bin wekî biyanî tevî karê wan nebin”. Di eynî nivîsê de karkerên Kurd wek: ”...Tovê qenc yê pêşeroja Kurdistanê” hatine

nasandin ⁽²⁷⁾.

Di sala 1920'an de li Îstenbolê *Komela Malbata Bedirxanîyan* komelek tê saz kirin, di civîna vê komelê ya şeşemîn de li ser neheqîke li dijî hemalên Kurd hatîye sekinîn û di vê babetê de divê çî bê kirin, ev yeka hatîye peyîvîn. Biryarê çaremîn ku di civînê de hatîye girtin derheqa hemalan de ye: *"Hemalên îskeleya Hasirê para Salih Begê nedane - ev para li dijî qanûnê ye- Memurê Eminoniyê yê merkezê û cîgirê komîserê Tahtakaleyê zordestî li hemalan kirine. Piştî ku di vê babetê de hatîye axaftin, biryar hatîye girtin ku Abdurrahman Beg û Celadet Alî Beg divê herin serîkî bidin mudirîyeta polis, hewl bidin ku pêşî li kirinên bêqanûnîya van memuran bê girtin"* ⁽²⁸⁾. Celadet Alî Begê ku navê wî li vira derbas dibe, Celadet Bedirxan e, ku paşê bi xebatên xwe yên li ser zimanê Kurdî hatîye nas kirin.

Di xaleke bernameya *Komela Kurd Ji Bo Belavkirina Zanîn û Weşanan (Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti)* de hatîye dîyar kirin ku di nav karkerên Kurd divê hin kooperatîf bînin saz kirin ⁽²⁹⁾.

HEMALÊN KURD Û NASYONALÎZM

Nasîyonalîst û ronakbîrên Kurd li Îstenbolê dereng be jî giringbûna hêza karker û hemalên Kurd li Îstenbolê fam kirine. Hemal berê hertim piçûk hatine dîtîne, di nav mercên xirab yê jîyînê de ber xwe dane û li rastî her cure neheqîyê hatine. Hemal jî perçekî Kurdan in, divê mirov li pirsên wan xweyî derkeve û divê mirov wan bikşîne nav refen netewî, ev babetan tenê piştî Meşrûtiyeta II'an, dema pirsên wan gihîştîye dereceke mezin û hatine noqteke teqînê, wê çaxê hatine fam kirinê. Pêşengên Kurd tevî nav refên karkerên Kurd dibin û di nav wan de propagandayê dikin, di navbera xwendekar û hemalên Kurd de pêwendiyên xurt tînin pêk anîn, kontaktên pêşîn tînin bi dar xistin ⁽³⁰⁾.

Kesê ku pêwendiyên hemalan li gel nasîyonalîzma ku li Îstenbolê pêşketîye û tevgera ronakbîrîyê pêk anîye, Seyîd Abdulkadîr e. Dema ku Seyîd Abdulkadîr di sala 1908'an de meha remezanê ji nefîkirinê vedigere Îstenbolê, hemalên Kurd diçin pêşîyê û şabûna xwe nîşan didin ⁽³¹⁾. Babeta ku Seyîd Abdulkadîr ji aliyê hemalan de zêde hatîye hez kirin û jê re zêde hurmet hatîye nîşandin, di gelek çavkanîyan de cîh girtîye. Kesên wek Qadrî Cemîl Paşa û Nurî Dersîmî ku bûna şahîdê vê yekê, di vê babetê de şirovekirinên cihêreng pêşkêş dikin. Seyîd Abdulkadîr ne tenê ji aliyê hemalan de ji aliyê hemû cimaeta Kurd ya li Îstenbolê de hatîye hêz kirin û jê re hurmet hatîye nîşandin : *"Seyîd Abdulkadîr Efendî, temsîlkar û şexsîyetekî sembola cimaeta Kurd ya ku li Îstenbolê dima, bû. Karkerên Kurd her karê xwe, şerêşiyên xwe bi saya mudahala şahsîyeta wî çareser dikirin. Alîkarîya maddî ya karkerên Kurd ji bo Komela Xwendekarên Kurd - Hêvî bi rîya wî dihate kirin"* ⁽³²⁾.

Pêwendiyên Seyîd Abdulkadîr û Seîdê Kurdî li gel hemalan, di destpêkê de

li ser bingehê hezkirin û hurmeta ku di navbera "kek" û "birayên piçûk" de heye, pêşta diçû. Pêwendîyên ku hebûn ji organîzebûnên modern dûr bûn.

Ji bo ku hemal bikevin nav refên tevgera netewî, hewldayîna pêşîn ya ciddî ji aliyê *Komela Pêşketina Kurdistan* de (Kurdistan Tealî Cemiyeti) ya ku di sala 1918'an de saz bûye, hatîye nîşandin. Seyîd Abdulkadîr dibe serokê komelê. Ji vê demê pêva êdî pêwendîyên "kek" û "birayên piçûk" hêdî hêdî tên berdan, li şuna van pêwendîyan jîyîneke rêxistinî û modern bandûra xwe nîşan dide. Beşeke mezin ya wan hatinên aborî yên ku bi saya Seyîd Abdulkadîr ji karker û hemalên Kurd dihatin berev kirin, ji çûyînên rêxistinê

re - Kurdistan Tealî Cemiyeti- hatine xerc kirin ⁽³³⁾.

Hemalên Kurd yên ku berê tekoşîna jîyînê didan, di van salan dest pê dikin bi tekoşîna gelê xwe ya etnîkî û netewî ve mijûl dibin. Dema reîsê karkerên Kurd Reşîd Axa nêzîkî tevgera netewî ya Kurd dibe, mirov dikare vê rewşa wî di vê çerçevê de binirxîne. Ew bi xwe Kurdê ji aliyê Xînisê bûye. Dema serhildana sala 1925'an, Şêx Seîd di îfada xwe de gotîye ku kurê wî Elî Rîza wexta çûye Îstebolê ji bo ku hin kesan bibîne, wê çaxê li mala



Hemalê li Îstebolê (O.A. Rygaard, *Mellen tyrker og kurder*, 1935, *Kopenhagen*).

reîsê karkerên Kurd Reşîd Axa maye⁽³⁴⁾. Çavkanî hene ku diyar dikin ku Reşîd Axa yek ji endamên aktîf yê *Komela Pêşketina Kurdistanê* bûye⁽³⁵⁾.

Seyîd Abdulkadîr di sala 1925'an de li Îstebolê tê girtin, wî dişînin Dîyarbekirê û li wir jî tê îdam kirin. Ev yeka ji aliyê hemalên Kurd de wek

wundakirineke mezin tê hesabîn. Mudirê Emnîyetê li Îstenbolê piştî ku Seyîd Abdulkadîr digre, vê carê hewl dide ku hemalên Kurd bêdeng bihêle: ”*Ekrem Beg li hemberî serhildaneke muhtemel ya Kurdan tedbîr girt. Hejmara Kurdan li Îstenbolê deh hezar bû û ev bi taybetî hemalên li dorberê Unkapaniyê bûn. Demekê hemal rabûne ser pîyan, heta dînitî kiribûn memûreki polis avitibûne behrê. Ekrem Begê ji piştguhê xwe re neavît, ew jî xistine bin otorîta xwe*”. Di vê demê angorî gilî-gotinên digeriyan, ”*Kurdên çekdar li Îstenbolê*” xwe amade dikin ku serî hildin, derheqa vê yekê de nûçe digihên Mudirê Emnîyetê yê Îstenbolê ⁽³⁶⁾.

LÎDERÊ EFSANEVÎ YÊ HEMALAN: ZARO AXA (1774-1934)

Hemalên Kurd ku qehir û barê dinyayê kişandine, piştî ku li serê wan re gelek bûyer derbas dibin, di dawîyê de lîderê xwe yê efsanevî Zaro Axa jî diafrînin. Şahsiyete herî karîzmatîk yê cimaeta hemalên Kurd li Îstenbolê, em dikarin bêjin ku bêguman Zaro Axa ye. Zaro Axa (1774-1934) yek ji hemalên Kurd e ku di dawîya sedsala 18’an de hatiye Îstenbolê. Zaro Axa di dewra xwe de mirovê bi salan yê herî mezin, yê herî kal hatiye hesabîn, navdariya Zaro Axa ji vir tê. Serpêhatîya Zaro Axa hêjayî lêkolîneke bi serê xwe ye. Zaro Axa di van salên dawîn bi çend nivîsên ku di hin kovar û rojnaman de derketî dîsa xwe daye bîranînê û axaftinê, li ser wî li Amerîka ⁽³⁷⁾, Îngîlterê ⁽³⁸⁾ û Swêdê ⁽³⁹⁾ çend nivîs hatine weşandin.

Zaro Axa di navbera salên 1774 -1934’an de jîyaye û salên wî gihîştine dorberê 160’î, mirovê herî kal yê cîhanê hatiye qebûl kirin. Zaro Axa li bajarekî Kurdistanê, Bitlîsê hatiye dinê, paşê çûye Îstenbolê û li wir wek hemal kar kirîye. Dema Ocaxa Yenîçerîyan di sala 1826’an de ji ortê radibe, Zaro Axa wê demê 50 salî bûye û bi salan li Îstenbolê serokatîya hemalên Kurd kirîye: ”*Li vira cîh hatiye, em naxwazin Kurdên Îstenbolê ji ku karên giran yê gumrikê hema bi temamî di destê xwe de digrin, ji bîr bikin. Serokê wan mirovê herî kal yê cîhanê, meşhur Zaro Axa ye, 152 salî ye û dema ez van rûpelan dinivîsim hela hê sax e*” ⁽⁴⁰⁾.

Zaro Axa di salên xwe yê dawîn de bûye xademeyê sereke yê meclisa bajêr, di sala 1934’an de li Îstenbolê mirîye. Zaro Axa tam 100 salî li Îstenbolê hemalî kirîye.

Zaro Axa di roja 19.6.1934’an de mirîye û nûçeya mirina wî bala hemû medyaya cîhanê kişandîye, nexwaşxana ku lê mirîye bi rojnamevanan ve tijî bûye. Di dawîyê de rojnameyên bi 30.6.1934 terîxî vê nûçeyê digihînin xwendevanên xwe: ”*Mirovê herî kal li dinê, mir!*”.

Ji bo mirov Zaro Axa ji nêzik ve nas bike, divê sedî-sed bi zimanê reqeman ve bipeyîve. Zaro Axa sedsal û nîvek jîyaye, tevî şeş şerên mezin bûye. Di salên ku jîyaye, qasî deh siltanan li Împaratorîya Osmanî hukim kirîye. Zaro Axa angorî hin çavkanîyan 10 caran, angorî hin çavkanîyan 12 caran...zewicîye.

Ji der van reqeman, reqemên hin hûr derketîne holê. Angorî hesabên yeki reqemhez, Zaro Axa 1884 meh, 58305 rojan jîyaye. Eger em gilî-gotin û efsaneyên li ser Zaro Axa jî hesab bikin, lîsteya reqeman em dikarin hin jî dirêj bikin, wek mîsal hebûna sê gurçikê wî...⁽⁴¹⁾. Zaro Axa dema xortanîya xwe! fikirîye, rojên ku tu car ji bîr nekirine, dema 90 salî bûye, ew salên xortanîyê wî bûne.

Qebûlkirina Zaro Axa wek mirovê herî kal li dinê kêrî hin şîrket û dorberên menfeatê hatîye, ji ber vê yekê jî, ji Zaro Axa re li welatên cihêreng yê cihanê îmkana gerê peyda bûye. Her gera Zaro Axa bi bûyer û rengîn derbas bûye. Zaro Axa di sala 1925'an Îtalya, sala 1930'yî de Amerîka, sala 1931'an de Îngiltere zîyaret kirîye. Bi taybetî gera wî ya Amerîkayê ya sala 1930'yî gelek bi rengîn derbas bûye. Zaro Axa 18.8.1930'yî de hatîye Amerîkayê û li vira qasî 9 mehan maye, li vira bi gelek şahsîyet û temsîlkarên sazgehên navdar dîtîye ⁽⁴²⁾.

Gelek organên medyayê, bi taybetî medya Tirkîyê her çiqas Zaro Axa bi koka xwe Kurd e, dîsa jî "Tirk" nîşan dane, bi vî tehrî zanava wî ya Kurdî hatîye veşartin. Zaro Axa du caran derketîye hizûra Atatürk û ew wek "siltan" bi nav kirîye ⁽⁴³⁾. Derheqa serhildana Şêx Seîd ya ku di sala 1925'an de teqîyaye, ji devê Zaro Axa hin demec! hatine sîparîş kirin. Di demeceke xwe ya ku rojnameya *Cumhuriyetê* de weşîyaye, vê serhildanê rexne dike: "Mirovê herî kal yê Kurdên Îstebolê Zaro Axa ev serhildana mehkûm kirîye. Zaro Axa, ez ne wî Şêx Seîdê melunî, ne jî mirovên wî nas dikim, xwedê bela wan bidê! got...Zaro Axa, Xwedê ne dewleta me re, ne millet û Gazî Paşayê me re tu zewalê nede, daxwaz kir" ⁽⁴⁴⁾.

Çavkanîyên kevn yê Kurdan ji ber çî sedemî ye, qet qala Zaro Axa nakin. Bi taybetî di weşanên Kurdî yê periyodîk de rastî nûçeya mirina wî hatin jî ne mimkun e.


SERPÊHATÎYÊN HEMALAN

Tengasî û xemên ku hemalên Kurd li Îstebolê kişandîne, di nav motîfên edebîyata Tirkî de jî cih girtine. Bi taybetî di hin kurteçîrokên Tirkî de em rastî hemalên Kurd yê cihêreng ku çûne Îstebolê, tên. Dema mirov van kurteçîrokan dixwîne, derheqa mercên xebatê û jîyînê yê giran ku hemal di nav de nin, mirov dibe hin agahdarîyan.

Nivîskar Said Faik di kurteçîrokên xwe de pêwendîyên navbera kêmanîyên etnîkî li Îstebolê û bi taybetî jî cimaeta Rûm li Îstebolê kirîye temake giring. Hemalê Kurd Remo, di kurteçîroka wî ya bi navê *Kerê Ji Gund Re Hatîye Şandin*, enînivîsa hemû hemalên Kurd parve dike: "Ew ji gundekî dora sînorê Îranê bû. Hemû derdê xwe bi fehengeke ji sed peyûî pêkhatî îfade dikir, ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje kesekî bêderd bû. Li porê wî de tèleke spî tune bû, çil heft salî bû. Yekî zirav, simbelên wî yê reş û direj hebûn. Wek zinaran bi

hêz bû. Dema barê herî giran yê îskelê didane li ser pişta wî, serbilind nebe dikire pite-pit, qet nebe rûyê xwe diqurcimand an jî di çavên wî de alewa hêrsa ku di çavê zarokan de kûr bûyî, dibiriqî. Tiştên wusa nedibûn! Wek mirovên ku divê hêza xwe biparêzin, bi hîseke hundirîn ve dikenî. Mirova nikaribî bigota ku ne dilşa, ne jî xemgîn bû. Ji rûyê wî tu tişt nedihate fam kirin, te digot esrarengîz e” (45).

Ew hemalê bi navê Remo ku ji dorberê bajarê Wanê tê, ji der Kurdî tu zimanekî mayîn nizane, ev yeka jê re li Îstenbolê problemên nû peyda dike. Angorî nivîskar ferhenga Remo ji çend peyvan pêk hatibû: *wek mîsal Ehmed, Mehmed, bar, pişt, beg, name, welat, vir, rast, mîltan, hesin...* Ramo dixwaze



Zaro Axa (*Kurdish Times*, no. 2, 1986).

kerekê bikire û bişîne welêt, lê belê perê wî têrê nakin. Mace-
ra wî ya Îstenbolê di kurteçîrokê de bi xweşî hatîye zimîn. Dîtî-
nên Said Faik yên derheqa vî hemalê Kurd de gelekî bawerîyê didin mirovan: ” *Ramo dema bar dida pişta xwe waha dikşand. Mirovekî ku biryara hînbûna qederekê daye, ev tevgera te*

digot xweweşandina wî ye. Te digot ew sandoqa li ser pişta wî ku sed û bîst kilo dihat, êdî tune bû. Dema di rîya îskeleyê de dimeşîya, ew vizikên ku li rûyê wî datanîn, ji Tirkîya xwe der bi zimanekî mayîn ve çêrî wan dikir. Te digot bayê boçikê serê wan dixist, vizik wusan difirîn, diçûn. Hêdî hêdî

dimeşîya û tu wext nedifikirî” ⁽⁴⁶⁾.

Hemalekî mayîn ku ji Wanê tê, em di kurteçîroka Yaşar Kemal ya bi navê *Ava ku Giran Dikişê* dibînin: ” *Payîza dereng bû. Hemal Reşîd hat. Yekî mezin bû. Kerê xwe daye pêşîya xwe, ji Wanê heta Îstenbolê ajotîye. Ev sî sal e li Îstenbolê, li Kinaliyê hemû barên kesên ku dahatin havîngehê, Reşîd dikşand. Du-sê sala carê hesreta welêt li sêrî dixist, kerê xwe dida pêşîya xwe, bi peyatî heta Wanê diçû-dihat*” ⁽⁴⁷⁾.

Orhan Kemal di kurteçîroka xwe ya bi navê *Para Biratîyê* de besa bûyerên ku ji serê hemalekî Sîwerekî re derbas bûne, dike. Hemalê Sîwerekî serokê hemalan yê ku ew xapandine, wî efû nake. Ev hemalê Kurd serî li hemberî neheqîyan xar nake, bi mirin be jî dixwaze li ber xwe bide:

”*Ji vir şunda navîka xwe em bi destê xwe ve bibirin, hevalno. Ji vî qûnekî re ihtîyaç tune. Hatina xwe jî emê para biratîyê bikin. Dibe? Tiştê ku nabe, heye. Destê wî li paş, ceketê wî namilê, şewqê wî heta stûkirê ketîye û sîpera şewqe paşva zivirî, li pêşîya hevalên xwe, li kuça ku elektrîgê ronahî kirîye, li wir hêdî hêdî meşîya*” ⁽⁴⁸⁾.

Di serpêhatîya Bekir Yıldız ya bi navê *Hemalê Elazîzê* de hemalekî ji Elazîzê bi navê Hesen, çawa ji aliyê hemalên Nixdeyê de tê kuştin, ev bûyera tê vegotinê. Xalo Hesenê ku ji xwe re piştekan stendîye, dema ku hêvîyên wî tam zêde dibe, ji aliyê hemalên ku hakimî sûkê ne, bi kêrê di şer de tê kuştin ⁽⁴⁹⁾

NAVENDÊN HEMALAN YÊN Û INFORMASYONÊ: QAWEXANE

Çawa di kurteçîroka Orhan Kemal ya bi navê *Para Biratîyê* û ya Bekir Yıldız ya bi navê *Hemalê Elazîzê* de tê xuyan, dubendîyên *serokhemal-hemal*, *hemal-hemalên mayîn*, *hemal-xweyê mal* gelek caran bi xwînê ve diqedin. Di vî warî de sedemên etnîkî roleke mezin dilîzin. Wek Bekir Yıldız jî nîşan dide, hemalên ku nû hatine, ji aliyê hemalên ku berê hatine û di nav xwe de bûne yek û komên etnîkî û lokal pêkanîne, wek tîpên nehezkirî hatine dîtîne. Xirabkirina vî qaydî hertim hêsa nîn bûye. Di vî warî de gava pêşîn ku divê bê avîtin, pêwîst e mirov tevî wê rêxistina hemwelatîyan bibe ya ku dişibîne toreke alîkarîyê. Ji ber vê yekê ji bo hemalên Kurd yên ku rîya Îstenbolê girtine, referansên hemalan yên here saxlem û xurt li bajarê mezin, hemwelatîyên wan yên ku ji eynî deverê tîne, ew bûne. Ji deverên wan neyên jî, ji xwe re divê ”*hemşerîyên derbasok*” û ”*hemşerîyên derewîn*” bibînin. Ev organîzebûna civakî, bi taybetî ji bo hemalên ku nû hatine Îstenbolê û hemalên ku Kurdî nizanibûne, hertim giring bûye. Eger wusan nebûya, ji koma hevalan dûr diman, li meydanê belangaz dibûn. Ev yek jî, ji bo kesên ku cara pêşîn hatine Îstenbolê, mirin bû. Dîsa di dawîyê de hemwelatîyên hin kesan diçûn hewarîya wan. Beşeke kesên bêşans hebûn bi destvala vedigerîyan welatê xwe, hinek jî tevî sinifa ”*îpsizan*” (berêdayî, serserî) dibûn ku koka

peyvê ji hemalîyê dihat ⁽⁵⁰⁾.

Cîhên here maqûl ji bo ku hemalên Kurd hemwelatîyên xwe, nas û referansên xwe bibînin, bêgûman qawexane, çayxane, restoran û bîrxanên Kurdan bûn. Ev cîhên wusan wek navendên înforsasyonê wusan xweyê rolên mezin bûn. Ji alîyê din dema alavên agirê nasyonālîzmê xwe davîte van cîhên umumî, ji yekten gur dibû. Qawexana ku Dîyarbekirî diçûnê, qawa Abdullah Çavuşê ji Erganiyî bûye ⁽⁵¹⁾, qawa ku Dersimî zêde diçûnê, qawa Elî Paşayê Erzînganî bûye ⁽⁵²⁾. Raporeke ku ji alîyê ulmdarên Amerîkî de di sala 1922'an hatîye amade kirin, nişan dide ku di van salan de li Îstebolê restoran û bîrxaneke Kurdan jî hebûye ⁽⁵³⁾.

DAWÎ

Kurdên an jî Kurdên ku cara pêşîn hatine Îstebolê kî ne? Em tam pê nizanin. Lê belê ji sedsalên kevn vir de Kurd li Îstebolê hene. Çawa di pirtûkeke ku li ser Îstebolê hatîye amade kirin jî nişan dide, Îstebol wek *"miknatîseke civakî"* bûye, mirov berbi xwe kişandine. Tiştêkî balkêş e ku di eynî çavkanîya ku di sala 1922'an çapbûyî de tê gotin ku babeta Kurdên ku li Îstebolê dimînin hêjayî lêkolîneke cuda ye: *"...Îranî, Kurd, Arnavut, Arap û kêmanîyên mîna wan li bajêr jî dikarin bibin babeta lêkolînê. Îstebol ji berê de bûye miknatîseke civakî ku her cure mirov berbi xwe kişandine. Hinek ji bo kêfa xwe, hinek ji bo qezencê, hinek ji bo sefayê û hinek jî wek miltecî hatine"* ⁽⁵⁴⁾.

Ev lêkolîna me ya ku sedsalîya (1826-1925) serpêhatîya hemalên Kurd li Îstebolê pêşkêş dike, çawa nişan dide ku hemalên Kurd mecbûr mane, di nav mercên gelek giran de kar kirine. Ew jî têrê nekirîye, vê carê ketine nav şerdewên sîyasî, etnikî û şexsî, wek hêzeke bandûrhişt hatine bi kar anîn. Nasyonālîst û welatparêzên Kurd ku di destpêka sedsala me de li Îstebolê organîze bûne, bi derengî be jî belengazîya dîrokî ya hemalên Kurd bi kêmanî fam kirine. Nasyonālîstên Kurd firsend nedîtine ku xwe bigihînin hemû hemalên Kurd, bi serhildana Şêx Seîd (1925) ew bi xwe mecbûr mane ji Îstebolê dûr bikevin û hemalên Kurd jî wek hertim bi vî tehrî bi qedera xwe ya reş ve tenê mane. Seyîd Abdulkadîrê ku bi salan ji hemalên Kurd re bûye alîkar, rê nişanî wan daye, bi gotineke din *"serokê wan yê fexrî"* bûye, di sala 1925'an de li Îstebolê tê girtin û li Dîyarbekirê tê îdam kirin. Em dikarin bêjin ku ev bûyera dawîn belkî jî derbeke here giran bû ku li hemalên Kurd ketîye.

Çavkanî û not

1) Nûrî Dersimî di biranînên xwe de bêtî ku têkeve hûrîyan qala *Partîya Emelan ya Kurd* dike û dibêje ku vê partiyê *Komela Xwendekarên Kurd* (Hêwî) re alîkarîya maddî kirîye

- (binêre: Nuri Dersımı, *Hatıratım*, rûp.42). Ji aliyê din dı hın çavkanıyan de qala Reîsê Emelên Kurd, Reşîd Axa tê kirin (binêre: Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler II*, rûp..186). Piştî van zaniyarîyan mirov dikare bêje ku kütleyeke karkerên Kurd ya mezin ku pıranîya wan ji hemalan pêk hatîye, li Îstenbolê hebûye.
- 2) Nejdet Sakaoglu, *Tanzimat’tan Cumhuriyet’e Tarih Sözlüğü*, İstanbul, 1985, rûp.13
 - 3) İstanbul’da Kürd İşçileri, *Jîn*, hejmar :25. Yê ku jı Tîpen Erebi wergerandiye tîpên Latîni: : M. Emin Bozarlan, Uppsala, 1988
 - 4) Metın Toket, Şeyh Said ve İsyani, Ankara, 1966, rûp. 59
 - 5) Nazmı Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu’da Türk Beylikleri, Ankara, 1982, rûp.119.
 - 6) Bediuzzaman Said Nursi, *Divan-ı Harb-i Örfi - İki Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi*, İstanbul, 1992, rûp.10
 - 7) Hagop Mintzuri, *İstanbul Anıları 1897-1940*, İstanbul, 1993, rûp.35.
 - 8) Birger Mörner, *Under Halfmånen*, Stockholm, 1906, rûp.79-80.
 - 9) Halide Edip-Adivar, *Mor Salkımlı Ev*, İstanbul, 1992, rûp.45
 - 10) Donald Quataert, *Osmanlı İmparatorluğunda İlgücü Politikası ve Siyaset: Hamallar ve Bâbiâli 1826-1896*, *Tarih ve Toplum*, sayı: 33 / 1986
 - 11) *Tarih ve Toplum*, hejmar: 33 / 1986
 - 12) *Tarih ve Toplum*, hejmar: 33 / 1986
 - 13) Edwin Pears, *Forty Years in Constantinople*, London, 1916, rûp.162
 - 14) Edwin Pears, *Life of Abdul Hamid*, London, 1917, rûp.257
 - 15) Revolten i Konstantinopel, *Svenska Dagbladet* 19.8. 1896
 - 16) Donald Quataert, *Osmanlı İmparatorluğunda İlgücü Politikası ve Siyaset: Hamallar ve Babiali, Tarih ve Toplum*, sayı:33 / 1986
 - 17) Maria Yordanidu, *Loksandra - İstanbul Düşü*, İstanbul, 1990, rûp.115.
 - 18) Michel de Grece, *II. Abdülhamid - Yıldız Sürgünü*, İstanbul, 1995, rûp.221.
 - 19) Nazmı Sevgen, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu’da Kürt Beylikleri*, Ankara, 1982, rûp.125
 - 20) Berhema jorê, rûp.120
 - 21) Ein Besuch beim Boykotsundikat, *Neue Freie Presse*, 24 Januar 1909
 - 22) Donald Quataert, *Social Disintegration and Popouler Resistance in the Ottoman Empire 1881-1908*, New York University Press, rûp.130
 - 23) Bediuzzaman Said Nursi, *Divan-i Harb-i Örfi...*, rûp.18
 - 24) Berhema jorê, rûp.10
 - 25) Bediuzzaman Said Nursi, *Nutuklar ve Makaleler*, rûp.20 (binêre: *İstanbul’da Kürtlere Edilen Telkin*).
 - 26) Görev Sınırları - Haddi Aşma, *Jîn*, hejmar: 24, 1919
 - 27) İstanbul’da Kürd İşçileri, *Jîn*, hejmar: 25, 1919
 - 28) Malmısanı, *Cızira Botanlı Bedirhaniler ve Bedirhani Ailesi Derneği’nin Aile Tutanakları*, rûp.27
 - 29) Kürd Tamim-i Maarif Cemiyeti Bildirisi, *Jîn*, hejmar:10
 - 30) Nuri Dersımı, *Hatıratım*, Ankara, 1992, rûp.42
 - 31) İsmail Göldaş, *Kürdistan Teali Cemiyeti*, İstanbul, 1991, rûp.18
 - 32) Kadri Cemil Paşa, *Doza Kürdistan (Kürdistan Davası)*, Ankara, 1991, rûp.97
 - 33) Kadri Cemil Paşa, *Doza Kürdistan*, rûp.42
 - 34) Uğur Mumcu, *Kürt-İslam Ayaklanması*, Ankara, 1991, rûp.18
 - 35) Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler II*, rûp.186
 - 36) Metin Toket, Şeyh Said ve İsyani, rûp.59.
 - 37) Vera Beaudin Saedpour, *The Resurrection of Zero Agha, Kurdish Times*, vol.1, no:2, 1986, rûp.60-62. (Nivîskar di vê nivîsa xwe de çend wêneyên Zaro Axa yê balkêş ku di arşiveke kevn ditine jî, di eynî kovarê de weşandine. Di wênekê de Zaro Axa gîtarek di dêst de di konserekê de tê xuyan, di wêneke mayîn de Zaro Axa bi keçekê ve tevayî li New Yorkê tê xuyan, di bergê kovarê de jî Zaro Axa bi kincên xwe yê Kurdî ve poz daye, ihtîmaleke mezin ev wêneya di salên berê de hatîye kişandin).
 - 38) Anthony Bryer, *Zaro Ağa (1774-1934): The Stories of a Legend - Last of the Lions*,

Cornucopia: 7/11 1994-1995 (Di cihekî vê kovarê de wêneyek jî heye ku Zaro Axa, bi ekîbeke arkeolojîk ya Îngîlîzan ku ew zîyaret kirine, tê xuyan, wêne dî sala 1928'an de hatîye kişandin)

- 39) Rohat Alakom, *Ev Dinya ji Zaro Axa re ji Nemaye, Armanç*, hejmar:133, 1992
- 40) Mesud Fani, *Kürtler ve Sosyal Gelişimleri*, Ankara, 1993, rûp.11 (Mesud Fani, dide kîvşê ku Zaro Axa ji aliyê rêxistineke anti- alkolist de hatîye gazî kirin û ezimandin).
- 41) M. Salahattin, *Zaro'ya Da Kalmayan Dünya* (Ev nivîsa ku dî sala 1934'an de bi munasebeta mirîna Zaro Axa dî rojnameye *Millîyet* de hatîye nivîsîn, kopîyake nivîsê jî, dî kovara *Nokta* de hatîye weşandin, binêre: hejmar: 15 Aralık 1991).
- 42) *156-Year Old Turk Comes to Visit Us*, *New York Times* 19.7. 1930 (Zaro Axa bi koka xwe Kurd bûye, lê belê rojnameyên van salan bi piranî ew wek "Türk" dane nasandin. Zaro Axa, di vê gera xwe ya Emerîkî de bi alîkarîya wergervanên xwe Asım Rıdvan û Ahmed Musa ku bi wî re hatine, bersîva pirsên rojnemevanan û dorberên cihêreng daye).
- 43) *The Oldest Man - A Visit to Amerika*, *The Times* 3 July 1930
- 44) Faik Bulut, *Türk Basınında Kürtler*, İstanbul, 1992, rûp.80 (Ev demeca Zaro Axa dî rojnameya *Cumhuriyet* ya bi 28.2.1925 terîxî de hatîye weşandin).
- 45) Saîd Faik, *Bütün Eserler:2, Şahmerdan, Lüzumsuz Adam*, İstanbul, 1982, rûp.80-86
- 46) Berhema jorê, rûp.81
- 47) Yaşar Kemal, *Sarı Sıcak - Bütün Hikayeler*, İstanbul, 1983, rûp.223
- 48) Orhan Kemal, *Onuncu Kadın*, İstanbul, 1982, rûp.188-195
- 49) Bekir Yıldız, *Güneydoğu Öyküleri*, İstanbul, 1979, rûp.85 -95
- 50) İpsiz: " *Ew bendê kişandinê ku li serê wî moreke bi çetel hebûye, ji lonceya hemalan dihate stendin, kesê ku ew bendê wî tune bûya û bi kaçaxî kar dîkır, van kesên bêkar re "İpsiz" dihate gotin. Hebûna vî bendî sedemê bawerîya li hemberî hemalan dihate hesabandin*" (Necdet Sakaoglu, *Tanzimat'tan Cumhuriyet'e Tarih Sözlüğü*, 1985, rûp.65).
- 51) Kadri Cemil Paşa , *Doza Kurdistan*, rûp.28
- 52) Nuri Dersimi, *Hatıratım*, rûp.31
- 53) *İstanbul-1920*, Editor: Clarence Richard Johnson, wergervan: Sönmez Taner, İstanbul, 1995, rûp.227
- 54) *İstanbul- 1920*, rûp.76

Di bîranînên Refîq Hilmî de provakasyoneke Îttîhad û Terakkî (*)

Jiyana Şêx Mehmûd

Şêx Mehmud, kurê Şêx Seîdê Hefîd ê (Xwedê jê razî be) kurê Kak Ehmedî Şêx e. Dîroka vê xanedana han nêzîkî 150 sal beriya niha dest pê dîke ku bi taybetî teqabulê dewra hukumeta "Bebe" dîke. Kak Ehmedî Şêx kurê Şêx Marufê Nûdî ye. Ev zatê han murşid û mezîne Terîqeta Qadirî bû. Bi Xwedanasî, Xwedaperestî û başiyê hatibû nas kirin. Ji ber vê, xelkê Kurdistanê bi çavekî hurmet û prestîj lê dinêriya û gelekî jî jê hez dikirin. Bi dereceyek wisan ku gelek ji wan, bi taybetî xelkê gundan û eşîretan, bi "keşf û keramet"ên wî ve hatibûn girêdan û bi serê wî sond dixwarin. Merqeda Şêx Ehmed a li bajarê Silêmaniyê bibû ziyaretgaha piraniya xelkê. Ji ber vê, nesla Kak Ehmed (Hilmî) ji meqamê dînî yê bab û bapîrên xwe parek mezîn wergirtibû û di rêza neslek pîroz de dihat hesibandin. Ji bo vê, di Kurdistanê de xwediyê nav û şohretek mezîn bû... Ev xoşewîstî û prestîja han ji Kak Ehmedî Şêx re ji kur û neviyên wî re, bi taybetî ji Şêx Mistefayê Neqîb û Şêx Seîdê babê Şêx Mehmud re mabû. Jîrî û hêjatiya Şêx Mehmud her di piçûktiya wî de hatibû dîtin û nav û dengê wî di nav gund û eşîretên Kurdistanê de belav bibû. Ji bo ku ji bîngeh de bi rehim û şewqet û azayetî navê wî belav bibû û şohreta bab û bapîrên wî û nifûza xanedana wî ya dînî gelek kêrê wî hatibû û gihîştibû dereceya herî bilind. Ji ber van sebeban êdî ew jî gav bi gav pêş ket û heta di cîhana siyasetê de jî kêr û zêde wekê navekî naskirî ket ser ziman. Hê lawekê nû yê têgihîştî bû ku carekî li dijî eşîreta Cafan a mezîn û carek din jî li dijî eşîreta dirr û aza Hemewend sekinî bû.

Bi kurtî çî di hêla azayetî û leşkerî de û çî di hêla ji ber sebêbê nifûza dînî ya bab û bapîrên xwe de, nifûza Şêx Mehmud a dînî û dinyayî çiqas diçû ber bi geşbûnê ve diçû û stêrka bextê wî jî roj bi roj bilind dibû.

Ji bilî vê, Sultan Ebdulhemîdê Duyem ê Osmanî li gorê û siyaseta ku dabû

ber xwe û li ser dimeşiya, Şêx Seîdê Hefîd ê Kak Ehmed dawetê Stenbolê kir; Şêx Seîd ji derveyê hinek xizm û kesên derûdorên xwe, Şêx Mehmedê kurê xwe jî bi xwe re biribû. Bi vî awayî Şêx Mehmed di temenê xwe yê zaroktiyê de, ji bo demeke kurt be jî bibû mêvanê padîşahê Osmanî û koşk û seraya saltanatê.

Wî çavê xwe di jiyaneke bilind a arîstokratî û gelek debdebe de vekiribû.

Sultan Ebdulhemîd her wekê ku ji dûr ve nav û deng û şohreta Kak Ehmed baş sehkiribû, wisan dixuya ku bi çûna Şêx Seîdê Hefîd ya Stenbolê, xwe nêzîkkirina vê xanedana han hê zêdetir kiribû serê xwe. Ji ber vê, berê ku ew vegehin Silêmaniyê her yek ji wan kesên derûdorên Şêx Seîd bi berat û beşîş perrû kiribû. Ji derveyê vê jî şifra muxaberata dizî dabû Şêx Seîd ku di westê tengî û pêwistiya de bikaribe bi telgraf pê re muxaberatê bike. Ev mezintirîn perrû bû ku sultanekî Osmanî yê wekê Ebdulhemîd dabû re'yetekî xwe. Herwekê ji aliyê padîşahê de dayîna vê, belgeyek mezin jî bû ji cî û meqamê bilind ê Hefîdê Kak Ehmed re. Ji ber vê, ew muteserrif û serekleşkerên ku li Silêmaniyê bûn an dişandin li wir, bêguman xwe ji xezib û xeyda Şêx Seîd diparastin û diketin bin nifûza wî. Hinek ji wan diketin nav rewşek wisan ku bê pirs û raya Hefîd lingên xwe nediyetin avahiyên xwe.

Vêca tu şik di vê de tune ku memurên biçûk bibûn leyîstika şêxan û beşek bêqîmet ên ji xelkê ji bo qazanc û merama karên xwe bi bê berat û bê beşîş diketin nav rêzên nukeran. Lê tucar û axa dijminê vê xanedana han bûn û di bin re şûrê xwe ji wan re tûj dikirin.

Çira kê heta hetayê veketî maye? Her wekê ku çawan ew cî û meqamê bilind heta hetayê ji Ebdulhemîd re nema, bi wî re çirîskên bextê vê xanedana han jî ber bi jaryê ve çûn. Dema ku li Tirkiyê Şoreşa 1908an qewimî, leşkerên Mehmed Şewket Paşa ji Selanîkê meşyan ser Sultan Ebdulhemîd û Stenbolê girtin. Ebdulhemîd li ser textê padîşahiya rakirin û şandin Selanîkê. Vêca Komeleya Yekîti û Pêşkevîtin (Ittîhad û Terakkî Cemiyetî) hat ser kar û hukum kir destê xwe. Piştê vê ji bo zeximkirina ciyê pê xwe li seranserê welatê Osmanî, bi taybetî ew kesên ji xelkê yê dijminê destûpêwendên Ebdulhemîd bûn, berhev kirin û bi wan şubeyên (liqên) Ittîhad û Terakkîyê dan avakirin. Tu şik tê de nîne ku avakirina van şubeyên Ittîhad û Terakkîyê di welatên dûr de, bêhêzkirin û nehîştina wan kesan bû ku mihêldarê Ebdulhemîd bûn.

Şubeya Ittîhad û Terakkîyê ya Silêmaniyê jî ku bi taybetî ji nexwazên xanedana Şêx Seîd, yanê bi destê hinek tucar û zabitên ku nû ji dibistana herbiyê derketibûn hatibû avakirin, meyla azadî û dijîtiya kesên xwedî nifuz dikirin. Ji ber vê, bi cebeheya şêxan re ketin dijminatîyê û dest avêtin dijî wan hukumatê han dan. Vêca gelek bi ser de derbaz nebû, bi riya şube û karbidestên wê re ku endamê komelê bûn, bahaneyan derxistin û Şêx Seîdê Hefîd û hinek kes û destûpêwendên wî bi Şêx Mehmedê qehremanê vê behsa han, di bin çavdêriya hêzeke mezin a hukumatê de anîn Musilê.

Li Musilê heta demek rehet wextê xwe derbas kirin. Hemû wextê li hêviyê bûn ku dewr biguhere û vegerin Silêmaniyê. Wan nedizanî ku ji bo rojên bîn bext û talihekî tarîtir ji wan re hatiye amade kirin û gelek bûyerên din li pêşiya rojên wan ên mayî de hene.

Karbidestên Ittihad û Terakkiyê yên Musilê, li firsetekê digeriyan ku ji kuştina Şêx Seîd re bikin bahane. Ji ber vê, di destpêkê de hewil didan û dixebitîn ku berê xelkê Musilê ji wan veqetînin; weke dihat gotin, gelek tiştên nerewa û derew bi wan ve girê didan û di nav xelkê de belav dikirin. Şûmî û siya rojên bedbextiyê li wan nêzîktir kirin. Gelek bi ser de derbaz nebû, li bajarê Musilê di derheqê van xerîb û lêqewimiyan de agirê fitneyek mezin hilkirin...

Fîtneya Musilê: Kuştina Şêx Saîdê Hefîd û Şêx Ehmedê kurê wî

Di sala 1326ê hicrî de (destpêka sala 1908e mîladî) roja duyem ê Cejna Qurbanê⁽¹⁾, Şêx Mehmud, Şêx Ehmedê birayê wî û Baha Efendî⁽²⁾ yê hevalê wan, li mala Mustefa Beg ê qaymeqamê eskerî mêvan bûn. Mala Mustefa Begî li ser Meydana Babu'l-Tuwab bû ku wê çaxê ciyê seyran û civînan bû.

Dema ku ew ji mala Mustefa Beg derdiketin di meydanê re derbaz dibûn; li gor gotinan, Baha Efendî serxweş dibe û ji jineke nav seyrkeran re tabance dikişîne. Lê jînik dest bi qêjî û hawarê dike. Li ser vê hinek ji seyrkerên ji xelkê Musilê digihîjin hawara jînikê. Bi Baha re dest bi şer dikin û dixwazin wî bikujin. Vêca Şêx Ehmed û havriyên wî jî dikevin nav şer û şer diçe digihîje kêşana xencer û dabancan. Di vê navê re çend kes birîndar dibin. Li ser vê xelkê Musilê hêdî hêdî kom dibin û dest ji kar û barên xwe berdidin. Heşameteke gelek zêde li derûdorê Şêx Ehmed û havriyên wî berhev dibin û wan têxin tengiyê. Wê navê re ku hinek jendirmên kurd li wir hazirbûne, alîkariya wan dikin. Dewriyên siwarî (siwarê devan) yên ku gelek ji wan kurd bûne, bi ser vê bûyerê de tên. Şer giran dibe û ji herdu milan jî hinek kes tên kuştin û birîndar kirin. Li ser vê, hejmara xelkê berhevbûyî hê zêdetir dibe û beşê piraniya xelkê dest diavêjin çekan û derûdorê jendirman digrin. Dema ku şev bi ser de tê, jendirme xwe digihînin qonaxa hukumetê. Roja din sibê xelkê cardin nasekinin, bi çek dimeşin ser qonaxa hukumetê û ji bo toleya xwe vekin daxwaza jendirman ji walî dikin. Walî jendirman nade destê wan. Vêca daxwaza Şêx Ehmed û havriyên wî jê dikin. Wê wextê walî⁽³⁾ di ciyê ku tedbîrekê ji tefandina vî agirê re bibîne, ji xelkê re dibêje: "ew li vir nîn in, herin û bi xwe wan bibînin". Vêca ev heşameta han davêje ser mala Şêx Seîd⁽⁴⁾ û derûdorê wê digrin. Walî vê navê re careke din bi benzîn diçe ser êgir. Di ciyê tedbîrek bistîne û vê heşameta han belav bike û agirê fitne û fesadiyê bitefîne, sê kesên bi nav û deng ên ji xelkê Musilê dibijêre⁽⁵⁾ û wan dişîne pê Şêx Seîd û bi navê parastina wî li "ciyek" bangî li ba xwe dike. Şêx Seîd jî baweriya xwe pê tîne û bi wan re berê xwe dide qonaxa hukumetê.

Vî navî re bi navê parêzgeriyê gurubek esker jî didin balê. Lê li gel vê jî, dema ku digihîn ber deriyê qonaxa hukumetê bi emrê Tabur Axasî⁽⁶⁾ deriyê qonaxa hukumetê tê girtin û Şêx Seîd ji der ve dimîne. Tam vî navî re mirovek ji nav vê heşameta han kevireke mezin li serê Şêx Seîd dixê û dike.

Piştê vê bûyerê çend kesên din jî êrîşê dibin ser wî kesî ku tenê bi serê xwe bi Şêx re bûye û bi xenceran wî jî dikujin. Bi vê jî ev agir nayê tefandin. Ev heşameta han vêca berê xwe dide mala Şêx Seîd. Ew kesên di hindurê xanî de wekê şêran li hemberê vê êrîşahan a dirinde û weşane disekin. Lê di netîceyê de Şêx Ehmed jî dikujin. Pişt re berê xwe didin ew xaniyê ku mirovên Şêx Seîd li wir in. Deriyê xanî dişkînin û dikevin hindur û çî kêsên li wir dibînin, dikujin. Baha Efendî, ji ber agirê vê fitne û fesadiyê hê roja ewil xwe diveşêre û rizgar dibe.

Lê, li vir noqta herî girîng a hewceyê îzahetê ye behsa tunebûna Şêx Mehmud e. Di nav van hemû bûyeran de çawan navê wî tune? Min bi xwe jê sehkirîye ku ew di nav van bûyeran de nebûye. Lê çawan û ji ber çî? Mamoste Xulamî li El-Duhaya de dibêje ku Şêx Mehmud jî li mala Mustefa Beg bû. Lê piştî vê ne di bûyera Babu'l-Tuwap û ya li ber deriyê qonaxa hukumetê ku babê wî tê de hat kuştin û ne jî wextê êrîşanîna heşameta xelkê ser mala Şêx Seîd û kuştina Şêx Ehmedê birayê wî navê Şêx Mehmud derbaz dibe. Ev yek jî me digihîne vê qenetê ku wekê min bi xwe jê sehkirîye, ew di vê bûyera han de tunebûye. Xwediyê Muqedderatu'l-Iraqu'l-Siyasiyye ku wisan dixuyê gelek kîna wî ji şêxan re hebûye û bi taybetî di derheqê Şêx Mehmud de nekariyê xwe ji zimandirêjiyê biparêze. Ev herzekariya ku ji Baha li hemberê jinekê qewimiye, îzafeyê Şêx Mehmud dike.

Lê diyar e ku karekî bi vî awayî zarokî ji însanekî bêemsal û hêja yê yekê wekê Şêx Mehmud gelek dûr e û Şêx Mehmud kesekî wisan bû ku hê di zaroktiya xwe de çavê xwe kiribû mezintî û serektiyê. Em vê jî deynin milekî; em çawan dikarin bawer bikin ku ew bi xwe bibe sebebê fitneyek wiha û pişt re bab û birayê xwe di nav wî agirî de bihêle û xwe biveşêre? Belê wekê Mamoste Xulamî dibêje: mimkun e ku Şêx Mehmud berê vê bûyera han ji mal derketibe û çûbe mala Xidir Hemewendî⁽⁷⁾ û di wextê bûyerê de nekaribe yan wî nehîştibe vegere li ba birayê xwe. Lê tu carê û tu wextê nayê bîra kesekî ku qehremanekî wekê Şêx Mehmud, di esnayê vê bûyerê de ji bo xelasiya serê xwe çûbe mala Mehmud Xidir û xwe veşartibe⁽⁸⁾. Çunkê Şêx Mehmud, di hemû qonaxek jiyana xwe de bi azayetî navê wî derbaz bûye û di meydana hemû bûyer û serpehatiyan de bi camêrî, netirsî û nebezî hatiye naskirin.

Lê rastî çî dibe bila bibe, bi vî awayê hovîfî, piştê qewimandina vê bûyera han a xwînavî, di dîroka bajarê bi nav û dengê Musilê de rûpeleke reş a herî girîng hat nivîsandin ku tu carê neyê jibîr kirin...

Vegera Şêx Mahmûd ya Silêmaniyê

Dengê kuştina Şêx Seîdê Hefîd û Şêx Ehmedê kurê wî ya li Musilê, li hemû milekî Iraqê û hetta li seranserê axa Osmanî de, tesîreke gelek giran û mezin li ser xelkê kir; bi taybetî li ser xelkê Silêmaniyê, Kerkuk û bajarê din ên Kurdistanê.

Ji ber vê, tirs ket dilê hukumeta Musilê û Şêx Mehmud û darûdestên wî ragirtin û nehîştin ji Musilê derkevin. Dema ku eşîret bi vê bûyerê hesiyan, xwestin pêşî hukûmet hêmin bibê û pişt re bi rîya mezinên Kerkukê re daxwaza Şêx Mehmud û birayên wî bikin. Wan vê daxwazê gîhandin hukûmetê û gotin ku eger ew neyên berdan û ew venegerin Silêmaniyê, dê eşîret bimeşin ser Musilê û tola Şêx Seîd û Şêx Ehmed ji xelkê wî bistînin. Li ser vê, wilayetê biryara berdana Şêx Mehmud û birayên wî û şandina wan da. Wan rojan kelîneke mezin ket nav ehlê bajarê Hewlêrê û Kerkukê. Eşîretên derûdorê Kerkuk û Silêmaniyê ketibûn nav nerehetiyek bêbinî de. Jin, mêr, mezin û biçûk vê bûyera han diaxiftin. Tu behs û meselek din nemabû.

Li her ciyê dengbêjan bi kurdî, tirkî û farisî kilamên şîn û girînê yên gelek bi kul û derd distran û xwenda û zarokan jî ev ji ber kiribûn û bi dilûcan ji hev re dixwendin. Eşayîr û ahalî mijûlê xweamadekirinê bûn ku li pê Şêx Mehmud de biçin. Bi rastî bûyera Kerbelayê nû bibû. Xelkê Musilê bibûn zindîq. Dema ku xeberê nêzîkbûna şêxan li Kerkukê belav bû, wê şevê heta beyanê xew neket çavê gelek kesan. Eşîretên derûdora Kerkukê jî hişk bibûn û mabûn. Jin, mêr, kur, keç, mezin û biçûk, efendî, mela, şêxên terîqetê, derwêş, kesên nav bazaran, memurên hukûmetê revde û revde di hatin û çûnê de bûn. Bi hezaran fîlama û def amade kiribûn. Ez bi xwe di wan rojan de li Kerkukê xwendevanekî Hucra Mele Teqî bûm. Min pê danîbû salên xwe ya dehan. Mamostê me şaîr bû. Marşeke gelek dirêj bi me dabû jiber kirin. Berê gihîştina şêxan min ji ew kesên berevbûyî yên hejmara wan bi hezaran re xwend. Ew roja Şêx Mehmud gihîşt Kerkukê temamê xelkê û piraniya eşîretan ji serê beyana sibê bi piyan û siwarî ketin rê û qasê çend seetan ber bi pêşewaziya wî ve çûn. Dengê Allahuekber û gurmîna çepik û defan têkelê nav girîn û şînê bûbû.

Bi rastî dêmena wê deştê ya wê rojê wêneyek ji mehşerê bû. Tekya Şêx Eliyê Talebanî û ya Seyîd Ehmed van mêvanan di navbera xwe de parve kirin. Şêx Mehmud çû tekyayê û Şêx Qadirê birayê wî li xaneqayê ma. Dema ku Şêx Mehmud gihîşte Kerkukê hejmara eşîretan du carî zêdetir bû û fikra berpakirina şoreşekê kirin serê xwe. Di vê halê de Reşîd Paşa kirin waliyê Musilê. Tenê rojek li wir ma û pişt re xwe gîhande Kerkukê. Dilê Şêx Mehmud vekirî û bi hêzeke mezin ve bi xwe re bir Silêmaniyê.

Hatina Reşîd Paşa rojek wiha de, feydek mezin bû. Lê li gel vê jî dema ew vegeriya Musilê dest avêt girtina wan kesan ku tiliya wan di kuştina Şêx Seîd de hebû û gelek ji wan bi kuştin an xeniqandinê tawanbar kir⁽⁹⁾. Piştê wî cardin

nav û navan re gelek bûyerên biçûk û mezin qewimîn û Kerkuk û Silêmanî her ji wan rojan şûn de ji têkelhevî û şoreşê rizgar nebûn...

Wergera ji Soranî: Elîşêr

- (*) Ev perçenivîs ji pirtûka Refîq Hilmî ya bi navê Yadaşt Kurdistanî Iraq Şoreşkanî Şêx Mahmûd, Cildê yekem, ku li di sala 1956an de li Bexdatê, li Çapxaneyê Marîf hatiye çapkirin, hatiye girtin.
- (1) Li gor gotina mamoste Ebdulne'îm el-Elamî ku di El-Dihaya el-Silas de dibêje: bi xwe di nêz de şahîdê vê bûyerê bûye û ev hedîsa han di roja duyem a Cejna Qurbanê de qewimiye û du roj domandiye. Tahir el-'Emerî di Muqqederatu'l-Iraq el-Siyasiyye de dibêje: ev hedîsa han di roja yekem a Cejna Qurbanê de dest pê kiriye û sê şev û sê rojan ajotiye.
 - (2) Baha Efendî wê navê re li Musilê başkatibê Rejî bûye. Kurê Ebdullah Efendiyê Hacî Ibrahim Efendî yê xelkê Kîfrê ye.
 - (3) Walîyê Musilê yê wê çaxê Ferîq Paşa yê xelkê Helebê bû ku bi xwe jî endamê Partiya Ittihad û Terakkîyê bû.
 - (4) Şêx Seîd û kurên xwe ve xaniyê Mehmed Paşayê Sabuncî yê li ser Caddeya Serayê û li hemberê mekteba 'Idadiya kevîn ku niha kirine Saneyê Şerqîyye, bûne. Lê kesên derûdorên wan li xaniyekî nêzîkî xaniyê Şêx Seîd bûne ku ew xanî bi xwe jî yê Mehmed Paşa bûye.
 - (5) Ew sê kesên han ev bûne: Reşîd Efendiyê Omerî, Şêx Ibrahim Rumî û Elî Efendî yê îmamê mızgefta Nebî Şîr.
 - (6) Wê demê ji fermandarê taburê re, yanê ji amir fewca jendîrman re "tabur axasî" digotin.
 - (7) Ev, Xîdir Hemewendê ku mamoste Mu'îm behsa wî dike, Mehud Xîdir ê Hemewendî ye, wê çaxê ew li Musilê bînbaşiyê jendîrman bû.
 - (8) Li gor gotina mamoste Ebdulne'îm el-Elamî, Şêx Mehmed di dema êrîşanîna xelkê li ser mala Şêx Seîd de û kuştina birayê wî, ew li mala Xîdir Hemewendî bûye. Pîştî êrîşker ji wir dîjn mala Hacî Mehmed Çilîcadîr, ew ji mala ku li wir in xwe digihînin qonaxa hukumetê.
 - (9) Ji bo dîr û dirêj behsa kirinê Reşîd Paşa û navên wan kesên hatine girtin û bi destê xwe tawanê îdamkirinê daye wan û encamên vê bûyera han, binêre: kitêba El-Dihaya el-Selas ya mamoste Ebdulne'îm el-Xulamî.

MEM Û ZÎN: Şax û şovên zargotî û şîira EhmedêXanî

Michael L. Chyet

Dema ku em li ser destana Mem û Zînê disekinîn, berî hemî tiştî divê em cudatîyê bikin navbera şax û şovên zargotî yê wê çîrokê (yan wê qewlê) ji aliyekî -ku hejmara wan gelek e- û şîira wêjeyî (edebî) ya Ehmedê Xanî ji dûmahîya sedsala hijdehan ji aliyekî din. Bêguman e'sil û jêderê wan yek e. Di herdûkan da, e'ynî şexsiyet xuya dibin (Mem, Zîn, Qeretajdîn, hwd) ûbûyerên serhatîya evîndariyê ya trajîk jî nêzik hev in, di herdûkan da. Her wisa, ferq û cudatîyên ewqas girîng hene navbera berhema bêjeyî û şax û şovên zargotî ku em mecbûr in cuda-cuda behsa wan bikin. Armanca wê lêkolînê jî nasandina ferqên serekî di navbera van du waran de ye. Di e'ynî wextê da behsa e'sla ban herdû hebûnan (tiştan) wê bête kirin, da ku em bikaribin bersiva wê pirsyarê bidin: Gelo berhema Ehmedê Xanî kevntir e, yan çîroka zargotî kevntir e.

Kurdologên Frensî Roger Lescok [Rojê Lesko] û Joyce Blau rişt in li ser ferqên navbera şovên zargotî û berhema Ehmedê Xanî. Ew bo şovên zargotî navê "Memê Alan" datîni û navê "Mem û Zîn" bi tenê bo şahesera Ehmedê Xanî bi kar tînin. Herçend ev cudatîyê rewa be jî, lê Kurd bi xwe wisa ferq nakin. Li gora zarê gelê Kurd, herdû nav jî bi kar tên bo destana Mem û Zîn. Sed car mixabin ku ji ber ku derfet neketiye destê pirraniya Kurdan ku li ser ziman û çanda (ango kultura) xwe bixwînin, behra bêtir wana hay ji du tiştên ji hev cuda tunebûye; berevajî, wana wisa zanîbû ku Mem û Zîna EhmedêXanî û zargotî yek in. Ji ber wê çendê, termînolojiya birêzan Lescot û Blau ji aliyekî û ya gelê Kurd ji aliyekî din, hev nagrin.

Herwisa, li nav Kurdan çîrok û qewlên din jî hene ku xwedî di nav in. Wek mînak, destana Siyabend û Xecê bi navê Siyabendê Silîvî jî tete nas kirin. Navê

Siyabend û Xecê weke navê Mem û Zînê, ji navên herdu dilketiyan pêk têt. Ji milekî din, navê Siyabendê Silivî -her wek Memê Alan- ji navê gernasê serhatiyê û eşîreta wî pêk têt.

Ferq û cudayî yên navbera şîra EhmedêXanî ya wêjeyî û şax û şovên zargotî bi du babetan têne par kirin; babeteke rêstinî [texture] û babeteke naverokî. Rêstin bi kar têt bo diyar kirina pêkhêner [ango element]ên şiklî [teşeyî] û uslûbî, digel şiklê gilî kirin û vegêrana serhatiyê, ku bi pexşan [nesir] yan bi nazim hatiye gilî kirin. Ku em behsa naveroka çîrokê dikin, em li ser avahî û hilêxistina çîrokê disekin. Bi gotineke din, eger em li ser çêkirina xaniyekî bisekinin, emê qala van madde û keresteyan bikin, ku xanî ji wan hatiye çêkirin, wek çimento, yan kelpîç, yan teqn û herî; piştî hingî, emê qala hejmara mezelan (yan odeyan), deriyan, pencereyan û hwd. bikin, ango di hindurê xênî da çend mezêl hene. Babeta rêstinî wek *maddeyên xênî* ye û babeta naverokê wek *reng û hejmara mezêlan* e.

Niha emê li ser babeta rêstinî bisekinin. Berhema wêjeyî ya Ehmedê Xanî bi şiklê mesnevî, ango şiklekî şîrî yê wêjeya Farisî ya klasîkî, hat nivîsandin: Hemû rêz[nesir] bi du nivîran [misre'an] par dibe, bi pîvana hezec [fa'- lun/ ma- fa-'i-lun/ me- fe- 'i- lun, yan —/ °.°-/°°—].

Lê hemû şaxên zargotî, hinek rêzên şîrî hene, lê piraniya wan ji çîrokên bi pexşan pêk tîn, tev kilam û stranên bi şîr li beşên taybetî, mesela her cara ku Mem û Zînê ra dipeyive. Hinek şaxên din jî hene ku serhevda bi şîr tîn stiran, lê ev şîra han ji rêzên Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî cuda ye: Şiklê wê ne yê mesnewî ye; pîvan têde tune; rêz bi nivîran par nabin û navbêra hemû rêzan qafiye heye.

Li helbesta wêjeyî, Mem jî xelqê Cizîra Bohtan e û Zîn jî wisa. Li hemû şaxên zargotî jî, Zîn xelkê Cizîra Bohtan e, lê Mem xelqê bajarekî din e. Navê bajarê wî yan Muxurzemîn e, yan Yemen e -nemaze li şaxên başûrê (ango, Behdînan û Mehabadê: ji herêma Mehabadê û pê ve, çîroka Mem û Zînê li nav Kurdên Soranîziman naê gilî kirin- hêç nebe, tu şax nehatiye berev kirin heta niha!). Ji ber vê yekê, li şaxên zargotî, beşekî çîrokê yê girîng heye, ku li helbesta Ehmedî Xanî qet naê xuyanê: rêwîtiya (swar bûna) Memê Alan li ser piştî hespê xwe Bor (ya Bozê Rewal) ji bajarê xwe heta Cizîra Bohtan.

Kesaniya Memê bi xwe di berhema Ehmedê Xanî da gelek ferq e ji ya wî di şax û şovên zargotî da. Memê Ehmedê Xanî xwedî roleke berz û bi e'sil e û reftara wî qet riswa nabe. Di ser vê hindê ra, Memê Alan yê ku di şax û şovên zargotî da xuya dibe, çend bedew be, ewqas jî bê şeref e. Al Paşa bavê wî jê ra dibêje:

-Memê, lawo, were meke bê îtbarê,

Şehêrê Muxurzemînê mehêle hîvya min kalî...

Lê belê Mem bédiliya bavê xwe dike û ji bajarê bavê xwe derdikeve û wisa dibêjîtê:

-Bavo, çi bikim vê malê, vê dewletê...

Ya min û weva çû heta roja qiyametê (Jndi)

Û li şaxekî din:

-Îdî kurtiya min tera boşe, wê betalo. (Dzhalilov)

Lê dû gotina birêz Lescot [Lesko]:

“Şola me bi du şîrên jêk cuda ye ku ruhên wan, uslûbên wan û li hindêk erdan jî naverokên wan, bi temamî ji hev ferq in: Memê Alan yê dengbêjan û Mem û Zîn yê Ehmedê Xanî.

Pirsyareke ku her tim tête dubare kirin ev e: Gelo e’sla şax û şovên qewla Mem û Zîn yên zargotî şîra Ehmedê Xanî bi xwe ye, yan berevajiyê, şahesera wî ji şaxên zargotî hatibû wergertin? Bila em mêze bikine delîlan. Ji rê ve (ango, di destpêkê da) wisa diyar e ku berhema Ehmedê Xanî ya ji sedsala hivdehan kevntir e. Ji ber ku şaxên zargotî bo cara pêşîn li salên 1869 û 1870’an hatibûn berhev kirin. Lê belê, divê ku em ji ber çavên xwe wunda nekin ku berî naverasta sedsala nozdehan, warê folklorê (yan zargotî) hêj peyda nebûbû û her wisa kesî bi berhevkirina çîrokên zargotî ji zarê dengbêjan û çîrokbêjan hêj mijûl nebûbû. Eger em wisa hizir bikin ku filan şîrok hêj peyda nebûbû çimkî ew yek nehatibû berhev kirin ji zarê gelerî berî ku berhev kirin 8Yan top kirin) bi xwe dihatine kirin, emê xelet bin.

Du rastiyan giştî dikarin alikariya me bikin bi vedîtina bersîvekê bo pirsiyara me. Yek, rastiya ku li Kurdistanê, hejmara wan kesan ku nizanin bixwînin û binivîsin mezin e, tevî rastiya didoya, belavbûna qewla Mem û Zîn li hemî deverên Kurdistanê bakur û li hinek deverên Kurdistanê başûr û ya rojhilatê. Belavbûna vê qewlê li nav ewqas mirovên ku pîrraniya nexwenda ne, guman dixê ber vê hizra ku berhema Ehmedê Xanî ya wêjeyî e’sla şax û şovên zargotî be. Hemî jêder hevber in bi diyar kirina wan ku qewla zargotî ji berhema Ehmedê Xanî kevntir e.

Bi gotina Qanatê Kurdo:

“Destana ‘Mem û Zîn’ berî qurna here navînda li nav xelqê Kurd da peyda bûye, navê Mem û Zîn li nivîsara şayirê Kurd Melayê Cizîrî da (qurna 14) tê gotin. Meleyê Cizîrî wextê hezkira xwe E’yşe ra xeber dide, derheqa evîna xwe dibêje: “Tu Zîn î, ez Mem im” ⁽¹⁾.

Bi saya gotareke kurdnasê Îngîlîz D.N. MacKenzie, em niha dizanin ku helbestvanên Kurd Melayê Cizîrî navbera salên 1570 û 1640 jiyaye û ne wek Qanatê Kurdo nivîsî, li qurna (sedsala) çardehan. Lê ji vê xeleteke piçûk û pê ve, ev gotina Kurdo ji me ra tiştekî zef girîng nîşan dide. Ehmedê Xanî sala 1650 hate dinê û sala 1706 yan 1707 çû rahmetê. Ango, navbera mirina Melayê Cizîrî û jidayikbûna “Ehmedê Xanî” deh sal hene. Melayê Cizîrî navê Ehmedê Xanî qet nebihîstibû; dîsan jî, wek li gora gotina Kurdo kifş e, Melayê Cizîrî navên navên Mem û Zîn bihîstibûn. Vê gavê, hebe tunebe, çîroka Mem û Zîn ji helbesta wêjeyî ya Ehmedê Xanî kevntir e! Her çawa be, ji ber ku guman têda tune ku Melayê Cizîrî berî Ehmedê Xanî jiyabû, ev şîra Melayê Cizîrî bihêztirîn delîl di destê me de ye bo îsbat kirina îdeaya me ku kevneşopiya şax û şovên zargotî ji şîra Ehmedê Xanî kevntir be.

Edîbê Kurd yê mezin Emîr Hesênî jî beyan dika ku “îlhama vê berhemê ji qewl 8yan beyt) gelêrî ‘Mem û Zîn’ yan ‘Memê Alan’ hatibû wergirtin, ya ku dengbêjên Kurd îro jî gilî dikin” ⁽²⁾.

Li dû gotina birêz Ferhad Şakelî, Ehmedê Xanî bi xwe dudil e hemberî vê meselê. Ji aliyekî, Xanî bi xwe pênasîn pê dike ku e'sla berhema wî kevneşopiya zargotî ye, wek ev rêzên han nişan dikin:

(239) *Înaya nîzam û întizamê*

Kêşeya cefa ji boyê 'amê

[Gihand hev, vêkxist, xist dûzenê bi awayekî têgihîştî

û di vê rê da cefa kişand, ji bo xizmeta giştî (Bozarslan 1995: 181[63])

(322) *Nexmê we ji perdeyê derînim*

Zînê û Memê ji nû vejînim.

Lê berevajiyê, rêzên din jî hene ku peymana wan wisa ye ku şîira Xanî ji kereste û malzemeyên nû pêk têt, wek mînak:

(349) *Uslûb û sîfet û me'na û lefz*

Eslên nekirin yek ji wan qerz.

Şakelî vê têzadê wisa şîrove dike: Naveroka şîira Ehmedê Xanî kevneşopî ye, lê belê ya nû, rêstina wê ye, ya ku ji mesneviya Farisî ya klasîk hatibû wergirtin.

Heta niha, me dîtîye ku rêstina berhema Ehmedê Xanî û naveroka wê jî yên zargotî ferq in. Eger naverok cuda ye, dûr nîne ku peyama wan du hebûna jî cuda be. Li şax û şovên zargotî, kevok yan milyaket yan e'frît Mem û Zîn digihînine hevdu û Mem xelqê bajarekî dûr e ku ew bi bédiliya bavê xwe jê derdikeve da ku bide li pey Zînê. Berevajiyê, li şîira Ehmedê Xanî, Mem jî û Zîn jî herdu xelqê Cizîra Bohtan in ku bi helkeftê hevdu roja cejna Newrûzê dibînin.

Di têza min da, reftara Memê Alan ya li şax û şovên zargotî, wek xeyalên cinsî tevî serhildana xortekî nozdeh- bîst salî dijî desthilata bavê xwe tete şîrove kirin. Bi dîtina min, serhildana Memê Alan nik dilê xortên Kurd yên ku guhdarên vê çîrokê dibûn, kaniya mêrxasiyê ye. Ew xortên guhdar bi xwe nikaribû bi keça dilê xwe ra bizewicin: ew mecbûr bûn vê keçê bistînin ya ku bavê wan ji wan ra bijartibû. Lê belê li Memê Alan mêze ke! Ewî ya xwe kir, ji gotina bavê xwe derket û Zîna dilketiya xwe anî. Ji bona wan xortên guhdar, mêrxas ec e! Mem bi vê serhildana dijî bavê xwe jî têt nabe. Xortên gundên Kurdistanê newêrin bi axayan re bikin, wek Mem bi mîr re dike. Qey kê dît, kê bihîst ku xortek ranabe ser xwe, gava ku kalek -axayek be an na- dikeve odê? Dîsan Mem dijî adetên bapîran derket, bêî ku tifaqek hatibe serê wî. Ji bona xortekî nozdehsalî, mêrxasî ev e!

Hemî rewşênbîrên Kurd hevbir in li ser armancên Ehmedê Xanî yên siyasî bi afirandina “Mem û Zîn” a wî. Mebesta wî bi nivîsîna “Mem û Zîn” ev bû ku ev berhema hanê wê bibûya kevirê bingehîn yê wêjeya Kurdî. Bi dîtina wî, gelê Kurd

(1) Qenatê Kurdo [Kurdoev] “Derheqa şovêd Mem û Zîna zargotî û şova Mem û Zîna Ehmedê Xanî” *Govarê Korî Zanyarî Kurd* [The Journal of the Kurdish Academy], 6 [1978], p.102.

(2) Amir Hassanpour: *Nationalism and Language in Kurdistan, 1918- 1985* (San Francisco: Mellen Research University Press, 1992), p.84.

dikarîbû neteweyeke mezin be, lê kêmasiya wî hebû: bêtifaqî. Ji bona şîrove kirina ramana xwe, wî çîroka Mem û Zîn ya trajîk hilbijart. Li gora gotina Kurdnasê Mehabadî, Emîr Hesenpûr:

“Mem û Zîn nûnertiya du beşên Kurdistanê dikan, yê Osmaniyan û yê Farisan. Bekirê E’wan yê qumsî jî nûnertiya şîraq û bêtifaqiyê mîrên Kurdan dike yê ku bi dîtina Ehmedê Xanî sebebê esasî ya têkçûna (serneketina) hikûmeta Kurdî ya serbixwe ye. Rexne diriyê (kelemê) ku du dilketiyan ji hev diqetîne, şa’irê me hêvî dikir ku ev bêtifaqî wê êdî biqede.”

Û sed cara mixabin, em îro jî pê dihesin ku Bekir hêj nehatiye kuştin.

Bibliyografya

Chyet, Micheal L. “And a Thornbuch Sprang up between them”: Studies on Mem û Zîn, A Kurdish Romance. Doctoral dissertation [Berkeley, California, 1991], 2 vols.

Dzhalilov [Celîlov], Ordikhane & Dzhalil Dzhalilov. “Mem û Zînê (şax 1)” in Zargotina Kurda (Kurdish Folklor), Moskova: Nauka, 1978, vol.1, pp. 45-65.

Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, wergera tîpên latînî û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Uppsala, Sweden: Weşanxana Deng, 1995, p. 703.

Hassanpour [hesenpûr] Amir, Nationalism and Language in Kurdistan, 1918-1985 (San Francisco: Mellen Research University Press, 1992), p.520.

Jindi [Cindî] Hajie, ed. “Mem û Zîn” in: Kurdskie epicheskie pesni-skazy (Kurdish epic song-stories), Moskova: Izdatel’stvo Vostochnol Literatury, 1962, pp. 66- [97]; 183-[209].

Qenatê Kurdo [Kurdoev] “Derheqa şovêd Mem û Zîna zargotî û şova Mem û Zîna Ehmedê Xanî” Govarê Korî Zanyarî Kurd [The Journal of the Kurdish Academy], 6 [1978], pp. 78-110.

Lescot Roger, “Introduction”, Textes Kurdes, vol.2: Memê Alan, Beyrout, Institut Français de Damas, 1942, pp. [iii]-xxv.

Shakely[Şakelî] Ferhad, Kurdish Nationalism in Mem u Zin of Ehmed-i Xani, Sweden, 1983, p.65.

Mustafa Kemal û pîrsa Kurdistanê

Zinar Soran

Di Şerê Cihanê yê Yekem de, di pêşengiya dewletên emperyalîst de, dinya ji nû ve dihate par kirin. Di wê demê de, perçê mezin yê Kurdistanê di bin destê împaratoriya Osmanî de bû. Lê împaratoriya Osmanî ji hêz û taqet ketibû û weke meytê ketibû erdê. Dewletên mezin weke gur û rovîyan ketibûn ser wê beratê û bazara dabeşkirinê dikirin.

Di wê dema ku împaratoriya Osmanî hejar bibû û ketibû ber sikrata mirinê, li Rûsyayê Şoreşa Oktobirê çêbû. Desthilatdariya Çar hate rûxandin û desthilatî kete destê Lenîn û hevalên wî. Ev bûyer bû sebebê guherandina hinek plan û peymanên ku di nav dewletên mezin de hatibûn amade kirin. Mustafa Kemal û hevalên wî jî, ji wê rewşa taybetî û nakokiyên ku hebûn, îstifade kirin. Li ser beşekî erda ku di bin destê Împaratoriya Osmanî de bû, bi navê “Komara Turkiyê” dewleteke nû ava kirin. Di vî şerî de, zîrekiya herî mezin ya Mustafa Kemal bi fen û fûtan xapandina kurdan bû. Mustafa Kemal bingehe tevgera xwe li Kurdistanê û bi piştgiriya kurdan ava kir. Xwedêgiravî wê tirk û kurdan bi hevdu re welatê xwe ji bin destên dewletên emperyalîst derxistina û wê gelê Kurd jî bigihîştê hemû mafên xwe. Dewleta nû wê ya tirk û kurdan bûya. Lê piştî damezirandina Komara Tirkiyeyê, her ku çû ew soz û peymanên ku hatibûn dayin, hatin înkâr kirin. Mustafa Kemal, di dewsa bicîhanaîna soz û peymanên ku dabû kurdan, siyaseteke li ser esasê zilm, zordarî, înkâr û asîmlasiyona neteweyê Kurd da pêşiya xwe.

Piştî peymanê Mondrosê ya 1918an, hêzên leşkerî yên dewletên hevpeyman paytextê dewleta Osmanî Stenbolê dagir kirin. Leşkerên dewletên hevpeyman paytextên împaratoriya Osmanî xistibûn bin destê xwe û bi taybetî zordestî û pîkolîyeke mezin li serbaz û leşkerên osmaniyan dikirin. Di wê demê de hukûmeta

Stenbolê, Mustefa Kemal weke Mufetîşê Giştî yê Artêşê şande Anadoluyê. Ew bi vê wezîfeyê, di 15ê gulana 1919an de ji Stenbolê derket. Hêviya wî bidestxistina piştgiriya serokeşîr, feodal û navdarên kurdan bû. Wî xebat û tevgera komeleyên kurdan li pêşiya vê armanca xwe kelem û astengeke mezin didît. Mustefa Kemal ji bona ku bi fen û fûtan piştgiriya kurdan bistîne û pêşiya tevgera kurdî ya neteweyî bigre, di ser Amasyayê re derbasî Erziromê bû. Planê Mustefa Kemal ev bû ku bi hinek soz û peymanan piştgiriya serokeşîr û malmezinên kurdan bi dest xîne û tevgera kurdan ya taybetî ji holê rake.

Gava Mustefa Kemal derbasî Anadolu û Kurdistanê bû, xebat û çalakiyên “*Kürt Teali Cemiyeti ya Diyarbekirê*” ji nêzîk ve xiste bin kontrolê. Wî dixwast ku ji destpêkê û berî ku xurt bibe, hemû agirên tifikên tevgera Kurdistanê bidefîne. Ji bo vê armançê, Mustefa Kemal weke destpêk ji “*Kürt Teali Cemiyeti ya Diyarbekirê*” dest pê dike. Wî ji aliyekî peywendî bi hukûmeta Stenbolê û karbidestên dewleta Osmanî yên li Diyarbekirê re datanî, ji aliyê din jî, ji bo berberî û dijminatîyê di nav kurdan de kûr bike, bi serokeşîr û malmezinên kurdan re têkiliyên taybetî geş dikir.

Mustefa Kemal li ser vê rewşê, di 29ê gulana 1919an de ji “*Erkan-i harbiye-i Umumiye*” (Serkanîya Giştî ya Leşerî) re telgrafekê dişîne. Di vê telgrafê de diyar dike ku Qlûba Kurd ya li Diyarbekirê ji bo Kurdistanek serbixwe dixebite û di nav vê komeleyê û komeleyên hevalbendên hukûmetê de, dijîti zêde dibe.

Mustefa Kemal û kolordiyê, li ser rewşa dewletê ya giştî agahdarî didan serokeşîr û giregirên kurdan. Ji bo daxwaz û tawsiyeyên piştgiriye, ji gelek serokeşîr û malmezinên kurdan re yên ku li Kurdistanê xwedî nifûs û tesîreke birbiçav in, telgraf dişandin. Mustefa Kemal ji dewletê daxwaz dikir ku ew bi taybetî li ser herêma Kurdistanê rawestin. Wî tika dikir ku agahdariyên di derheqê Kurdistanêke Serbixwe û herêmên ku Îngilîz dixwazin têxin bin bandora xwe de, ji wî re bêne şandin ⁽¹⁾.

Li ser daxwaza Mustefa Kemal, karbidestên dewleta Osmanî yên Diyarbekirê “*Kürt Teali Cemiyeti ya li Diyarbekirê*” digrin. Di 8ê hezîrana 1919an de, cîgirê waliyê Diyarbekirê bi telgirafekê mizgîna girtina vê komeleyê dide Mustefa Kemal.

Gava li diyarbekirê ev bûyer çêdibûn, hevalbendên Mustefa Kemal li Erziromê jî vala ne disekinîn. Ji bona piştgiriya gelê Kurd bigrin, di nav hewldanên taybetî de bûn û siyaseteke durû dimeşandin. “*Erzurum Müdafaa-i Hukuk-u Milliye Cemiyeti*” di belavoka xwe ya 30ê gulana 1919an de, li ser wîlayetên Kurdistanê weha dinivîse: “*Ev wîlayetên me emanetî namûs û welatparêziya kurd û tirkên ku bi dîn û dîrokî birayên hev in, ne*”. Vê komeleyê di raporek xwe ya 17ê hezîrana 1919an de jî, mafên “*milletekî ku ji Kurd û tirkan pêkhati*” diparast. Di 18ê hezîrana 1919an de, Mustefa Kemal ji Amasyayê bi telgrafek şifrekirî “*mizgîna ku kurd bi tirkan re bûne yek*” dide Qomandarê Kolordiya Yekem ya Edirneyê Cafer Teyar Beg. Di belavoka Kongreya Erziromê de, wîlayetên

Kurdistanê bi navê “*Wilayetên Rojhilatê*” dihatin bi nav kirin û ew perçeyekî civata Osmanî dihatin qebûl kirin:

“*Wilayetên rojhilatê Erzirom, Siwas, Diyarbekir, Xarpêt, Wan û Bedlîs... yekperçeyekî ku bi tu sedeman ji hevdu û civata Osmanî nayên cihê kirin. Mislîmanên ku li vê navçeyê dijîn... taybetiyên her grûbên etnikî û civakî ku di pêkanîna neteweyê de cih digrin, wê li ber çavan bête girtin. Lê belê, bi awakî giştî ew hemû unsûrên misilman xwe weke birayên ku ji dê û bavêkî ne, dibînin*”⁽²⁾.

Di protokola Amasyayê ya 20- 22ê çiriya pêşîn ya 1919an de jî, “*erdên ku kurd û tirk li ser dijîn*” weke sînorê dewleta Osmanî hatiye qebûl kirin. Ji bo ku pêşiya propogandayên dewletên biyaniyan bigre û kurdan bêtir bi xwe ve girêbidin jî, di vê protokolê de ev biryar hatiye girtin:

“*Ji bona propogandayên biyanî yên ku xwedêgiravî bi aramîna serxwebûna kurdan tînin kirin, berterafbibin; biryar hate girtin ku piştgiriya hemû mafên etnikî û civakî yên ku wê serbestiya pêşketina kurdan pêk bîne, bête kirin. Munasib hate dîtin ku ev tişt ji niha de ji aliyê kurdan ve bête zanîn*”⁽³⁾.

Di rastiya xwe de, Mustefa Kemal di bin kirasê “*biratiya misilmaniyê*” û “*biratiya kurd û tirk*” de, siyaseteke nîjadperest û kolonyalist ya tirkan dimeşand. Ew hewldan û gotinên grover yên ku dikarîbûn bi guhan xweş bihatana jî, hemû ji bona xapandina kurdan û tefandina tevgera neteweyî ya Kurdistanê bû. Mustefa Kemal ji bo ku rûyê xwe yê rastî eşkere neke, pir bi zanebûn gotinên “*enasirê Kurd û Tirk*”, “*biratiya Îslamî*” û “*biratiya kurd û tirk*” dixebitand. Wî bi van fen û lîstikên xwe, gelek serokeşîr û malmazinên kurdan xapand û ji bo şerê damezrandina Komara Tirkiyeyê alîkarî û piştgiriya wan stend. Bi saya serê kurdan tevgera xwe li Kurdistanê hûnand û li ser xirbeyê Împeratoriya Osmanî dest bi amadekirina şerê damezrandina dewleteke nû kir.

Mustefa Kemal piştî îlankirina Komara Tirkiyeyê jî nedixwest ku bi carekê hebûna kurdan înkâr bike. Heta ji bo dewsa lingên xwe baş saxlem bike, behsa mafên kurdan yên taybetî dikir û ji bo wan otonamiya heremî dixwest. Ev di dokument û belgeyên wê demê de hene. Lê piraniya wesîqeyên li ser kurdan, heta niha jî di bin kîlêtan de hepskirî ne. Ji wan belgeyan tenê hinek “*bêhemdî*” hatine weşandin ya jî hatine bi dest xistin. Mustefa Kemal di van wesîqeyan de, bi awakî xwezayî navê Kurd û Kurdistanê bi kar tîne. Yek ji wan wesîqeyan, talîmateke Mustefa Kemal e. Ev talîmatnameya bi navê serokê Heyeta Wekîlên Meclîsa Millet ya Mezin û bi îmzeya Mustefa Kemal ji Qumandariya Cepheya Elcezîreyê re hatiye şandin. Di 22ê tîrmeha 1922an de, ev talîmeta li meclîsê hatiye xwendin:

“*Talîmata Heyeta Wekîlên Meclîsa Millet ya Mezin, di derheqê Kurdistanê de û ji bo Qumandariya Cepheya Elcezîreyê ye.*

1. Li tevayê welêt, gav bi gav û bi awakî berfireh damezrandina îdareyên heremî yên ku rast û rast di bin tesîr û desthilatiya tebeqeyên civatê de ne, pêwîstiya siyaseta me ya hundurî ye. Li heremên ku kurd lê cîwar in, hem ji bo siyaseta me ya hundur, hem jî ji bo siyaseta me ya derve, em gav bi gav

damezrandina îdareyeke herêmî pêwîst dibînin.

2. Mafên ku her millet çarenûsa xwe bi destê xwe tayin bike, prensîbeke ku ji aliyê tevayê dinyê ve hatiye qebûl kirin. Me jî ev prensîba pejirandiye. Li gorî ku tê texmîn kirin, divê kurd jî heta wê demê rêxistinîyên xwe yên ji bo îdareya mehêlî temam kiribin. Li ser navê vê armancê, divê serok û navdarên wan ji aliye me ve hatibin qezenc kirin. Gava ew nerîna xwe bidin diyar kirin, divê îlan bikin ku ji xwe ew xwediyê çarenûsa xwe ne û dixwazin di bin îdareya Meclîsa Millet ya Mezin ya Tirkiyeyê (TBMM) de bijîn. Wezîfeya Qumandariya Cepheya Elcezîreyê ye ku hemû xebatên li Kurdistanê ber bi siyaseta ku bi vê armancê ve girêdayî ye, bive.

3. Li Kurdistanê ji bona dijminatîya kurdan ya li hemberî fransiyan û bi taybetî li sînorên Iraqê li hemberî îngilîzan bi pevçûnên çekdarî bighêje qonaxeke bêveger û ji bo em nehêlin ku kurd û biyanî bibin yek, divê em sebebên damezrandina îdareyên mehêlî bidin diyar kirin û bi vî awayî wan bi dil bi xwe ve girêdin. Xetên giştî yên ku em serokên kurdan bi meqamên mulkî û eskerî wezîfedar bikin û wan bêtir bi xwe ve girêdin, hatiye qebûl kirin.

4. Siyaseta hundur ya Kurdistanê wê ji aliyê Qumandariya Cepheya Elcezîreyê ve bête yekkirin û birêvebirin. Qumandariya Cepheyê, wê di vî warî de bi serokatiya Meclîsa Millet ya Mezin ve dan û stendîne bikin. Merciyê sazkirin û yekkirina xeta tevgera ku wê ji aliyên wîlayetan ve bête meşandin û di vî warî de cihê ku karmendên mulkî serî lê bidin jî, qumandariya cepheyê ye.

5. Gava Qumandariya Cepheya Elcezîreyê di warê îdarî û dadmendî ya jî aborî de pêwîstiya guherandinê bibîne, pêkanîna vê pêşniyarî hukûmetê dike.

Ji Qumandariya Cepheya Elcezîreyê berêz Tuğgeneral Nîhad Paşa re.

Taybetî û sexsî ye.

Talîmata ku ji aliyê Heyeta Wekîlên Meclîsa Millet ya Mezin ya li ser Kurdistanê hatibû amade kirin, weke ku li jor e, bi taybetî ji cenabê te re hatiye şandin

Serokê Meclîsa Millet ya Mezin
Mustefa Kemal" (4)

I- SERHILDANA KOÇGIRÎ Û QANÛNA OTONOMIYA KURDISTANÊ

Di çirîya pêşîn ya 1920î de, di pêşengiya Alîşêr de, li Koçgiriye serhildaneke kurdan dest pê dike. Di 21ê adara 1921ê de, Alîşêr bi 1500 mirovên xwe bajarê Îmraniyeyê digre. Ji bo ku vê serhildanê bitefîne, fermandarê artêşa navendî Nurettin Paşa tê wezîfedar kirin. Nurettin Paşa û bi taybetî çeteyên Topal Osman bi hovitiyeke mezin êrîşî ser xelkên sivîl dikin. Nurettin Paşa bi vê barbariyê jî

nayê ser û ji hukûmetê daxwaz dike ku gundiyan vê herêmê li Anadoluyê belav bikin û wan di nav kultura tirkan de asîmle bikin. Zilm û hovitiya Nurettin Paşa li Meclîsa Tirkîyeyê dibe mijarê gotûbêjên dijwar. Di van gotûbêjan de, bi awakî eşkere li ser pîrsa Kurd û Kurdistanê tê rawestandî. Hinek mebûsên ku ji Kurdistanê ne, weke mebûsê Swêregê Lutfî Beg bi awakî vekirî û serbilindî dibêje ku “*ez mebûsê Kurdistanê me*” û rola kurdan ya di şerê avakirina Komara Tirkîyeyê de tîne zimên.

Di van gotûbêjan de, daxwaz tê kirin ku Nurettin Paşa bête mahkeme kirin û ji wezîfeya wê bête derxistin. Di encamê van gotûbêj û daxwazan de, meclîs neçar dimîne ku biryarê bigre ku Nurettin Paşa ji wezîfeya wê dirdixîne û mahkeme bike. Lê ev biryar ne li gor dilê Mustafa Kemal bû. Ew li dijî vê biryarê derdikeve û ji bo vê yekê jî sarbûn dikeve nav wî û hukûmetê. Ji bona ku wezîrê karên hundur ev biryar di cih de dîtiye, Nurettin Paşa ji wezîfeya wî hatiye derxistin; lê piştî şeş mehan ew weke fermandarê artêşa yekem hatiye tayin kirin ⁽⁵⁾.

Di dema ku serhildanên kurdan li Koçgirî û derdora Mêrdînê berdewam dikirin. Ji bo ku rewşê di cih de bibîne, Mistefa Kemal di serokatiya Ahmed Senusî de heyeteke hevbeş dişîne Kurdistanê. Ahmed Senusî ji malbateke arîstokrat ya Lubanî dihat. Heyet bi gelek serokeşîr û mezinên kurdan re dipeyive, li ser rewşa serhildanan û pîrsa kurdî raporekê amade dike û pêşkêşî Meclîsa Tirkîyeyê (TBMM) dike. Li ser vê raporê, Meclîsa Tirkîyeyê di 11ê sibata 1922an de dicive û ji bo otonomiya kurdan qanûneke taybetî derdixîne. Lê belgeyên wê rojê û zabitnameyên wê qanûnê, ji aliyê karbidestên dewleta Tirkîyeyê ve hatine dizîn. Şûna zebitnameyên Meclîsa Tirkîyeyê yên wê rojê, vê gavê vala ye.

Di derheqê vê civîn û qanûnê de, Komiserê Bilind yê Hêzên Hewayî yê Îngilîzan Horace Rumbold ji Kedlaston Markizi Curzon re belgeyekê dişîne. Di vê belgeyê de, ev qanûna ku di Meclîsa Tirkîyeyê de hatiye qebûl kirin, bi kurtayî weha hatiye rave kirin:

“1- Meclîsa Tirkîyeyê ji bo ku pêşketina pêwîstiyên medeniyetê yên milletê Tirk pêk bîne; ji bo milletê Kurd damezrandina îdareyeke otonom ya ku li gor urf û adetên wî, teahut dike.

2- Meclîsa Tirkîyeyê, wê berpirsiyarekî ku ji aliyê milletê Kurd ve tê qebûl kirin û xwediyê tecrûbe û derbasbûneke bi rûmet e, weke waliyê giştî hilbijêre.

3- Waliyê giştî wê ji bo sê salan bête tayin kirin. Ger piraniya milletê Kurd nexwaze ku ew wezîfeya xwe berdewam bike, wê ji aliyê Meclîsa Neteweyî ya Kurd ve, waliyekî nû bête hilbijartin.

4- Tayinkirina waliyê giştî, cigirê waliyê giştî û mufetîş, ji bo erêkirinê pêşkêşî hukûmeta Ankarayê dibe.

5- Meclîsa Neteweyî ya Kurd wê bi hilbijartineke giştî ya li wîlayetên Rojhilatê bête pêk anîn. Her meclîs wê ji bo sê salan bête hilbijartin.

6- Di warê hemû pîrsgirêkên ku di nav waliyê giştî û Meclîsa Kurd derkevin holê de, Meclîsa Tirkîyeyê biryar digre; herdu alî mecbûr in ku qerara Meclîsa

Tirkîyeyê qebûl bikin.

7- Ji bona parastina huzûra wîlayetên Rojhilatê, wê kolordiyeye cendirman bête pêk anîn. Meclîsa Kurd wê qanûna ku di warê pêkanîna vê kolordiyê de, di ber çavan re derbas bike; lê belê, fermandariya bilind û xizmetên cendirman, heta dema ku pêwîst bête dîtin, wê di destên karbidestên Tirkîan de bin.

8- Zimanê tirkî tenê wê di Meclîsa Neteweyî ya Kurd de, di kar û barên birêvebirinê de û di birevebirina hukûmetê de, bête bi kar anîn. Ligel vê yekê, di dibistana de zimanê kurdî dikare bête fêr kirin. Bê ku zimanê kurdî di pêşerojê de bibe bingehe zimanê resmî yê hukûmatê, dikare bikaranîna vî zimanî bête teşwîq kirin.

9- Meclîsa Neteweyî ya Kurd xwedî maf e ku mêzîna hatin û çûyinên wîlayetên Rojhilatê kontrol bike; li neheqiyên ku dikarin li karmend û perpîrsiyarên îdarî yên qedemeyên jêr bibin, bipirse.

10- *Bê destûr û erêkirina waliyê giştî, Meclîsa Neteweyî ya Kurd nikare tu bacê têxê jiyanê* ⁽⁶⁾.

Di rûniştin û gotûbêjên Meclîsa Tirkîyeyê de, gelek caran li ser pîrsgirêka kurd û Kurdistanê hatiye rawestandin. Di van gotûbêjan de, neteweyê Kurd û welatê wî Kurdistan nehatiye înkâr kirin; navên Kurd û Kurdistanê bi awakî xwezayî hatiye xebitandin. Weke nimûne ez dixwazim çend perçenivîsên kurt ji wan gotûbêjan binivîsim:

Lutfî Beg (Parlamentê Swêregê):

“Gelî efendiyan! Ezbenî, ez îro parlementê Kurdistanê me... xelkê Kurdistanê bi tu awayî xayintî û serhild neaniye bira xwe...”

Gelî efendiyan, yên ku bi rastî serhildane û artêşa fransîyan li Rihayê mexlûb kirine, leşkerên kurdan in. Ev di rastiya xwe de, ne bi saya serê leşkerên Nihat Paşa, bi saya serê serhildana eşîrên kurdan çêbûye ⁽⁷⁾.

Huseyin Rauf Beg (Serokwezîr):

“...Hemû hewldanên îngilîzan yên ji bo îmhakirina tirk û kurdên ku li Tirkîyeyê cîwar in, li hember yekitiya van herdu milletên esilzade îflas kiriye...” ⁽⁸⁾.

Huseyin Avni (Parlamentê Erzîromê):

“Delegeyên me yên li Lozanê, nûnerên du birayan yên tirk û kurdan in” ⁽⁹⁾.

Yusuf Ziya (Parlamentê Bedlîsê):

“Gelî hevalan;...Ez Kurd im. Lê ez kurdekî ku bilindbûna Tirkîyeyê, şerefa Tirkîyeyê, pêşketina Tirkîyeyê dixwazim... Ger tirk bi kurdan re hevkarîyê nekin, wê ji bo herduyan jî encam tunebe... Yekitiya kurdan, sêdaqeta kurdan, ne di du perçekirina kurdan de ye; di îdarekirina wî ya bi awayekî yekperçeyî de ye... Îngilîz li wê derê pizikek çêkirine. Bi vê pizikê wê Kurdistanê gemarî bikin. Pêşîya vê bibirin” ⁽¹⁰⁾.

II- CIVÎNA ÇAPEMENIYÊ YA ÎZMÎRÊ Û OTONOMIYÊN MEHELÎ

Di 16 û 17ê çeleya paşîn ya 1923an de, Mustefa Kemal li bajarê Îzmîrê bi sernivîskarên rojnameyên tirkan re civîneke çêdike. Di vê civînê de, ew dixwaze ku xwedêgiravî nerînên xwe yê li ser çareserkirina pîrsa kurdî diyar bike. Protokola civînê ji aliyê katibên sûndxwarî yê Meclîsê de, hatiye nivîsandin. Weha diyar dibe ku Mistefa Kemal xwestiye girîngîyek taybetî bide civînê. Loma jî katibên Meclîsê yê sûndxwarî ji Ankarayê bi xwe re aniye civînê ku protokola civînê binivîse. Mustefa Kemal girîngiya agahdariyên ku wê di civînê de werin pêşkêşkirin, bi van gotinan aniye zimên:

“Li vê derê, em ê bi awakî pir eşkere û ji dil dan û stendîne bikin. Ji ber vê yekê jî tiştên ku em ê li ser bipeyivin, wê vê gavê neyên eşkere kirin. Babetên ku haya me jê çêbibin, li gor dem û rewşê hun dikarin bi kar binin”.

Li ser pîrsa rojnamavan Ahmet Emin Beg, di protokola civînê, rûpela 15an de, bi sernivîsa *“Pîrsa Kurdî”* ev tişt hatine nivîsandin:

“Pîrsa Kurdî:

Ahmet Emin Beg: Te behsa pîrsa kurdî kiribû, pîrsa kurdaiyê çi ye? Ger tu bikaribî weke pîrseke hundurî behs bike, wê baş be.

Gazî Paşa: *Pîrsa kurdî; ji bo me, yanî ji bo menfaetên tirkan jî bi tu awayî nabe mijarê behsê. Weke ku hûn jî dizanin, di nav sînorên me yê neteweyî de hebûna kurdan bi awakî weha belav bûye ku tenê li hinek cihan di rewşa pîraniyê de ne. Lê her ku çûye, bi wendakirina tîrbûn û pîraniya xwe û bi cîhgirtina di nav anasirê tirkan de, sînorekî weha çêbûye ku eger em bi navê kurdaiyê sînorekî çêbikin, divê em tirkan û Tirkiyeyê mahf bikin. Eger em weha ferz bikin, divê em li sînorekî ku heta Erzîromê, Erzînganê, Sîwasê, Xarpêtê dihere, bigerin. Û heta divê em eşîrên kurd yê li çolên Konyayê ne jî dûrçav nekin. Ji ber vê yekê jî, di dewsa ku em kurdaiyêke bi serê xwe bifikirin, ji xwe li gor qanûna bîngêhîn ya me, wê otonomiyên mehelî bêne ava kirin. Wê gevê, kîja wîlayeta ku xelkê wê kurd be, ew dê xwe bi awakî otonom îdare bikin. Ji derveyî vê yekê, gava gelê Tirkiyeyê mewzûbahîs be, divê em wan jî bi hevdu re îfade bikin. Dema ku ew neyên îfade kirin, ji vêya ew dikarin her gav pîrsa xwe derxînin holê. Niha Meclîsa Millet ya Mezin ya Tirkiyeyê, ji wekîlên desthilatdar yê kurdan û tirkan pêk tê û ev herdu unsûr hemû menfaet û çarenûsa xwe bi hevdu girêdane. Yanî, ew dizanin ku ev tiştêkî hevbeş e. Hewldana tespîtkirin û kişandina sînorekî cihê, wê ne rast be”⁽¹¹⁾.*

III- DI KONFERERANSA LOZANÊ DE CANBAZIYA SIYASETÊ

Ismet Paşa jî, di dema hevdîtinên peymanê Lozanê de, ji bona ku bi hindikî be jî hinek mafên kurdan di peymanên navneteweyî de cih negrin û wîlayeta Mûsilê di nav sînorên dewleta Tirkiyeyê de bimîne, bi awakî resmî û eşkere hebûna

kurdan qebûl dikir û bi fêlbaziyeke mezin siyaseteke durû dimeşand:

“Kurd naxwazin ku ji tirkan veqetin, ew dixwazin bi tirkan re bijîn... Hukûmeta Meclîsa Millet ya Mezin ya Tirkiyeyê, bi qasî ku ya tirkan e, ewqas jî ya kurdan e. Ji ber ku nûnerên rastî û meşrû yên kurdan ketine Meclîsa Millet û bi qasî nûnerên tirkan beşdarî hukûmet û birêvebirina welêt dibin.

Gelê Kurd û nûnerên wan yên ku li jor hatin diyar kirin, ne razî ne ku birayên wan yên ku li wîlayeta Mûsilê rûdinên ji welatê dayikê bêne veqetandin. Ji bona pêşiya vê veqetandinê bigrin, ji hemû fedekariyan re amade ne” ⁽¹²⁾.

Di van hevdîtinan de, li ser awayê dabeşkirina erdên Kurdistanê, şerekî mezin yê diplomasiyê di nav nûnerê Tirkiyeyê İsmet Paşa û nûnerê İngilîstanê Lord Curzon de, derbas dibe. Herdu nûner jî bi canbaziyeke mezin gotinên “mafên gelê Kurd” û “pirsa kurd û Kurdistanê” bi aliyê xwe ve dikşînin. Li ser îdeaya Lord Curzon ku “İngilîz dixwazin otonomiyê bidin kurdan, lê tirk naxwazin otonomiyê bidin wan”, İsmat Paşa diyar dike ku navê wê çi dibe bila bibe, ev tiştên ku İngilîz dixwazin pêk bînin, di rastiya xwe de kolonîkirina welatekî ye û kurdek dahî tune ku hevvelatiya dewleteke biyanî bipejirîne. İsmet Paşa, dûre jî gotinên xwe weha didomîne:

“Ew mafên tên gotin ku xwedegiravî wê bi otonomiya herêman bêne nas kirin ku maf û desthilatîyên hevvelatîyê naxe nav xwe, wê nijadekî weke kurdan esîlzade û sereta tu carî tatmîn neke”.

Li ser gotinên İsmet Paşa yên di warê Meclîsa Tirkiyeyê û temsîlkirina nûnerên kurdan de jî, Lord Curzon weha dibêje:

“Gava em werin ser meseleya parlamenterên kurdan yên Ankarayê, ez ji xwe dipirsim. Gelo parlementerek dahî bi dengê gel hatiye hîlbijartin? Her kes dîzanin ku ew însan hemû rast û rast hatine wezîfedar kirin û ji bona ku hinek ji wan bi ziman nizanin, beşdarî xebatên Meclîsê nabin. Loma jî, ez ne di wê baweriyê de me ku divê mirov giraniyeke mezin bide îdeaya ku civata kurd di parlamentoyê de tê temsîl kirin”.

“... Hemû agahdariyên ku me girtine dide nişan dan ku divê kurd bi dîroka xwe ya serbixwe, bi ziman, urf, adet û karakterê xwe, weke nijadekî otonom derkeve holê. Ji bo vê herêmê avakirina îdareyeke otonom, ji armancên birêvebirîya me ye. Ne tam be jî ev yeka, encameke ji encamên ku hatiye bidestxistin e. Di vê sîstema otonomiya herêmî de, wê îdareyeke taybetî û dibistanên ku ji bona hinkirina zimanê kurdî yê nivîskî bixebitin, hebin. Di van şertan de, ji bo çi ev gel teslîmî Ankarayê bête kirin...” ⁽¹³⁾.

Di konferansa Lozanê de, nûnerên Tirkiyeyê û İngilîstanê li ser pirsê wîlayeta Mûsilê li hev nekirin. Wan çareserkirina vê pirsê spartin Komeleya Neteweyan. Komeleya Neteweyan jî ji bona lêkolîna li ser vê pirsê, di 30ê îlona 1924an de ji sê kesan komisyoneke taybetî ava kir. Vê komiyonê, di lêkolîna pirsê weha ku rast û rast kurdan eleqedar dike de, neteweyê Kurd muhatap negirt. Ev pirs, demeke dûr û dirêj di nav dewletên emperyalîst û kolonyalîst de û bi taybetî di

nav Tirkîyeyê û Îngilîstanê de bû mijarê canbaziya diplomasiyê. Komisyona lêkolînê, di 16ê tîrmeha 1925an de, rapora xwe amade kir û kurtayiya encamê nerînên xwe weha formule kir:

“1- Divê welat, di demeke ku 25 sal munasib tê dîtin de, bi awakî efektîf di bin mandaya Komeleya Neteweyan de bimîne.

2- *Di warê birêvebirina welêt, xebitandina mekanîzma dadiyê, perwerdekirina dibistanan, tayinkirina memûrên ji kurdan û di hemû xizmetan de weke zimanê resmî bikaranîna zimanê kurdî de, divê daxwazên kurdan li ber çavan bêne girtin*”⁽¹⁴⁾.

Tirkîyeyê îlan kir ku ew vê raporê napejirîne. Wezîre karên derve Tefvîk Rüştü (Aras) di axaftina xwe ya di Komeleya Neteweyan de, diyar kir ku wê îngilîz di pêşerojê de kurdên Mûsilê li hemberî tirkan bi kar bînin. Di îlona 1925an de, Tirkîyeyê serî li Dîwana Dadiyê ya Komeleya Neteweyan da. Lê hemû hewldanên dîplomatik yên Tirkîyeyê pere nekirin. Komeleya Neteweyan di 16ê çeleya pêşîn ya 1925an de biryar da ku Mûsil di nav sînorên Iraqê de bimîne. Tirkîye li hemberî vê biryarê reaksiyon nîşan da û 17ê çeleya pêşîn ya 1925an de, bi Yekitiya Sovyetan re “*peymanî sînor û cîrantiya baş*” îmze kir. Lê piştî wê bi demekê, di 5ê hezîrana 1926an de, Tirkîyeyê bi dewleta Iraqê û Îngilîstanê re “*peymanî sînor û cîrantiya baş*” îmze kir û bi vî awayî dev ji wîlayeta Mûsilê berda⁽¹⁵⁾.

Piştî Mustafa Kemal şûna lingên xwe baş saxlam kir û desthilatiya xwe xurt kir; wî dest bi înkara kurdan kir û li dijî kurdan siyasete gelekî hov û dijwar da meşandin. Li hemberî van kiryarên Mustafa Kemal û vê polîtîkaya kolonyalîst û nijadperest, li Kurdistanê serhildan û berxwedanên gelê Kurd dest pê kirin. Lê mixabin gelê Kurd ew kês û firsendên ku berî damezrandina Komara Tirkîyeyê derketibûn holê, ji destê xwe revandibû. Piştî ku serhildanên Şêx Saîd (1925) û Agrî (1927) hatin tefandin, agirê serhildanê vê carê di sala 1937an de, li çiyayên Dersimê pê ket. Lê ew serhildan jî, nebû xwediyê jiyaneke dirêj, zêde berfireh nebû û di nav sînorê navçeyekê de, tuxûbkiirî ma.

Di dema serhildana Dersimê û şikestina vê serhildanê de jî karbidestên dewleta Tirkîyeyê li hemberî neteweyê Kurd zilm û zordariyike mezin, teror û hovîtiyeye pir dijwar domandin. Gelek gundên kurdan hatin şewitandin. Gelek pêşeng û welatperwerên kurdan hatin kuştin, daliqandin û sirgûn kirin. Gelek kadroyên siyasî û welatparêzên kurdan jî neçar man ku dakevin “Binya Xetê”, Sûriyeyê. Bakurê Kurdistanê kete nava pêjayoyek nû. Ewrekî reş û tarî xwe bera ser Bakurê Kurdistanê da, bêdengiyeye ker û lal dest pê kir.

Piştî şerê cîhanê yê duyem, di sala 1946an de, Komara Turkîyê derbasî sîstema pirpartîtiyê bû. Ev daxwazeke dewletên emperyalîst jî bû. Piştî bicîhanîna vê daxwazê, di sala 1947-an de, Amerîkayê bi navê alîkariya leşkerî “*Doktrîna Turûman*” û bi navê alîkariya aborî jî “*Plana Marşalê*” xiste jiyane. Ji bo talankirina dewlemendiya sererd û binerdê Kurdistanê û ji bo firotina malên xwe,

sermayeyê biyanî berê xwe dabû Kurdistanê jî. Ji bo vê armancê, riyên nû hatin çêkirin, peywendiyên di nav heremên Kurdistanê û têkiliyên sermayeyî bi awakî hêdî be jî roj bi roj bêtir pêş ve diçûn û berfirehtir dibûn. Bajar mezintir bûn û bazirganî jî berfirehtir bû. Bi kurtayî li Kurdistanê jî, di warê civakî, kulturî, aborî û fikrî de pêvajoyeke nû dest pê kiribû. Nakokî û berberiya desthilatîyê ya di nav çîn û hêzên desthilatdar yê Tirkîyeyê de, bi avakî eşkeretir derketibû ser rûyê erdê. Hesab û planên hilbijartin û dengan bibû sedemê ku zilm û zora giştî ya polis û leşkeran hinekî siviktir bibe. Di vê rewşa nû de, hinek kurdên ku hatibûn surgûn kirin, vegeyran welatê xwe. Tovên bûyer û tevgerên nû di bin axeke giran de dîsa zîl dida. Pêvajo, ji bona bûyer û bizaveke nû ducanî dibû...

Têbinî û çavkanî

- (1) Jî bo vê telgrafê binere: "Harp Tarihi Vesikaları Dergisi", sal 2, hejmar 5, Belga 90î, Ankara, îlona 1953. Hıdır Goktaş, Kürtler İsyân- Tenkıl, Alan Yayıncılık, Stenbol, nîsana 1991, r.33-34.
- (2) Bînerê: M. A. Gasratyan, Yeni ve yakın çağ da Kürt Hareketleri, Jîna Nû Yayınları, Sweden, îlon 1991, r. 126.
- (3) Jî bona Protokola Amasyayê binere: İsmail Beşikçi, Kürdistan Üzerinde Emperyalist Boluşum Mücadelesi 1915- 1925, cıld 1, Yurt Kitap Yayın, Ankara, gulân 1992, r. 381-382.
- (4) Kovara 2000'ê Doğru, 20-26 îlona 1987, hejmar 39, r. 21.
- (5) Jî bo vê behsê binere: Kovara Saçak, nîsana 1987, hejmar 39, r. 16
- (6) Nokta, 18-24 tebax 1996, hej: 34, r. 10.
- (7) Yê ku ji TBMM GCZ- III, 22ê tîrmehê 1922, r.564- 565 neqıl dîke: Kovara Saçak, nîsan 1987, hejmar 39, r. 19.
- (8) Yê ku ji TBMM GCZ- III ya 25ê çeleya pêşîn ya 1922an, r. 115 neqıl dîke: Kovara Saçak, nîsan 1987, hejmar 39, r. 19.
- (9) Yê ku ji Zabıt Cerîdesi ya 25ê çeleya paşîna 1923an neqıl dîke: Mahmut Goloğlu, Milli Mücadele Tarihi- 5, Türkiye Cumhuriyeti, r. 77.
- (10) Yê ku ji TBMM GCZ-IV ya 16ê adarê 1923an, r. 163 neqıl dîke: Kovara Saçak, nîsan 1987, hejmar 39, r. 20.
- (11) Jî bo dirêjaya vê behsê binere: Kovara 2000'ê Doğru, 30-ê tebaxa 1987, hejmar 30, r. 9- 13.
- (12) Ji protokola (zabîta) hejmara 21-an ya rûniştina 23-ê çeleya paşîn ya 1923-an ya Konferansa Lozanê. Ev protokol, bi navê Lozan Konferans'ında Kurdistan Sorunu, ji aliyê "Kurt Halk Kültür Derneği" (Komeleya Kurdî ya Kultura Gel) di sala 1981-ê de weke broşûreke hatiye weşandin.
- (13) Lozan Konferans'ında Kürdistan Sorunu, r.62.
- (14) Milletler Cemiyetî belgelerinden Musul Kerkuk Sorunu ve Kürdistanın Paylaşımı, Med yayınları, Stenbol, îlon 1991, r.241
- (15) Jî bo vê pirsê binere: Rojnameye Cumhuriyetê, 25 hezîran 1990.

Ji bo rastnivîsîna Zazakî destpêkeke hêja

Osman Aytar

Di 2-4'ê tebaxa 1996'an de li nêzê Stockholmê, bi beşdarbûna panzdeh kesan li ser rastnivîsîna Zazakî (Kirdkî, dimilkî, kirmanckî) civînek hat çêkirin. Ji gelek herêmên ku li wan deran Zazakî jî tê peyivandin, kesên ku bi vê pirsê alaqeder in beşdarê civînê bûn.

Di rûniştinê civînê de munaqeseyên berhemdar li ser hin pirs û pirsgerêkên Zazakiyê çêbûn, ji bo xebatên pêşerojê biryar hatin sitendin û wezîfe hatin dabeşkirin. Yek ji van biryaran ev e ku li gor îmkanan wê bê xwestin ku bi kêmasî salê carekê civîneke weha pêk bê.

Li ser encamên civînê jî protokolek bi zazakî hat amadekirin û ev ji raya giştî re hat belavkirin^(*). Ev, bi serê xwe destketineke hêja ye û ger pêwistiyên wê bîn bicihanîn dê ev gav di pratîkê de bi xwe re hin encamên din ên baş jî bîne.

Ya din, di derbarê çareserkirina pirsan de riya ku hatiye qebûlkirin, riyeke maqûl e. Derxistina holê ya hemû devokan û di pêvajoyeke tebîî de bikaranîna versiyona herî giştî, ji bo berhemdariya xebatên weha helwesteke baş e. Nêrînen ku parastvaniya tercîhekê û bi biryaran ji holê rakirina versiyonên din dîkin, li gor baweriya min, ji çareserkirina pirsên zimên dûr in.

Di gel nêzîkkirina devokên Zazakî û li ser vê bingehê zelalkirina wekhevî û cudabûnên di navbera Zazakî û lehçeyên din ên Kurdî, civînên weha dê bikaribin rastiya hin munaqesê û spekulasyonên bêbingeh ku li ser zazakî tên kirin jî derxînin holê. Bi rastî jî di vî warî de valahiyeke balkêş hebû.

(*) Protokola ku sernivîsa wê "Derheqê rastnuştina kirdkî (kirmanckî) de kombiyayîşê Stockholmê" ye, di vê hejmarê Çirayê de tê weşandin.

Wek tê zanîn di van salên dawiyê de her çend di çapemeniya Kurdî de bi nivîsandî zêde cih negirtibe jî, bi gelek awayan li ser pîrs û pîrsgirêkên Zazakî her ku diçû munaqêşe zêde dibûn. Hin cudabûnên di navbera Zazakî û Kurmanciyê jî ji aliyê hin kesan dihatin îstismarkirin û bi îddiayên subjektîf cûdabûna Zazakî û li ser vê bingehe bi serê xwe miletbûna Zazayan dihat îddîakirin. Hin kovar û kitêb jî ji aliyê van kesan dihatin weşandin.

Erê, wexta mirov li van îddîayan dinêre, ji gelek aliyên bê bingehbûna vana li ber çavan e. Herweha dewleta Tirk jî bi armanceke qirêjê ve pîrsê tev dide û dixwaze ku vê riyê jî ji bo perçebûna miletê Kurd bikar bîne. Lê ev nayê wê maneyê ku yên ku cûdabûna Zazayan dixwazin hemû "girêdayî" ne, yan jî divê şika mirov li ser wan hebe. Li gor baweriyên min, yên ku ji nezanî yan jî bi sebebeke din xwediyê van îddîayan in jî hene. Ev munaqêşeyê din e.

Nuha ji bo me Kurdan, di warê Zazakî de yê ku pîr girîng û bendeyê mudaxalekirineke giştî ye, pîrs û pîrsgirêkên Zazakî yên heyî ne. Di vî warî de herçend heta nuha bi hin xebatên şexsî û hesasbûna hin rêxistinên Kurdistanê gelek tişt hatibin kirin jî, ev ji bo nêzîkkirina devokên Zazakî û têkiliyên wan ên bi lehçeyên Kurdî yên din ne bes in.

Ji bo vê jî berê ku li Stockholmê civîn çêbe, pêwîstiya civînên weha her ku diçû hîn êşkere dihat rojevê. Yên ku Zazakî dinivîsandin û li ser pîrsên wê gelek hesas bûn, gelek caran di nav xwe de pêwîstiya xebateke hevbeş danîn zimên.

Civîna Stockholmê ji ber vê yekê him destpêkeke nû ye û him hêviyeke nû ye. Li ser alfabayê, nivîsîna tarîxan, kurtnivîsînê, navan (yên rojan, mewsîman, qitayan, bajar û mensûbên wan, ziman û lehçeyan, dîn û mezheban, millet û mensûbên wan, kesên xerîban, kitêb û nivîskaran), fîlan (menfî û yekbûyî jî tê de), sufîks û prefîksan, prepozîsyon û postpozîsyonan û jimaran, tespîtkirina nivîsîna hevbeş û biryardana bikaranîna wan, bawer dikim wê hin problemên rastnivîsîna Zazakî ji holê rakin.

Ger îmkan bê peyda kirin û civînên din ên ku pêwîst in bînin çêkin, bêşik dê gelek problemên din ku nuha hene, çareser bibin yan jî qet nebe kêmbin. Ji bo vê jî berdewamiya civînan girîng e.

Çunkî baş tê zanîn ku pîrs û pîrsgirêkên Zazakî, taybetî jî ji yên Kurmancî û Soraniyê zêdetir in. Sebebên vê yekê pîr in û ev jî bi gelek aliyên xwe ve xebatên bi dûzan û sewiyê ferz dikin. Li gor baweriyên min pîrsa bingehe ev bû û ev e.

Di vî warî de wezîfe û berpirsiyarî pîr in. Ew meyla ku di derbarê Zazakî de di nav hin Kurdên ku Kurmancî (taybetî yên li Kurdistanê Bakur) dipeyivin heye, divê bê rexnekirin. Wek tê zanîn, ji nezaniya di derbarê Zazakî an jî cîddî negirtina pîrsên Zazakî (ku pîrî caran ev jî dikare ji nezaniyê were), dibe sebebê ku hin reaksiyonên ne di cî de bînin ortê. Carnan henek, nîvhenek an jî cîddî, lê êşkere ye ku di vî warî de pîrseke girîng heye ku divê bê çareser kirin.

Divê baş bê zanîn ku pirs ne tenê pirs a yê ku Zazakî dipeyivin e, ya hemû Kurdan e.

Rêxistinên siyasî, civakî, kulturî û yê din ên Kurdan ku heta nuha li ser pirsê hasas bûne divê vê hasasîyetê bi xebatên pêwîst ên din bidomînin û yê ku bi giranî lakayt mane jî divê êdî wezîfe û berpirsiyariyên xwe yê pêwîst bînin çih. Gerçî mirov nikare bi temamî li ser wan ferz bike, lê kovar û rojnameyên Kurdan jî dikarin encamên ku ji civînên weha derdikevin, di weşandina nivîsên Zazakî de li ber çavan bigrin. Hejayê pesindayînê ye ku, mîsalen di piraniya kovar û rojnameyên ku ji aliyê Kurdan tînin derxistin de weşandina protokola civîna Stockholmê helwesteke baş bû. Helwestên weha çiqas zêde bin, dê hewqas têkiliyên lehçeyên Kurdî baş zelal bin û wê xizmeta nêzîkbûna tebî ya devok û lehçeyan jî bike.

Siyaseta bi zimanê Tirkî (*)

Salım Çeliker

Çendekî berê hevalekî min'ê zaroktîyê, ku li dor panzdeh salan e me hevdu nedîtibû, bi mêvandarî hate Stockholmê. Ji bo bixêrhatinê min ew zîyaret kir. Bi hesreta panzdeh salên çûyîn em ketin nav sohbetake kûr û dûr. Wî ji min dîpîrsî û mîn jî ji wî. Giranîya sohbeta me, hevalên mişterek, Silîva û gundên Silîva bû. Sohbeta me, tevi ku car caranan Tirkî diket navê jî, lê bi Kurdî bû. Di pêşveçuyîna sohbetê de, em ji Silîva derbasî Diyarbekirê bûn û mewzîya sohbetê jî, bi giranî, qelibî ser rewşa sîyasî. Hevalê min'ê delal, daxwaz kir ku em ji nuha û pê va bi Tirkî sohbeta xwe bidomînin. Ew, ji çewtfêmkirin û kêmfadekirinê ditirsîya, ji ber ku sîyaset pîrr "grîng" bû. Israra min feyde nekir. Sohbetê geh bi Kurdî geh bi Tirkî dom kir û me dawî li şevbihêrka xwe anî.

Ez hê jî li ser vê yekê difikirim, gelo ev yek ji çi tê? Ev heval jî li Silîva mezin bûbû û wek her kesî, ji bilî karê xwe yê bi dewletê re, di jîyana xwe ya rojane da, bi Kurdî xeber dida. Ev heval, ji kevn de welatparêzekî Kurd e. Nuha jî alîgirê wê hereketa ku wek "Tevgera azadîyê" tê binavkirinê ye. Gelo ku ev heval di xeta xwe ya sîyasî ya kevn de bimaya, ew dê di warê ziman da pêşketî bû ya? Na, ez ne bawer im. Rast e, di nava rêxistinên Kurdan de, ya ku herî zêde Tirkî bi kar tîne û car carna jî bi wasita serokê xwe pesnê Tirkî jî dide, ev tevger e. Ji ber ku ew, hereketa rizgarîxwaz bi giranî temsîl dikin, loma jî tahrîbata ku zimanê Tirkî bi rêya wan bi xwe ra tîne, hîn zêdetir e. Lê kêmfadê, hemû rêxistinên Kurdan, bi tayîbetî yên çep, di vî warî da roleke xerab leyîstine. Wan bi rêya belavkirina ideolojî û daxwazên xwe yên sîyasî,

(*) Di orîjînalê wê nivîsê de herfên "ı" û "i" hatibûn bikaranîn-Çira

tahrîbatên asîmilasyonê yên li ser milletê Kurd zêdetir kirine.

Bala xwe bidinê: "Ji % 98`ê rojname û kovarên me bi Tirkî derdikevin. Kitêbên ku li ser Kurdan in an jî Kurdan bi xwe nivîsandîne % 90`ê wan bi Tirkî ne"⁽¹⁾. "Di gel ku yên di hundur de ji elîtekî pêk tîn jî, rewşa wan ya xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî ne ji ya hemwelatîyên me yên li derve bi ferq e. Ger ez di reqeman de şaşîyan nekim, ez ne şaş bim ji nav me sed û pêncî girtîyan ancax duzîneyek- duzîne û nîvek bêyî problemên mezin dîkanîbûn Kurdî bixwînin. Herçî nivîsandina bi Kurdî ye, ne bi qasî tiliyên destekî ne jî"⁽²⁾. Ji bo doza millet bi mêrxasî şer dikin, bi deh salan di girtîxanan da ezîyetê dikşînin, lê hewl nadin xwe da ku hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bibin.

Gelek sebebên ku li vê netîcê tesîr dikin, hene. Bi ya min, mirov kare vana, bi xetên giştî, bi du awaya bi nav bike: Sebebên objektîv û yên subjektîv.

Sebebên objektîv encamê sîyaseta neyar e

Sebebên objektîv ew sebeb in ku li dervayê îrada me hebûna xwe didomînin û em nikarin di binê van şertan de, wan ji holê rakin. Li hember milletê Kurd sîyaseta dewleta Tirk û entegrasyona aborî û civakî, nimûnê bingehîn ên sebebên objektîv in. Hîmên vê sîyaseta ji bo tunekirina ziman û çanda Kurdî hê di despêka damezrandina dewleta Tirk da hatine danîn. Tirk zû bi ehemîyet û grîngîya ziman, ku di xwenasîna milî da roleke gelek mezin dileyîze, hisiyabûn. Di salên 1930`yî da, li ser sedemên bingehîn yên ku netewên Balkanî ji dewleta Osmanî veqetandine, Mistefa Kemal bi kurtî weha dibêje: "Ewan di şerên xwe yên netewî de, mueseseyên netewî damezirandin, li ziman û çandên xwe xwedî derketin. Vê yekê agirê xwenasîya (şûûra) netewî di nav wan da gurr û geş kir"⁽³⁾. Loma jî dewleta Tirk sîstemeke wisa ava kiriye ku hînbuna zimanê Tirkî û stendina kultura Tirk buye pêşşertekî çîhgirtinê di jîyana civakî û aborî de; dewletê Kurd mecbur kirine ku di vî warî de rojekê zûtir perwerde bibin û bibin Tirk.

Wek encameke vê sîyasetê, telkîn û êrîşên îdeolojîkî yên bi salan, li ber çavên Kurdan, ziman û çanda wan reş kirîye. Gelek çaran ew bi xwe hewl didin ku fêrî Tirkî bibin û bi zarokên xwe jî bidin fêrkirin. Ev tahrîbat, bi giranî li ser wê xeta cografîk, ku Kurdîstanê û Tirkîyê dighîne hev, xwe nîşan dide. Her çend sîyaseta dewletê, pêşveçûyîna kapîtalîzmê û entegrasyona aborî bûye bingeh ji bo vê yekê jî, bi ya min, tenê bi vana îzahkirina vê rewşê, him kême û him jî çewt e. Têkilîyên kapîtalîstî, li gor Dersimê û Erzîncanê, li Silîva û li Kiziltepe hê pêşvetir in, lê tevgera azadîxwaz li van herdû bajarên dawîn berfirehtir e. Gelo em`ê vê yekê bi çi îzah bikin? Ev rewş, pêwîst e ji alî civakzanan ve bê îzahkirin, da ku rê li ber tesîrên wan dîtinên ku neyartîya pêşveçûyîna teknîkî dikin, bê girtin.

Ez bi vê yekê dixwazim derbasî sebebên subjektîv, ku malxerabîya me

zêdetir bi wan ve girêda ye, bibim.

Sebebên subjektîv encamên sîyaseta me ye

Sebebên subjektîv ên ku li têkçûyîna zimanê Kurdî tesîr dikin, ew sebeb in ku me bi nezanî ya jî bi ehmiyetnedayîne, bi xwe çêkirin e. Ev yek, berhemê xebata ku bi navê welatparêzîyê tê kirin e. Loma jî xebata îdeolojîkî û sîyasî ya bi Tirkî, bi destê me, bûye aletê qetilkirina zimanê Kurdî; em bi van kirinên xwe, ji pêvajoya asîmîlekirina Milletê Kurd re xizmetê dikin.

Herwekî gelek jî me muşahade kirine, ew kesên di vî warî de bikaranîna Tirkî diparêzin, xwe dispêrin realitê; neyar em asîmîle kirine, mesajên me yên sîyasî bi rêya Tirkî karin bigihên gel (!).

Xişîmno! Ma ew mesajên we yên sîyasî ne ji bo damezirandina civateke Kurd li ser axa Kurdistanê ye? Bê ziman civatek Kurd çewa tê fikrandin? Li alî din, wek sîyasetdar, wezîfa yekem midaxelekirina realitê ye, rêlibergirtina tahrîbatên neyar e. Rast e, di despêkê de ewê zehmetî bê kişandin. Lê divê neyê ji bîrkirin ku pêvajoya guhartinê tim di nuxtakê de dest pê dike. Ev yek divê îro were kirin. Ji bilî hinek tiştên ku xîtabî Tirkan jî dikin, pêwîst e îfadekirina hemû çalekiyên me bi zimanê Kurdî be. Bifikirin ku Ahmedê Xanî jî wek we teslîmê realitê bibuya û Mem û Zîn bi Farisî, an bi Erebi binivsanda! Zimanên ku wê demê li rewacê bûn, Erebi û Farisî bûn.

Kurd bi zimanê xwe hene

Bi mana xwe ya giştî ziman, hacetê komunîkasîonê û xwe îfadekirinê ye; ji ber vê yekê ziman, xwedî karakterekî civakî ye. Ji bo Kurdan ziman, her weha xwedî mîsyonekî sîyasî ye jî. Ev yek, ji ew cendera asîmîlasyonê û tahlûka qirbûyîna fizîkî ya Milletê Kurd tê. Di gel cudayîyên tarîxî, îro li cihanê sê tiştên serekeyî hene ku milletan ji hev cihê dikin: Reng, dîn û ziman. Li cîkî wek Afrîqayê tiştê ku dakirkeran û Afrîqayîyan ji hev cuda dikir, rengên wan bû; li Bosnayê ev tişt dîne wan e. Lê belê, bifikirin ku gava reng û dîne meriv û yê dagirkeran wek hev bin, û bi ser da jî dagirker cîranê meriv bin û ya herî xerab, bixwazin meriv bihelînin an wek fizîkî ji ortê rakin, tenê ziman e ku tiştê meriv û wan ji hev cûda dike û hebûna meriv sembolîze dike. Di rewşeke weha da, ger tu zimanê xwe wenda bikî, tu wek millet ji wenda dibî. Dewleta Tirk, ew gel û eqalîyetên ku bi reng û dînen xwe ji Tirkan ne cihê bûn, wek aşê agir ew hêran. Sedemê bingehîn yê wendabûna wan, têkçûna zimanê wan e.

Di şertên Kurdîstana Bakûr de ger ku ev rewş bi vî awayî dewam bike û zimanê Kurdî ji ortê rabe, hemû sebebên daxwaz û çalekiyên netewî jî ji holê radibin. Li ser wê cografya ku demekê bi navê "Kurdistanê" dihat bi navkirin, hinek însanên ku bi rengê xwe û bi dîne xwe wek Tirkan in, dimînin! Tiştê ku

hate serê Laz û Çerkezan nimûnê balkêş in, dewleta Tirk di vî warî de gelek mahir e. Divê em li vir çen gotinên manekûr yên Dr. Kamiran Bedirxan bibîr bînin û wana tu carî ji bîr nekin: "Milletekî dîl ko zimanê xwe winda ne kiriye, wek girtîyekî ko miфта zîndana xwe bi xwe re hilanîye." (4). Lê gava ev mifte ji dest çû, ew dê heta hetayê dîl bimîne.

Neticeyeke bi vî awayî, şertên hebûna partîyên sîyasî yên Kurdan û daxwazên wan yên stratejîkî ji holê radike. Li gor înteresên nûh, ewê sîyaset bi şiklekî dinê rû bide. Loma jî pêwist e ku hemû rêxistinên sîyasî û kesên famkirî yên Kurd jîyandina zimanê Kurdî ji bo xwe wezîfeyeke sereke yê sîyasî bihesibînin.

Ev yek, şêl û programeke xebatê ya tayîbetî divê. Di vî warî de şêla tayîbetî ev yek e ku, naveroka wan ya sîyasî û îdeolojîkî çî dibe bila bibe, wek sîyasetdarekî Kurd, parastina hemû weşanên bi zimanê Kurdî ye. Ev weşan çî ji alî Kurdan ve û çî jî ji alî dewletê ve têne kirin, bi tesîra xwe ya objektîvî, zimanê Kurdî û herweha Miletê Kurd vedijînin. Programeke xebatê ya tayîbetî jî, bi şertê li ser cografya xwe ya sîyasî, çalakîyên ji bo bi destxistina heqê nasname (kîmlîk) û ziman e; vê yekê, wek daxwaza herî sereke ya aktuel dîtî e. Her çiqas programeke xebatê ya ber bi çav, ji alî rêxistinên sîyasî ve nehatibe pêşkêşkirin jî, di vî warî de MED-TV'ê û rojnama ARMANC, ROJA NÛ û WELAT nimûnên gelek qenc in. Li Dîyarbekirê CAN-TV û weşanên mehêlî yên din jî, bi weşanên xwe yên Kurdî xîzmeteke giranbiha li dijî asîmîasyonê dikin. Van weşanan ewê di pêvajoya gavavêtina dewletê ya di vî warî de, bi lez bixin. Wek nimûne, gava wezîrê hukumetê Şewket Kazan, bi wesîla minaqeşên vê dawîyê yên di derheqê ziman û mafên çandî ji bo Kurdan de, şêla partîya xwe dîyar dikir û pêwistî bi rojê çend seet bi zimanê Kurdî weşana televîzyonê didît, atfê televîzyona MED'ê dikir û digot: "Me qedexa kir çî bû? Waye ew bi xwe bi Kurdî weşanê dikin."

Eşkere ye ku pêşvebirin û di her warê jîyanê de bikaranîna zimanê Kurdî li Kurdistanê hinek guhartinên bingehîn divê; civatek Kurd ku li ser sazîyên modern avabûyî divê; berî her tiştî, di mektebên dewleta "ji nûve avabûyî" de nifşekî nûh ku bi Kurdî perwerdekirî divê. Ev yek, pevajokeye ku gav bî gav dikemil e. Wek rêxistinên sîyasî û wek kesên famkirî divê em weşanên xwe bi zimanê Kurdî bikin û bi vî zimanî xeber bidin da pêvajoya guhartinê bi lez û beztir be.

(1) Mahmud Lewendî, Roj, hejmar 26, 3-9 Tebaxê 1996, Istanbul

(2) Cemîl Gundogan, Nûdem, hejmar 12, 1996, Stockholm

(3) Yê ku neqil dîke: İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kurdistan, r 26, 1996

(4) Dr. Kamîran Alî Bedirxan, Hawar hejmar 3, r 1-2, 1932

Di Kurdî de guherîna dengên "R" û "L"

Malmîsanij

Di zimanan de deng tînan guhertin û dengê piştî demekê, yan jî li derekî din dibê dengê din. Kesê ku baş li serê nefikirîbe yan jî zanîna wî/wê ya zimanê kêmbê, gelek caran êdî nizane ku ev deng her ew e, yan jî ew deng her ev e. Di Kurdî de jî gelek caran deng hatine û tînan guhertin. Di vê nivîsê de ez tenê li ser guherîna R-L disekinim.

Piştî ku ez li ser fikirîm û min dan ber hev, min fêmkir ku ev "R" yan jî "L" ya ku hin kes jê re "qalîn", "stûr" yan jî "qelew" dibêjin, gelek caran ciyê xwe diguherînin. Em bêjin di Kirdkî (Zazakî) de ji "dil" re "zer"/"zerî" tê gotin. Lê "R" ya kelîmeya "zer" an jî "zerî", "R" yek "anormal" e û baştir e ku bi du "R" yan bê nivîsîn; wek "zerr" û "zerri". (Min di vê nivîsê de kelîmeyên wisa bi du "R" yan nivîsîn.) Ji aliyê din, di Kurdîya Başûr de "dil" bi "L" yek qelew tê gotin. Guherînen wisa, him di her lehçeyê Kurdî bi xwe de him jî di navbeyna lehçeyên cihê-cihê de hene û gelek in. Lê ez di vê nivîsê de, hinekan ji wan -carna tevî varyantên cihê cihê- didim ber hev da ku ev guherîn baştir bê fêmkirin. Ez bînim bîra xwendevanan ku di Avestayê de û Farisîya Kevn de herfa "L" tunebû ⁽¹⁾.

"R" û "L" di nav zimanên cihê-cihê de jî tînan guhertin. Em bêjin "ronahî"/"ronakî" ya Kurmancîya Bakur, yanî "roşn"/"roşt" û "roşna" ya Kirdkî di hin zimanan de wisa ye:

- bi Hindîya Kevn "roçis"
- bi zimanê Avesta "reoxşne"
- bi Pehlevî "roşn"
- bi Ermenî "lois"

bi Latini "lux"
bi Swêdî "ljus".

I)Di Kirdkî û Kurmanciya Bakur de

a)Guherîna "R" û "L"

Kirdkî

bol
elbisim, helbisim, îbrişim

gerre
gil/qil
giştiri, engiştiri, ingiştiri
labrê, labelê
lawayêne/lawayîş
lûwî, luwî, luy, lûye, lû
nequrr
riperr
lojini, lujini, locine, lozene
reyra/reydi
roqla, roqila, loqera, loqra,
loqela, loqla
serr/serre
sorr/şorr, solin
teli/telu
zerr/zerrî

Kurmanciya Bakur

pirr
hevrîşim, herwîşim, hevrûşim,
hevrûmiş, ewrîşim
gilî
gir
gustîlk, hinglisk
lêbelê
riyîn
rûvî, rovî, rêvî, rwîvî
nikul
rûpel, rûper
rojîn, rojîng, lojin
ligel/digel
rîvî, rovî

sal
şorr
dirî, strî
dil

b)Guherîna "ra"/"rê"/"era"/"ero"ya Kirdkî û "li"ya Kurmancî

Kirdkî

ra⁽²⁾
Ku ra?
weyra
ra xo ver mekuye⁽³⁾
Ti ra merdena xo ver mekuye⁽⁴⁾.
Heywanî ko ra çerenî.
Sîlleyêk/sîlleyke 'Elî ra visti.

Kurmanciya Bakur

li
Li ku?
li wê, wêrê
li ber xwe mekeve
Tu li ber mirina xwe mekeve
Heywan li çiyê diçêrin.
Sîllekî li 'Elî xist.

era ⁽⁵⁾	li
era dime kotene	li dû ketin
era xo ver mekuye ⁽⁶⁾	li ber xwe mekeve.
rey ra	li gel

rê ⁽⁷⁾	li
hurê ardenene/werey ardiş	li hev anîn
hurê ameyîne/werey ameyîş	li hev hatin

ro ⁽⁸⁾	li
Qolê Demeno dorme ro Silêmanê	Qolê Demenan dor li Silêmanê
mi birrno ⁽⁹⁾ .	min girtiye.
Da mi ro.	Li min da./Li min xist.
Selaman ro lazê mi ke.	Silavan li lawê min ke.

ero ⁽¹⁰⁾	li
ero ci cêrayene/bere geyrayîş	li wî gerîn

Wekî ku ji nimûneyên jorîn jî xûya dibe, ciyê "ra"/"rê"/"era"/"ero"ya Kirdkî û "li"ya Kurmanciya Bakur carna ne wek hev e. Em bêjin gava ku meriv -bi Kirdkî- dibêje "Ku ra?", kelîmeya "ra" piştî kelîmeya "ku" tê, lê -bi Kurmanciya Bakur- meriv nabêje "Ku li?", meriv dibêje "Li ku?"; yanî "li" tê pêşîya "ku". Ev cihêtiya rêzbûn a kelîmeyan di navbeyna Kirdkî û Kurmanciya Başûr de jî heye.

c)Guherîna "bere"/"piro"/"peri" ya Kirdkî û "lê"ya Kurmanciya Bakur

<u>Kirdkî</u>	<u>Kurmanciya Bakur</u>
piro dayene	lê dan
piro de	lê de
bere ardiş	lê anîn
bere hameyîş	lê hatin

II)Di Kirdkî û Kurmanciya Başûr (Sorani) de

a)Guherîna "R" û "L"

<u>Kirdkî</u>	<u>Kurmanciya Başûr</u>
cil û belg	cil û berg
emserr (emsarr)	emsal

ewra
gerre
lero/lêro/leyro
locine, lûcini, lojini, lujini, lozine
lûwî, luwî, lûye, lû
reyra
mi rey kewt
roqla, roqila, loqera, loqela

serr
zerr-i

ewla ⁽¹¹⁾
gileyî
role
roçin, kilaw rojne, kuna roçke
rêwî ⁽¹²⁾, riwî ⁽¹³⁾
legel, regel
regelim ⁽¹⁴⁾ kewt
rîxole ⁽¹⁵⁾, rêxelû ⁽¹⁶⁾,
rêlexo ⁽¹⁷⁾, lwêxerrû ⁽¹⁸⁾
sal
dill

b) Guherîna "ra"ya Kirdkî û "le"ya Kurmancîya Başûr

Kirdkî

ra
derdan ra
hewn ra werzênê
yê to ra
xwi vîr ra nêkerd/xwi vîr [r]a
nêkerd
yînî ra di kesî
Diyarbekir ra
ko ra

Ku ra?
weyra
teber ra/teber [r]a

Kurmanciya Başûr

le
le derdan
le xew helsîn ⁽¹⁹⁾
le ⁽²⁰⁾ hî to
le bîr nekird

le wane du kes
le Diyarbekir
le kêw

Le kwê?
le wê
le derewe

c) Guherîna "R" û "L" di nava Kurdmanciya Başûr bi xwe de

Herwekî min di destpêkê de nivîsîbû, di nava lehçeyekê bi xwe de jî "R" û "L" diguherin. Kelîmeyên jêrîn -ku beşekî wan ji du tekstên folklorîk ⁽²¹⁾ hatiye bijartin- nimûneyên Kurmanciya Başûr in.

Kurmanciya Başûr

berkî
birind
denarî

Kurmanciya Başûr

belkû
bilind
denalî

dir	dil
dûker	dûkel
her bû	hel bû
marwêran	malwêran
xarî	xalî
xor	xol

III)Di Kirdkî û Hewramî/Goranî de guherîna "R" û "L"

<u>Kirdkî</u>	<u>Hewramî/Goranî</u>
hesri	helsî
imsarr/emserr	îmsal
lero/lêro/leyro	role/rûle ⁽²²⁾
locine, locini, lozene	roçin, roçine
mere/merre	mile
mirîçike, miliçik	melûçik
nîre	nêle
verê	welê
verîn, verên	welîn
ver kewtene/ver kewiş	wel kewtey
wari, ware	wali, walê
gêrayîş/geyrayîş/cêrayêne	gêlay ⁽²³⁾
roqla, loqla, loqela, loqla	ruxle ⁽²⁴⁾ , rolexway ⁽²⁵⁾

IV)Guherîna "R" û "L" di nava Kirdkî bi xwe de

<u>Kirdkî</u>	<u>Kirdkî</u>
adir	adil
adirca, adirgan	adilgan, adilkan
çira	çila
dorim	dolim
dormare	dormale
elbisim, helbisim	îbrîşim
fîrar	fîlar
fotêri	fotêli
girangi	gilangi
girze	gilze
kendir	kendîl
kuçeran	kuçelan, kuçlan
labrê	labelê

mirîçike	miliçike/milçiki
pardim	paldim
per/perr	pel
perçîn	pelçîn
perperik	pelpelik, pilpilok
qerebalix	qelebalix
rêm	lêm
roqla, roqila, loqra	loqila, loqla
solin	sorr, şorr, sorrin, şorrin
şîrgerm	şîlgerm

-
- (1)Por Davod, Ferhengê Îranê Bastan, Tehran, 1326, r. 305
(2)Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1992, r. 87, 89, 93, 94, 97, 109
(3)Mustafa Duzgün, Dersım Türkuleri/Tayê Lawikê Dêrsimî, Berhem Yayınları, Ankara, 1992, r. 212
(4)Mûnzûr Çem, Tayê Kilamê Dêrsimî, Stockholm, 1993, r. 142
(5)Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, r. 89, 93, 94, 304
(6)Mustafa Duzgun, Dersim Türkuleri/Tayê Lawikê Dêrsimî, r. 173
(7)Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, r. 87
(8)Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, r. 10, 89, 93, 107, 109, 278, 288, 290
(9)Mûnzûr Çem, Tayê Kilamê Dêrsimî, Stockholm, 1993, r. 68
(10)Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, r. 95, 213, 290, 304
(11)Kerîmî Husamî, Le Bîreweriyekanim, Stockholm, 1987, c. 2
(12)Taufiq Wahby & C. J. Edmonds, A Kurdish Dictionary
(13)Dr. Mihemedî Teqî İbrahîmpûr, Vajenameyê Farsî-Kordî (Senendecî-Ewramî-Kordiyê Şîmal)
(14)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, Silêmanî, c. 3, 1976, , r. 247
(15)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, Silêmanî, c. 1, 1960, r. 2, 208
(16)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, c. 1, r. 2, 204
(17)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, c. 1, r. 2, 206, 388
(18)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, c. 3, r. 247
(19)Helbestên Şoreşgerî Li Kurdistanê Iraq, Komela Xwendevanên Pêşverûyên Kurdistanê Lî Swêd, Stockholm (?), 1981, r. 16
(20)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, c. 3, r. 247
(21)Newzad 'Elî Ehmed, "Hebîb Axa", Karwan, Hewlêr, no: 35, (abî 1985), r. 80-84
(22)D. N. Mackenzie, r. 119
(23)D. N. Mackenzie, r. 95
(24)Dr. Mihemedî Teqî İbrahîmpûr, r. 388
(25)Şêx Mihemedî Xal, Ferhengî Xal, c. 1, r. 2, r. 185

Nêçîra Çiyayê Evdal Begê (*)

Berhevkar:
Şefîk Kaya

Bavê Bedirxan Begê, kurê Mîrê Bohtan kete ber mirinê, gazî kurê xwe kir û wesyetên xwe lê kir, got: "Kurê min, ez dê wesiyetekê li te bikim; lê divê tu, vê wesiyeta min tu carî ji bîr nekî!". Kurê wî got: "Xêr e bavo?". Bavê wî got: "Kurê min, divê tu, tu carî neçî nêçîra Çiyayê Evdal Begê!".

Piştî çendeyekî bavê wî çû ser heqîya xwe. Salek ji ser mirina bavê wî re derbas bû. Sal, qulibî salê. Ew salek bû, ku ew ji mal derneketibû. Mîr rojekê gazî wezîrên xwe kir, got: "Gelî wezîran, ka ciyekî ref û nêçîrê bibêjin da em herinê. Ev salek e, em tev di malê de aciz bûne".

Du wezîrên bavê wî gotin: "Mîrê min, heke tu yê ref û nêçîrê bî, nêçîr ji nêçîra Çiyayê Evdal Begê pêştir heram e!".

Mîr bi vê bersîva wezîrên xwe gelek aciz bû. Di dilê xwe de got: "Yeqîn ev wezîr ji bavê min aciz in,", gazî celladên xwe kir û serên wan da jêkirin!

Mîr gelek aciz bû, ji xwe re got: "Çavên van lê ye ku ez wesiyeta bavê xwe bişikînim". Di şûna wan de, ji xwe re du wezîrên din girt. Sala duduyan hat, careke din mîr, bangî wezîrên xwe kir, got: "Em di mal de aciz bûne, ciyekî ref û nêçîrê bibînin da em herinê!". Du wezîran dîsan lê vegerandin, gotin: "Mîrê min, heke tu herî nêçîrê, nêçîr ji nêçîra Çiyayê Evdal Begê pêştir heram e!".

Mîr rabû gazî celladên xwe kir, serên herdu wezîrên xwe da jêkirin! Ew bûbû sala sisêyan ku bavê wî çûbû ser heqîya xwe. Gazî du wezîrên din kir, got: "Em di mal da aciz bûne; ka em herin nêçîrê".

Wan wezîran ji mîna wezîrên berê gotin: "Mîrê min, heke hûn yê ref û nêçîrê ne, nêçîr ji nêçîra Çiyayê Evdal Begê pêştir heram e!".

Mîr ji wan ji aciz bû, ferman da cellatan, cellatan serên wan herdu wezîran ji firandin. Ev wezîr tev bi vî awayî hatin kuştin. Sala çaran mîr du wezîrên din ji xwe re rakir. Ji wan jî pirsî. Wan jî mîna yên din bersîv dan.

Bedirxan Beg fikirî, got: "Ma ev yek, du, sê, çar... Ma ev tev ji bavê min aciz

bûn ? Ev tişteki di vî îşî de heye”. Dibê: ”belkî bavê min ji min aciz be, nexwestibe ku ez Çiyayê Evdal Begê bibînim”.

Rabû biryar girt ku wezîrên xwe nede kuştin û here Çiyayê Evdal Begê nêçîrê.

Êvarê zû delêlî ket nava bajêr, gazî kir, got: ”Hayhêê... sibê, Bedirxan Beg diçe nêçîra Çiyayê Evdal Begê! Yê ku dixwazin pê re herin, bila karê xwe bikin!”.

Serê sibê, gava Bedirxan Beg rabû, bala xwe dayê ku va sed siwar li ber dergeh, li benda wî ne. Wey li wî ku nav di xwe bide, bêje: ”Ez filankesê kurê filankes im!”.

Mîr kete pêşî û çend siwaran jî weke qelawiz dane pêşiya Mîr û berê xwe dane çiyê. Di nivê serê çiyê de kaniyek ava sar hebû; li temamê dora wê nefel û inteko şîn hatibû. Çaralî mêrg û çîman bûn. Ciyekî pîr xweş bû. Bîna meriv lê derdiket. Siwar, ji hespên xwe peya bûn, xwarina xwe derxistin, danîn ber xwe... Hespên xwe av dan. Bala xwe danê, xortekî hilkişiyayî, zirav ji wir da hat, pirsî, got: ”Xwedêkî, kî ji we Badirxan Beg e ?”. Bedirxan Beg berî hemiyan got: ”Ez im, bêje xortê delal!”. Xort, rahişt destê Bedirxan Beg û ji nava wan sed siwaran derxist, kişand bir! Piştî ku wî xortî Bedirxan Beg bi dûr xist, bir di çiyê de qulibîn. Wan siwaran hê nav di xwe dan, ji hev ra gotin: ”Wey, ev çawan bû, xortekî bi tenê were, bi destê kurê Mîrê Bohtan bigire û ji nava me bikişîne, bibe û em bê deng bimînin? Me tu deng lê nekir, me çi pîsîtiyekê kir ?”.

Rabûn li wan derdorên, li pey şopa Bedirxan Beg ketin. Kirin ne kirin tu şopê dernexistin, li wan çiyên pîr man. Lê piştî ji dîtina wî bêhêvî bûn, tev vegeyriyan, hatine bajêr.

Wî xortî jî destê Bedirxan Beg berneda. Xort, ew di nava çiyê de bir, bir ber mixareyekê. Xwe berdane nava mixarê, çi bibînin! Dêwekî reş rûniştî ye. Dêw ji wî xortî pirsî, got:

-Ev çi kes e?

Xort got: ”

-Ev Bedirxan Begê Bohtî ye.

Dêw, ji Bedirxan Beg pirsî, got:

-Ma tu yî Bedirxan Beg?

Bedirxan Beg got.

-Belê, ez im.

Dêw got:

-Ma tu ev piçê ha yî, vî hukmî dikî?

Bedirxan Beg dîsan got:

-Belê ez im.

Dêwê Reş du-sê awirên tûj di Bedirxan vedan û ji xort re got:

-De wî bibe vê mezela han, heta sibê.

Wî xortî ew bire wê mezêlê, heta sibê li wir ma. Sibê zû dîsan bi destê wî girt, anî miqabilî Dêwê reş. Dêwê Reş dîsan ji Bedirxan Begê pirsî, got:

-Ma tu yî Bedirxan Begê?

Bedirxan Beg dîsan got:

-Belê, ez im.

Dêw dîsan du-sê awirên tûj tê veda û dîsan got:

-Wî heta sibê bibe wê mezêlê.

Roja sisêyan, dîsan bi wî awayî gazî Bedirxan Beg kir û awir danê. Bedirxan Beg aciz bû, ji xort pirsî, got:

-Heyran, çi heqê te li min hebû, te ez bê kar û îş anîme vir? Hûn çi ji min dixwazin? Daxwaziya Dêw çi ye bila bixwaze. Yan jî dixwaze min bixwe bila min bixwe.

Xort got:

-Eleqa min bi xwe pê tune, ev çar salên ku ez hêsîrê ber destê vî Dêwî me. Ji min re gotibû: "Heta tu Bedirxan Begê ji min re neynî ez te bernadim". Û va min tu anîyî balê.

Dêw, destûra wî xortê ku hêsîr girtibû, da. Xort çû. Ew û Bedirxan Beg tenê man.

Bedirxan Begê wê şevê jî li bal Dêwê Reş ma. Dêwê Reş nemeyek nivîsî, da Bedirxan Beg û gote wî:

-Divê tu herî bal Dêwê Sor, ew birayê min yê mezin e. Li filan çiyayî dimîne. De ka ew di derheqa te de çi dibêje? Eleqa min bi xwe jê nîn e.

Çiya tev sêkirî ne. Bedirxan Beg nikare bi tu deverî ve bazde jî... Bedirxan Beg rabû kete rê; heke rojek heke du, sê gihaşt wî çiyayê ku divabû biçûyayê. Xwe berda wê şikefta ku Dêwê Reş jê re tarîf kiribû; meyzand ku wa Dêwê Sor rûniştî ye. Bedirxan Beg lê silav kir, Dêwê Sor pirsî, got:

-Tu çi kes î?

Bedirxan Beg got:

-Ez Bedirxan Begê Bohtî me.

Dêw, lê zivirî got:

-Bedirxan Begê tu yî?

Bedirxan Begê got:

-Belê, Bedirxan Beg im.

Nameya wî danî ber. Dêw gote wî:

-Niha tu ev piçikê han î û vî hukmî li temamiya Bohtan dikî?

Bedirxan Beg dîsan got:

-Belê.

Dêw jê re got:

-Here wê odeya han, heta dibe sibe.

Roja dinê, Bedirxan Beg dîsan hate wî cîhî, bal Dêwê Sor. Dêw rabû nameyek nivîsî, mora xwe li bin xist, da destê Bedirxan Begê û jê re got:

Tu dê herî filan çiyayî, birayê me yê mezin, Dêwê Spî li wir e. Tu dê vê nameya han bidî destê wî. Ka ew dê çi bibêje? Tu tişt di destê min da tune.

Bedirxan Begê nameyê girt û kete riyân, çol û çolistan, berî û berîstan; havîn çû ma zivistan, serê Bedirxan Begê hîn ji nûh ve ket xaxên giran. Piştî dem û zemanan, Bedirxan Beg gihaşt bal Dêwê Spî; nameya xwe da destê wî.

Dêwê Spî jê pirsî, got:

-Kuro, tu yî Bedirxan Begê, tu yî kurê Mîrê Bohtan?

Bedirxan Beg got:

-Belê, ez im.

Dêw got:

-Tu ev piçê han î ewqa hukim dikî?

Bedirxan Begê dîsan got:

-Belê, ez im.

Dêw jê re got:

-De here vê odeya han, ji xwe re heta sibê raze.

Sibe bû Bedirxan Beg dîsan hate bal Dêw.

Dêw, di qesreke spî de li serê çiya ye. Qesreke din jî heye. Dêw, ji Bedirxan Begî re got:

-Here bal wê qesrê, diya me tê de ye; here bal wê, tu û bextê te! Gava tu çûyî hay ji xwe hebe. Heke bi ketina te ya qesrê re berê wê li te be, tu çûyî! Na, eger pişta wê li te be... Haya te jê hebe. Diya me çîçikên xwe diavêje ser milên xwe, rast û çep diavêje ser hev. Divê tu xwe zû zû biavêjî ser, çîçikê wê yê rastê bigirî, di devê xwe bixî û lê bimijî! Heke tu pê re negihîjî, berê wê bi aliyê te bikeve, tu çûyî! Heke ne wisan be ew te nabexişîne.

Du cewrên şêran jî li ber deryê qesrê ne; Bedirxan Beg xwe ji şêran xelas kir, çû, çû xwe gihande odeya diya wan dêwan. Bala xwe dayê Dêwê Spî çawan gotibû eynî wisan e. Bedirxan Beg bazda, bi lez xwe avête ser pîrê, çîçikê wê yê rastê xiste devê xwe û lê mijiya. Pîra diya dêwan ji xwe re got: 'Wey ev çî ye, ev mêş e li ser çîçikê min danî'. Gava pîrê di ser milê xwe re fitilî, jê re got:

-Peyabe, tu filitiyî.

Gava peyabû, pîrê jê pirsî, got:

-Tu çî kes î?

Wî got:

-Ez Bedirxan im.

Pîrê dîsan pirsî, got:

-Niha Bedirxan Beg tu yî?

Wî got:

-Belê.

Pîrê got:

-Li ser seran, li ser çavan.

Bedirxan Beg sê-çar mehan di wan çiyayên de ma. Cilên lê, pêlavên wî tev qetiyay, di wan ciyan de. Lingên wî tijî strîn bûne, laşê wî qirêj girtîye. Rojekê, serê sibê pîrê gazî wî kir, got:

-Bedirxan Beg, ji te re sê înan mohlet; Gulperî keça mîrê cîna ye, kaniyek li filan derê heye, darek jî li wir e. Divê tu herî û ew te nebîne. Gava ku te bibîne, peya nabe. Gulperî û herdu xuhên xwe tînen, sê kevok in; tînen hersê dikevin nava avê, xwe di wê bîrikê de dişon. Divê tu ji xwe re koncalekê bikolî, xwe bixî nava koncalê. Pûş-mûş biavêjî ser xwe, ji bo ew te nebînin. Ji te re sê înan mohlet, eger te ew ji min re girt, anî baş e; lê ku te piştî sê înan ew neanî... Wele tu gepeka xweş î! Ez dê taştîya xwe bi te bikim!

Ëvara înekê, Bedirxan Beg çû, li ber wê bîrikê ji xwe re çalek kola; pûş-mûş jî avête ser û kete nav. Bala xwe dayê ku sê kevok hatin û li ser wê darê danîn. Du heban ji nav wan gotine yekê:

-De peyabe em xwe bişon!

Wê jî got:

-Ez ne gelekî baş im, tu dibêjî qê tayek li ser min e, ez nexweş im. Qet kêfa min ji avê re nayê, ez peya nabim.

Wan herdu kevokên din jê pirsîn:

-Madem wilo ye, te çima em ji malê anîn?

Wê dîsan got:

-Kêfa min ji avê re nayê.

Wan herduyên din gotin:

-Kotrama te kirî...!

Herdu kevokên din postikên xwe ji xwe kirin, ketin avê; xwe baş şuştin. Piştê dîsan postikên xwe li xwe kirin, çûn û gihîştine ya dinê û bi hev re firîn, çûn. Ev hersê kevok, gava postikên xwe ji xwe dikin, dibin qîzên pir bedew. Bira meriv ne bixwe, ne li xwe bike hema li bejin û delaliya van kevokan binihêre. Bedirxan, wê îne tiştek nekir. Êvarekê ket rê ber bi qesra Pîrê çû. Pîrê hate pêşiya wî, pirsî:

-Te çawan kir?

Bedirxan got:

-Wele peya nebûn.

Pîrê got:

-Peya bibin, nebin ji te re du înan!

Îna duduyan, dîsan bi wî awayî ew kevok ji serê darê peya nebû. Dîsan herdu xwehên wê pê de xeyidîn. Herduyan tenê xwe şuştin, firiyan û çûn. Bedirxan dîsan destevala bi ser pîrê ve çû. Pîrê jê re got:

-Înek tenê ji te re ma ! Heke te vê îne tiştek kir, kir heke te nekir ya min û te jî qediya.

Bedirxan Beg, dîsan çû xwe ji serê sibê ve xiste çala xwe; pûş û botav avîte ser xwe û li hêviya kevokan ma. Heta ku werin ser avê. Bala xwe dayê ku Gulperî û xwişkên xwe dîsan hatin; li ser wê darê danîn. Gulperiyê dîsan ji xwişkên re got:

-Ez peya nabim!

Herdu xwişkên wê gotinê:

-Ma wiha dibe? Ev çend roj in tu me tîni ser avê, me didî westandin û bi xwe nakevî avê?

Herduyan ew girtin û bi zorê ji serê darê anîne xwarê; postikê wê jê derxistin û daf dane nava avê. Hersêyan bi hev girtin û hev niqoyî binê avê kirin. Ji xwe re ketin henekan, ha ji tu tiştî neman. Gava hersêyan di nava avê de bi hev re henek dikirin, Bedirxan Beg hêdî gopalê xwe avêt postikê Gulperiyê, ber bi xwe kişand. Rahîşt postik, kire paşla xwe. Pîrê ji Bedirxan re gotibû: "Gava tu rahêjî postikê wê, dê Gulperî li te zirtan bike, dê bêje: "Ka tu çi kes î, postikê min bine, bide min. Heke tu nedî min, ez dê bikim ku kevir, dar û berên vî çiyayî tev li ser serê te rabin!". Lê divê tu netirsî û xwe eşkere nekî. Ku tu xwe jê re eşkere bikî, tu çûyî av û av... Bisekine heta sêhra wê betal dibe. Piştê xwe eşkere bike.

Piştî ku ji avê aciz bûn, herdu xwehên wê postikên xwe li xwe kirin û firiyan; çûn serê darê. Gulperî tenê di nav avê de ma ma. Gulperiyê gote herdu xwehên xwe:

-De bese, we ez aciz kirim, postikê min binin!

Xwişkên wê gotin:

-Me hay ji postikê te nîn e.

Eman, zeman... Gulperîyê kir, nekir postikê xwe nedît. Heta bû êvar. Herdu xwişkên wê firiyan çûn. Gulperî tenê ma. Gulperîyê fêr kir, ku hinekan rahîştîye postikê wê. Gulperî, li Bedirxan Beg kir qêrîn:

-Kuro, tu ins î, tu cins î, tu çi kes î, zû postikê min bîne? Eger tu neyinî ez ê te di cîh de bikim av!

Bedirxan Beg, xwe kerr kir; deng jê çênebû. Gulperîyê qîrek da, heta kevir, kuç, dar û kelenperiyên çolê tev bi ser hev de qulibîn; li Bedirxan Beg kirin qêrîn, gotin:

-Ma tu dê bi kur ve xelas bibî? Em dê te bikin av!

Bedirxan Beg ne tirsîya û ne jî guhê xwe da wan. Gulperî ji xwe re zirt kirin. Heta ku sêhra wê betal bû; gazî kir, got:

-Ka heyran postikê min biavîje, tu çi kes î bêje; tu çi dixwazî ?

Bedirxan Beg, hê xwe derxist. Wî xwe eşkere kir, got:

-Hal û qiseta min ev e. Dêwan ez girtîme, ez niha dîlê destên diya wan im.

Gulperîyê got:

-Baş e, lê ez wiha tazî nikarim derkevim bal te. Postikê min ji min re biavêje, ez dê werim.

Bedirxan Beg postikê wê jê re avit. Gulperîyê postikê xwe li xwe kir, firiya û çû serê darê; ji Bedirxan Beg re got:

-De here ez dê êvarê bihê.

Bedirxan Beg got:

-Eman, zeman, heyran halê min û Pîrê ev e, ku tu neyî pîrê min dixwe.

Gulperîyê gotê:

-Na, na..., tu ji Pîrê re bibêje ew ji te deng nake.

Paşê firî û çû. Bedirxan Beg çiqas zar-zar kir jî, Gulperîyê guh nedayê. Bedirxan bi dilekî kul û pazdehên kesirî ji koncalîka xwe derket, berê xwe da qesra Pîrê. Lingekî wî li paş e, yek jî li pêş e; ditirse. Nikare bi tu deveran de jî here; kete rê û çû. Nêzikî da qesra Pîrê, Pîrê hat pêşîya wî, pirsî:

-Ha, çi bû?

Bedirxan Beg gotê hal û mesele ev e. Pîrê got:

-Belê, Gulperîyê dê êvarê bihê.

Pîrê, bi bextê Gulperîyê amil bû. Pîrê çû niqreyek av li agir kir, sabûn û lûfik danî serşokê. Destek cil jî, ji Bedirxan Beg re hazir kir. Pîrê, Bedirxan Beg bir serşokê û bi wî lûfikî ket ser laşê wî... Bedirxan Beg bû weke ku tu pîvokekê biqêşêrî; wisan spî bû. Wê çekên milûkiyê jî lê kir. Qazek jî anî, serjê kir û bi birinc heşand. Êvarê şîva wî danî ber. Ew çend sal bûn, ku Bedirxan Beg di wê jiyana ne xweş de bû. Ew çend sal bûn, cara yekem ku xwarineka wisan xweş dixwar. Piştî xwarinê Pîrê hanî kîsekî sê-çar rîtil tûtîna Şengalê jî danî ber. Qelûnek ji van qelûnên şîngalê jî danî ser tûtîne. Textek jê re vegirt, lehêf û doşekeka minasib jî danî ser, du zembelîşan jî danî ber palê wî. Pîrê gotê:

-De şîyar be û hay ji xwe hebe. Tu Gulperî bernedî. Divê tu wê bigirî.

Bedirxan Beg got:

-Baş e.

Ew sê-çar sal in ku Bedirxan Beg di wî halê ne xweş de ye, xew gelek lê çûye. Têrxwarin bûye û cîhê wî jî xweş bûye... Bedirxan Beg qelûnek pêxist, yek tefand. Gulperî jî hat, di kulekê de li miqabilî wî rawestiya. Heta li dor nîvê şevê xew li Bedirxan Beg giran bû; serê wî bêhemdî xeliya ser balgîv... bû xir-xira wî, raza. Gulperî jî kulekê daket, hêdîka postikê xwe ji xwe kir û xwe di ber wî de dirêj kir; milê xwe kir binê serê wî û ew jî pê re raza. Hete ku berbanga sibehê hat. Piştî berbangê, Gulperî morîkeka xewê kire guhê Bedirxan Beg, ji bo ku bi xwe nehese. Postikê xwe li xwe kir, morika xewê ji guhê wî derxist; firiya û çû.

Tîrêjên serê rojê derketin. Pîrê hat, bala xwe dayê ku va yek bi tenê li ser text razaye, çû bi hêrs pehînek li ser dilê Bedirxan Beg da; kir ku ava aşekî ji devê Bedirxan Beg hat! Jê re got:

-Rabe bêkêr! Ka Gulperî?

Bedirxan got:

-Pîrê, Gulperî nehat.

Pîrê got:

-Ne rast e, ez yeqîn nakim ku tu rastiyê dibêjî. Ew hatiye. Ka rabe, li bin balgîvê xwe binihêre!

-Dema Bedirxan Beg li bin balgîvê xwe meyizand, bala xwe dayê ku wa xarek û du kap di bin balgîvê wî de ne. Mîna yekî ku bibêje: "Tu zarok î, here ser banan, ji xwe re bi xar û kapan bileyze". Pîrê rahişt wan xar û kapan û got:

-Ev çi ne? Mana vana ango tu ne yê mîrîtiyê yî.

-Bedirxan Beg got:

-Ma ev jî heye?

Pîrê got:

-Du şevên te mane, heke te van herdu şevan jî ew negirt, ne hewceye ku ez te bixwim; ji xwe ew dê serê te jê bike!

Êvarê dîsan Pîrê niqreyek av li agir kir, rahişt lûfikê xwe, û dîsan ew pak şuşt; kir mîna pîvokekê. Destek cilên din hanî lê kir. Qazek jê re heşand, dîsan şîva wî, titûn û qelûna wî danî ber, jê re got:

-De vê carê hay ji xwe hebe.

Êvarekê dîsan Gulperî hat, li refikê, li miqabilî wî danî. Wê şevê jî Bedirxan Beg qelûn li ser qelûnê pêxist; ma heta nîvê şevê. Ji nîvê şevê û pê ve xewa wî hat, serê wî xeliya ser balgîv.

Gulperî dîsan rabû postikê xwe ji xwe derxist, morîka xewê xist guhê Bedirxan Begê. Destê xwe xist bin situyê wî û di ber de xwe dirêj kir, ew jî raza. Berdestî sibehê rabû postikê xwe li xwe kir, morîka xwe ji guhê Bedirxan Beg derxist, dîsan di pacê de firiya û çû.

Bi zeraqiyên tavbê re, pîrê çû lê nihert; dîsan dît ku Bedirxan Beg tenê razaye. Pîrê dîsan pehînek li ser dilê wî da, ava aşekî ji devê wî hat. Pîrê bi hêrs got:

-Rabe, sêwiyê pîs! Dibê: "ez Bedirxan Begê kurê Mîrê Bohtan im", kes nizane tu ji kîjan deverê yî, kurê gavanekî yî; hatî dibêjî: "Ez Bedirxan Begê me"!

Bedirxan Beg dîsan got:

-Pîrê nehatiye.

Pîrê got:

-Ma ev jî qîseta şevê din e? Tu dibêjî "nehatiye", ka ez li bin balgîvê te bimeyzinim?

Gava pîrê li bin balgîv meyizand, dît wa çivîkeke serîjêkirî di bin balgîv de ye. Bedirxan ji pîrê pirsî, got:

-Pîrê, maneya vê çi ye?

Pîrê got:

-Maneya vê... yanî êdî nehewceye ku ez te bixwim! Îşev tenê ji te re maye. Heke tu îşev wê negirî, dê serê te jî mîna yê wê çivîkê jê bike û bifire, here! Heta wê çaxê dijminekî Bedirxan Beg hebû, Pîrê. Lê ji wê çaxê û pê ve, Gulperî jî dibû dijmînê wî. Pîrê dîsan rabû, niqreyek av jê re danî ser agir; rahişt lûfikê xwe dîsan bi laşê wî ket. Laşê wî şuşt, wî bedlî guhert, yekî din di şûna wî de lê kir. Dîsan qazek jê re heşand, xwarina wî anî mîna hercar danî ber. Kîsikê wî dîsan jê re bi titûna Şengalî dagirt, qelûna wî danî ber û got:

-Hay ji xwe hebe. Ne hewce ye ku ez li te şîretan bikim. Eger tu îşev wê di xew de negirî, ev şeva dawî ye, dê ew di xew de serê te jê bike û bifire, here!

Gava Pîrê wisan got, Bedirxan Beg baş fikirî û got:

-Divê ez ji xwe re karekî bikim, ku ez ranezê.

Bedirxan Beg hanî tiliya xwe ya qilîçê qelişand, tijî xwê kir; ji bo ku xewa wî nehê. Bedirxan Beg him birîndar e û him jî xwê di birîna wî de ye. Xewa wî nahê. Gulperî dîsan hat, li pencerê danî. Ew bala xwe didê Bedirxan hîn şiyar e; heta Bedirxan Beg şiyar be jî ew naçe balê. Bedirxan Beg rabû ji nîvê şevê û pê ve xwe di xew de bir; bû xire-xira Bedirxan Begê. Gulperiyê bala xwe dayê Bedirxan Beg di xew ve çû, hêdî ji refikê peya bû; morîka xwe ya xewê xiste guhê Bedirxan û postikê xwe ji xwe derxist. Wê xwe kire ber û destê xwe jî kire bin serê Bedirxan Beg û Bedirxan jî hêdî destê xwe avît sitûkura wê, hişk zeft kir. Wî hişk pê girt heta ku Gulperiyê got: "temam".

Herdu, wê şevê ketin kêf û henekan... Ew heta sibehê ranezan. Pîrê dîsan sibehê zû hat, çi bala xwe bidê? Bedirxan Beg û Gulperî pixîna wan e; xewa sibehê dikin. Pîrê bala xwe dayê ku cot in, newêribû deng li wan bikira, bi paş ve zivirî.

Pîrê ma heta ew têrxew bûn, paşê hêdî hêdî çû lingê Gulperiyê xist devê xwe. Gulperî, pehînekê li devê Pîrê da, Pîrê ji paş ve li ser hêsanê piştê ket. Gulperî bi hêrs û xeys gote Pîrê:

-Pîra pîs î gemarî, ma heta ku mîr hazir bin mirov diçe lingê jinan? Pêşî were lingê Bedirxan Begê maçî bike, paşê lingê min maçî bike!

Pîrê got:

-Belê, Pîrê bi qurban!

Pîrê dizanibû Gulperiyê ew û zarokên wê bi hukmê sêhrê girêdaye. Ne Pîr û ne jî zarokên wê jî nikaribûn ji mixarên xwe derketana derve. Lê pîr û zarokên xwe tev rimildar bûn. Rimil avîtibûn, bala xwe dabûnê tu kes ji xeynî Bedirxan Begê nikare wan veke, angî sêra wan bide betal kirin. Wan dizanibû dê bi saya serê Bedirxan Beg xwe bidin vekirin; êdî dê karibin derkevin derve, herin çolê, herin seyd û nêçîrê. Gulperiyê ji Pîrê re got:

-Temam, min ji ser te û zarokên te sêr helanî!

Gulperî bi hukmê sêr, Bedirxan Beg jî mîna xwe kir kevokek û bi hewa ketin;

berê xwe dane Cizîra Bohtan. Berî ku bigîjin Cizîrê bala xwe danê ku cotkarek li wir cot dike. Bedirxan Begê gote wî cotkarî:

-Here bêje Sêvo: "va Bedirxan Beg hat".

Cotkar kete rê û çû bal Sêvo. Sêvo yekî file ye û ji roja Bedirxan Beg hilkişiyaye ser text ew di nava mala wî de bûye. Sêvo, di şîn û girîna Bedirxan Beg de bûye. Dilê Sêvo qabil nade ku hersê kurapên Bedirxan Beg hukim xistine dest xwe û li ser textê wî rûniştine. Jarê Xwedê di şîn û girînê de ye.

Gava Bedirxan Beg du zêrên zer xistin destê yê cotkar û got ku ew Bedirxan Beg e. Lê yê cotkar got:

-Bavo çi Bedirxan Beg? Ev îsal heft sal in ku Bedirxan Beg miriye! Xêra wî dane. Tu çi bahsa wî dikî?

Cotkar, herdu zêrên xwe xiste binê berîka xwe û got:

-Hûn li ber cotê min bin!

Wan got:

-Herê, herê.

Cotkar ket rê û çû bal Sêvo, got:

-Sêvo, Sêvo mizgîna min çi? Bedirxan Begê û jinek jî pê re ye, wa li bal cotê min in.

Sêvo got:

-Weyla te xwelî li serê Sêvo kirî, birînên Sêvo hebekî qemûş girtibûn; te dîsan der kirin! Ev heft salên wî ne, me xêra wî daye. Niha hestiyên wî bûne ax.

Cotkar got:

-Heyran, welleh min jî yeqîn nekir, lê va yekî du zêr dane min û got here wisan bibêje.

Sêvo rabû pê re hat. Lê feqîro bi dilekî kul û pazdehên kesirî ye. Gava Sêvo bala xwe dayê rast e, va Bedirxan Beg e, xwe avît situyê Bedirxan Begê, bi ser de giriya. Dest û ruyên hev maç kirin û hersêkan berê xwe dane qesrê, hatin.

Dengê hatina Bedirxan Beg li nava bajarê Cizîrê belav bû. Hersê kurên apê wî jî bi hatina wî hesiyan. Hersê kurên apê wî biryar dan ku bibêjin: "Tu nehazir bûyî, diviyabû ku hinekan mîrîtî bikira; heta tu hatî me mîrîtî kir. Mîrîtî dîsan ya te ye". Paşê di nav xwe de gotin: "Heke çavê wî li mîrîtîyê be, em sisê ne, ew yek e; em dê wî bikujin! Lê wextê got: "Na, bila mîrîtî ji we re be", ma em dê çima neqeba xwe û lawê apê xwe xera bikin?". Êvarê, hersêyan dan pey hev û çûn bal Bedirxan Beg, gotin:

-Em bi çûna te gelek êşiyân. Elhemdulîlah va tu dîsan hatî. Ma Bohtan bê mîr dibû? Piştî ku tu hatî, mîrîtî dîsan ya te ye.

Bedirxan Beg got:

-Na, li we pîroz be! Lê heke carekê karekî giran li we qewimî hûn xebera min pê bixin baş e.

Piştî neh meh û neh rojên Gulperiyê qediyân, kurek jê re çêbû. Kurik çend salî bû, li bajêr dawetek çêbû; jintiyên Gulperiyê hatin pey wê ku here dawetê. Gulperiyê got:

-Heyran ez ji dawetên we fêh nakim, nahê.

Gulperiyê kir, nekir xwe ji destê wan xelas nekir; rabû çû. Gulperî, di dawetê

de ket milê mêrê xwe û kurapê mêrê wê jî ket milekî wê; qurincokê li Gulperiyê da! Wextê ku wî niqûşk lê da, Gulperiyê destê wî heliqand û destê mêrê xwe jî berda; çû qesrê. Rast çû bal Sêvo û got:

-Sêvo, bi xatirê te! Silavan li Bedirxan Beg bike. Ku ew gopalekî hesin bide destê xwe û soleke hesin têxe lingên xwe dê binê sola wî biqete, rûyê wê bimîne û ew nema çav bi min dikeve!

Kurikê xwe da ber sînga xwe... Sêvo kir, nekir xatûna wî nesekinî. Sêvo got:

-Xatûna min, sebebê çûna te çi ye?

Gulperiyê got:

-Sêvo, ciyê ku bênamûsî lê hebe ez li wir nasekinim!

Gulperiyê lawikê xwe da ber dilê xwe, firiya û çû.

Bedirxan Beg jî ma hetanî êvarê. Gava hat mal bala xwe dayê Sêvo, kûrre kûrre digirî! Bedirxan Beg pirsî, got:

-Sêvo, xêr e?

Sêvo got:

-Ma min çi xêr e? Mala te xera bû! Gulperî rahişt kurê xwe, firiya û çû. Min hey kire zare-zar, eman zeman ez di bextê te de; feyde nekir. Paşê ji min re got: "Sêvo, devera ku bênamûsî lê hebe ez li wir nasekinim!"

Gava Sêvo wisan got, Bedirxan Beg fêhm kir çi bûye. Bedirxan Beg jî, ji xwe re soz da got: "Ez jî, ji îro û pê ve di nav vî xelkî de namînim. Ez dê herim çolan, bila ez jî li çolan bimirim".

Bedirxan Beg ji nû ve ket rê û dirban. Çi bike, riya welatê mala bavê Gulperiyê jî nas nake. Ket rê û çû bal Dêwê Reş. Gava xwe berda şikeftê, Dêwê Reş meyizand wa Bedirxan Beg e. Dêw pirsî, got:

-Kuro Bedirxan, ma xêr e? Tu û van deran, morîkên diya te li vir qetiyane?

Bedirxan jê re got:

-Hal û mesela min û Gulperiyê ev e.

Dêw serê xwe hejand, got:

-O..., ne ji tirsê wê dêlê bûya tu taştêyeke xweş bûyî! Lê ez ji tirsê wê dêlê newêrim. Ez ciyê wan nas nakim.

Berê Bedirxan da cem Dêwê Spî. Bedirxan çû bal Dêwê Spî. Dêwê Spî jî got:

-Ez nasnakim, here bal diya me.

Bedirxan Beg rabû çû cem diya wan. Diya wan jî got:

-Lawo, tiştê ku ez dizanim, êvaran dihatin ser vê kaniyê, xwe dişuştin. Lê cî û warê wê, ez nas nakim.

Bedirxan Beg, ji xwe re bi dinyayê ket; rojekê çû derekê bala xwe dayê wa sê zarok, li perê gundekî pev diçin, diberizin hev. Bedirxan Beg rast çû bal wan, pirsî:

-Heyran, hûn çima pev diçin?

Gotin:

-Bav û diya me mirine, mîrata ji dê û bavê me ma ye ev şiva han, kumek û ev cilika han e; em li ser şerr dikin. Yek dibê: "merşik ji min re", yê din dibê: "na, kum ji min re" û em li ser wan li hev nakin.

Bedirxan Beg pirsî, got:

-Ê..., ka bibêjin, ev çi karî dibînin?

Yekî ji wan zarokan got:

- Wextê tu kum bidî serê xwe tu kes te nabîne! Wextê tu li berrê siwar bibî û vê şivê lê bixî, devera dilê te bixwaze dê te biavîje wir.

Bedirxan Beg di dilê xwe de got: wey, ev ji xwe ji min re baş in. Ez li esmana, li tiştêkî wiha digeriyam, niha li erdê bi destê min ketiye.

Ji wan zarokan re got:

-De hêdî, ez dê we ji hev biqetînim.

Zarokan gotin:

-Çawan?

Bedirxan Beg ji wan re got:

-Hersê herin, qederê dused gavî ji min dût bikevin, paşê baz bidin. Kî pêşî gihast bal min, ew kîjanê bixwaze jê re ye û wisan bi dor.

Zarokan gotin:

-Rast e!

Çawa piştê wan ket Bedirxan, Bedirxan rabû di şûna wan tiştan de her yekê zêrek danî; hêdî kum da serê xwe, berr jî pêça kir bin çengê xwe, şivika xwe girt û çû. Piştî ku Bedirxan Beg bi dût ket, zarok hatin cîhê tiştên xwe. Bala xwe danê, ku wa li dewsa her tiştêkî zêrek heye. Kêfa zarokan pîrr hat, gotin: "Wey mala wî camêrî ava be, em ji hev qetandin. Sê zêr in, hersê jî weka hev in. Em tev weka hev gihîştin heqê xwe".

Bedirxan Beg çû nava bajarekî, lêxist çû nava malekê. Bala xwe dayê wa xortek li ser kursî rûniştiye. Bedirxan dixwest kumikê xwe biceribîne. Rast ber bi wî xortî çû û tiliya xwe xiste çavê wî. Xort got: "Ê..., îroj çiqas kermêş hene!". Wî nedît ku Bedirxan Beg e, tiliya xwe xistiye çavê wî. Bedirxan Beg bawer kir ku rast e, heke ew kum li serê kî be tu kes wî nabîne. Ji hundir derket, xwest berra xwe jî biceribîne. Li berra xwe siwar bû û şivek lê da, got: "Bajarê bavê Gulperiyê li ku be tu dê min biavîjî wir!". Bala xwe dayê lê bû ba û bablîsok; hew dît wa li bajarekî ket! Bajar xerîb e, ew jî tu kesî nas nake. Riya mizgeftê pirsî û çû mizgefta bajêr. Xuya ye ku tev kor in, qop in, ji aqilê xwe seqet in an jî pîrên bêkes in, ku li camiyê dimînin. Tev diçin ji xwe re parsê dikin, tînin li mizgeftê dixwin. Bedirxan çû li tihêla yekî seqet rûnişt. Yê seqet jê re got:

-Li ser seran, li ser çavan ya mêvanê delal! Yê seqet çû pîrsa xwe hanî, li ber xwe û Bedirxan Begê danî; xwarin. Şeveq bû, wey li wî ku zû here bi çarsûyê bikeve, ji xwe re pars bike. Ber bi nivro, yek hat wa sîtila wî tije birinc e, ser birinc jî tijî goşt e. Hevalên wî jê pirsîn:

-Birako, te ev ji ku hanî?

Wî got:

-Hooo... malikavano Xwedê xêr kiriye erdê, dê ji niha û pêştir xwarina me bibe goşt û birinc.

Hevalên wî pirsîn:

-Çima?

Wî got:

-Gulperiyê, keça mîrê cina bihîstiye ku mîrê wê, Bedirxan Begê miriye; xêra wî dide.

Yeqîn Gulperiyê dizanibû, dê Bedirxan Beg li pey wê têkeve ser rê û dirban, lê xwe nagihîjîne bal mala bavê wê û dê di riyana de bimire. Ji ber vê yekê, Gulperî xêra wî dida. Kêfa wan kal û seqetan pirr hat, gotin:

-Êêê..., wele gepa me kete don!

Yekî seqet da xwe, rabû ku here ji xwe re tiştêkî bîne. Bedirxan Beg jî hêdî da pey û çû. Yê seqet ji Bedirxan Begê re got:

-Tu dê werî ku?

Bedirxan Beg got:

-Ez dê bi te re werim.

Yê seqet got:

-Na, na, tu nehê! Ez dê têra xwe û te tev goşt û birinc bînim.

Bedirxan Begê gote wî:

-Heyran tu mirovekî seqet û nuqsan î, lê ez baş im, bi qewt im; ez dê hema ji xwe re bihînim.

Yê seqet da pêşî, Bedirxan Beg jî da pey, ketin rê û çûn. Xaya Bedirxan ew e, ku çihê mala bavê Gulperiyê nas bike. Pîştî qederekê çûn Bedirxan hêdî kumê xwe derxist, da serê xwe. Haya yê seqet qet jê nema; kulîkulî diçû. Carekê li pey xwe fitilî ku wa Bedirxan Beg ne li pey wî ye, got:

-Ê, bavo ew bi herdu lingana e û ez qop im... Ji xwe dê zû here û min tenê bihêle.

Seqet, gîhişte ber deriyê mala bavê Gulperî, sîtila xwe da destên xulaman da jê re goşt û birinc dagirin. Sîtila xwe ya dagirtî ji dest wan sitend û vegeriya hat mizgefta xwe. Bedirxan Beg jî kumê wî li serê wî ye, di wê odeyê re derbas bû, çû aliyê jinan û li odeya wan rûnişt. Lê tu kesî ew nedît û wî nabînin.

Gulperî jî xwarin li xwe heram kiriye, tu tiştî ne dixwe û ne jî vedixwe. Kurê Gulperiyê jî givrokî ye, got:

-Dayê, ez birçî me.

Gulperiyê gote qerwaşeka xwe da here ji bal diya wê, ji kurik re xwarinê bihîne. Qerwaşê teyfik tije goşt û birinc kir, hanî li ber kurik danî. Bedirxan Beg jî birçî ye. Wî jî du caran destê xwe li sihana ber kurik peland, sihan vala bû. Kurik, bû kûrre-kûrra wî, giriya. Diya wî hat kulmiskek li serê wî da, got:

-Belqitiyo, ma te evqa xwarin xwar tu hîn têr nebûyî? Heke ez rabim teyfikê dîsan bişînim bal diya xwe dê diya min bêje: "Gulperiyê, pora wê kur be! Duh mêrê wê mir, îro radibe xwarinê dixwe! Vî kurî ez hetikandim" Bang li qerwaşa xwe kir, dîsan şand. Teyfika kurik dîsan tijî kirin û li ber danîn. Bedirxan Beg hêdî kumikê xwe ji serê xwe hilanî, herdu çavên wî xuya kirin. Gava lawik çav bi bavê xwe ket, got:

-Dayêê..., va bavê min!

Bedirxan Beg bi lez dîsan kumê xwe da serê xwe. Diya wî hat kulmisek din li serê lêwik da, got:

-Heyla malmîrat, bavê te li ku? Ez xêra bavê te didim, tu dibêjî: "Dayê, va bavê min". De xwarina xwe bixe û min aciz meke!

Gulperî bala xwe dayê ku ew teyfik jî zû xelas bû. Wê jî mereq kir, got:

-Heyran tu ins î, tu cins î de derkeve ka tu çî kes î?

Bedirxan Beg kumik ji serê xwe hilanî, ku va ew e. Gulperiyê jê pirsî:

-Malxerabo, tu çawan hatî, tu bi çi hatî, kê tu hanî?

Bedirxan Beg got:

-Hema min li vir hazir bibîne.

Gulperiyê got:

-Ê, baş e va tu hatî û min gotiye miriye; ji roja ez hatime bavê min bi min re gotin nekiriye. Bavê min bûye neyarê min. Ew ji min re dibêje: "Te ne Bedirxan Begê kurê Mîrê Bohtan kiriye, tu bi gavanekî yan jî bi şivanekî re zewiciyî". Ji wî wetirê ez wî dixapînim. Wiha çênabe, divê tu hunerekî xwe bidî nîşandan, mîraniya xwe bidî qebûl kirin. Bedirxan got:

-Hermet, ma tu mîrên cina yê ji bavê te zortir tunnin ku werin dawa xerc û xeracê li bavê te bikin? Wê çaxê dê di neqeba wan de herb çêbe. Wê çaxê dê mîraniya min kifş bibe.

Gulperiyê got:

-Belê, mîrekî cina, yê ji bavê min zortir heye, de ka em berzûrî Xwedê bibin ku ew di demeka nêz de were, dawa xerc û xeracan li bavê min bike. Ev heft sal in, bavê min xerc û xeracên xwe nedaye wî.

Wê şevê dua kirin. Duayên wan qebûl bûn.

Serê sibê, bavê Gulperiyê rahişt misînê xwe, çû desmêjê. Bala xwe dayê va çaraliyê bajêr bi çadiran hatiye girtin. Piştî roj derket, di pey taştiyan re, siwarek hat wezaretê bavê Gulperiyê û nameyek dayê. Bi devkî jî got: "Va filan mîrê cina hatiye, dawa xerc û xeracên heft salan li te dike. Yan tu dê xerc û xeracên heft salan bidî û yan jî tu dê beyana herbê bikî?". Gava bavê Gulperiyê ev name xwend, got:

Ez temamê bajarê xwe û hemû milk û avên xwe bidim dîsan jî ez nikarim xerc û xeracên heft salan bidim.

Bavê wê rabû, çû bi wezaretê xwe şewirî. Temamê wezîran gotin:

-Na, em ji heq dernayên. Em dê herbê bikin.

Bavê Gulperiyê gote yê qasid:

-Em xerc û xeracan nadin, di neqeba me û we de herb e!

Qasid vegeriya çû nava konê xwe.

Bavê Gulperiyê jî xeber şand nava bajêr, giregirên bajêr li hev civiyan, ku biryar bidin; dê kî here şerrê wan. Giregirên bajêr biryar dan ku herdu zavayên bavê Gulperiyê herin şerrê wan. Yek ji wan kurê qazî ye, yê din jî kurê miftî ye. Civata bavê Gulperiyê got:

-Ev herdu, di nava vî bajarî de ji hemû kesî bi qedirtir in, divê pêşî ew herine şerr.

Xeber şandin pey herdu zavayên wî, gotin: "Divê hûn herdu herine cenga vî zalimê han". Ji tewla bavê Gulperiyê du hespên baş derxistin, hanîn. Herdu zave li hespên xwe siwar bûn, di nava kuçan de dan xaraniya. Piştî du-sê kuçan, herduyan jî hespên xwe berdand û reviyar, çûn ketin kadinên kayê, xwe veşartin. Bedirxan Beg, kurê Mîrê Bohtan gote Gulperiyê:

-Ez dê niha herim herbê. Cilên min reş, hespê min reş weka qijikeke reş. Ez dê herim cenga vî zalimî... Lê tu min eşkere mekî. Heke tu min eşkere bikî, ez dê bême kuştin.

Gulperîyê got:

-Na, ez te eşkere nakim.

Alema ku temaşa dikir bala xwe dayê siwarek, ji aliyê rojhelat ve derkete meydana cengê. Cilên wî reş, hespê wî reş, weke qijikeke reş êrîş bir ser dijmin.

Bavê Gulperiyê di qesra xwe de, wezîr jî di qesra xwe de li wî siwarî diniherin. Qesra jinan jî, diya Gulperîyê û herdu xuşkên wê derketine ser banê qesrê û li wî siwarî diniherin. Her serê saetekê herdu xwişkên Gulperîyê tahna didin Gulperî, bi kulmiskan li serê wê dixin, dibêjin:

-Xwelî li serê te be! Tu dibêjî min Bedirxan Begê kurê Mîrî Bohtan kiriye! Ji xwe re li cenga mêrên me binihere. Çi tînin serê dijmin.

-Gulperî bi xwe dizane, yê ku şerr dike ne mêrê wan e, Bedirxan Beg e. Lê newêre bibêje ew e. Heke bibêje ew Bedirxan Beg e, dê Bedirxan Beg bihê kuştin. Wê xeber neda û di nava xwe de dibece. Çi çara Gulperî pîrr aciz dibe, ji ser banê odê peya dibe, dihê odeya xwe. Piştî dîsan dilê wê qabil nade, mêrê wê di ceng de ye. Dîsan derdikeve, diçe ser banê qesrê û li mêrê xwe dinihere. Ew roj wisan derbas dibe.

Êvarê wezaret li hev civiya, biryar da: "Ev ceng, ne cenga kurê qazî û miftî ye".

Bavê Gulperîyê gotê:

-Ka li vî siwarî bibin notirvan, ka ew êvaran diçe li ku radizê.

Êvaran ceng betal dikirin. Bedirxan jî dihê perê bajêr, hespê xwe berdide, kumê xwe dide serê xwe û tu kes nabîne ka ew diçe ku. Êvarê, Bedirxan Beg hat cem Gulperiyê, got:

-Çawan e?

Gulperiyê got:

-Çi çawan e? Herdu xwişkên min û diya min ez di tahnan de şewitandim.

Bedirxan Beg got:

-Na, çênabe tu min eşkere bikî. Tu dizanî, gava ku ez bihême eşkerekirin ez kuştî me. Sibehê ez dê dîsan derkevim: hespê min sor, cilên min sor, şûr û mertalê min sor. Tu min eşkere nekî!

Sibehê bi şevqê re Bedirxan dakete meydana cengê... Wezaret dîsan civiya, biryar da, ku ew şervan ne kurê qazî û ne jî kurê miftî ye. Gotin: "ev mêrekî zor û zalim e, hatiye ser me şerr dike. Ev, yê din jî milayket e, Xwedê ew şandiyê hewara me. Hema kê dibe bila bibe.

Gulperî, diya wan û xwişkên wê dîsan li ser banê qesrê ne, li şerr diniherin. Herdu xwişk û diya wê tahnan li Gulperî dixin û bi tepûskan diçin serê wê. Ew jî, ji beca nav xwe dike biteqe. Hema peya dibe diçe odeya xwe û dîsan di nêrdewanan de hildikişe, diçe ser banê qesrê. Ew roj jî bi wî awayî derbas dibe. Dîsan notirvaniya wî siwarî kirin, lê tê dernexistin ka ew kî ye. Roja din serê sibehê Bedirxan Begê gote Gulperîyê :

-Ji min û wan re tenê îro maye. Ez bi eniya bavê xwe bikim, nahêlin ferd ji vî leşkerî bifilite... Ez dê wan biqelînim. Ez dê bikim ku mêr ew e ku ji mala xwe nehatiye. Hema tu îro jî min eşkere neke. Îro dê hespê min boz, cilên min spî, weka teyrekî spî...

Padîşah û wezîrên wî nema îşe xwe ji kurê qazî û miftî hanîn. Baş dizanibûn

ku ne ew in, alem bala xwe didê wa siwarekî cilspî, hesp boz û şûr û mertal spî, mîna teyrekî spî wa di cengê de ye. Bi serê wî leşkerê zalim çî dike.

Gulperî, diya wê û herdu xwişkên wê dîsan li ser banê qesrê ne, li cengê temaşe dikin. Gulperî di bin tahnên wan de, hew îdare kir, got:

-Xwelî li serê we be! Ma ji we wetirê kurê qazî û kurê miftî vê cengê dikin? Ev Bedirxan Begê kurê Mîrê Bohtan e! Mêrên we xwe di kadînên kayê de veşartine.

Bi gotina Gulperiyê re, rimek hate Bedirxan Beg... Rim, li bin cengê wî yê rastê ket, xwîn bi ser cilên wî de hate xwarê. Bedirxan hespê xwe rast ajote ber derê qesra bavê Gulperiyê û gotê:

-Ka ji min re destmalekî biavjîjin, ji bo ez li ser birîna xwe girê bidim.

Bavê Gulperiyê destê xwe avît binê berîka xwe, destmala xwe deranî û jê re avît. Bedirxan Beg, destmal bi serê şûrê xwe, li hewa girt. Li ser birîna xwe, li zendê xwe girêda û dîsan bi paş ve zivirî, berê xwe da cengê. Heta ku bû êvar, mêr ew bû ku ji mala xwe ji bal jin û zarokên xwe nehatibû... Bedirxan Beg ew leşker qeland. Yên reviyar xwe xelas kirin, yên din jî hatin kuştin.

Bavê Gulperiyê got:

-Ma ne ev mirov diçe derekê, ka bi dû bikevin, gelo ev diçe ku?

Bedirxan dîsan hate nav bajêr, hespê xwe berda û kumê xwe da serê xwe, hate malê bal Gulperiyê. Serê sibehê xwe ne veşart. Xulamek di ber qesra Gulperiyê re derbas bû, bala xwe dayê wa mêrek li bal Gulperiyê ye. Xulam bi lez çû bal bavê wê û got:

-Mêrek wa li bal keça te ye.

Padîşah çend kes şandin bal Gulperiyê, da bizanibe ew çî kes e û bila ew mêr bihê dîwanê.

Xeber da Gulperiyê. Bedirxan Beg hat dîwana Padîşah, bal xezûrê xwe. Xezûrê wî jê pirsî:

-Tu çî kes î?

Wî got:

-Ez Bedirxan Begê kurê mîrê Bohtan im.

Padîşah jê pirsî:

-Niha ev şerrê han, te dikir?

Wî got:

-Belê, hersê rojan jî ez bûm.

Padîşah got:

-Nîşaneke me heye, tu dikarî rayî me bidî?

Bedirxan Beg destê xwe avîte wê destmalikê, ji birîna xwe vekir û dirêjî xezûrê xwe kir. Padîşah bala xwe dayê rast e, Bedirxan Beg e, jê re got:

-De were destê min, min qîza xwe da te.

Bedirxan Beg çû destê wî, Gulperiyê bi jinantî ji xwe re qebûl kir. Paşê gazî yê xwe kir. Heft şev û heft rojan ji wan re dawet li dar xistin. Ji qerebalixî, dê weledê xwe diavît.

Piştî daweta wan bi çend mehan, Bedirxan Begê gote Gulperiyê:

-De êdî divê em herin. Em dîsan herin welatê xwe, Cizîra Bohtan.

Gulperiyê got:

-Ez nahêm. Heke ez werim tu dê bi kurapên xwe re herbê bikî, yan tu dê wan bikujî û yan jî ew dê te bikujin. Ez û kurê xwe dîsan yê vegeê ne. Bedirxan Beg got:

-Ez naçim Cizîrê, ez dê li ciyekî din, ji Cizîrê dûr çadira xwe vedim û ji kurên apê xwe re herbê elan bikim. Yan ew dê min bikujin û yan jî ez dê wan...

Ji ber ku yek ji wan zarokên apê wî quncirîkek li Gulperî dabû. Eksa Gulperîyê ji wê yekê bû.

Bavê Gulperîyê got:

-Madem hûn yên çûnê ne, heftiyek mohletê bidine min; heta ez karê we bikim.

Bavê Gulperîyê çî da wan, da wan. Hersê, Gulperî, kurê wan û Bedirxan Beg bûne kevokekên spî, firyan hatin li biniya Cizîra Bohtan danîn, çadira xwe vegirtin.

Bedirxan Beg ji zarokên apê xwe re xeber şand:

-Neqeba min û we herb e!

Zarokên apê wî temamê eşîrên Bohtan li xwe civandin û çûne şerrê Bedirxan Beg. Herçiyê çû cenga Bedirxan Beg venegeriya...

Eşîrên Bohtan li hev civiyan, gotin: "Ma bavo ya me çî ye? Em çima xwe didine kuştin? Kî mîr be ji me re weke hev e, niha ew Bedirxan Begê bikujin, ew dê bi mîr bin, heke Bedirxan Beg wan bîkuje dê Bedirxan Beg bi mîr be. Ma ya me çî ye?" Rabûn xeber şandin bal hersê lawên apê wî, gotin: "Em di vê cengê de alî nagirin".

Lawên apê wî kirin, nekirin tu kes neçû şerrê Bedirxan Begê. Hersê mecbûr bûn xwe ji wî re berdane meydana cengê. Kîjan ji wan çû venegeriya... Bedirxan Beg hat, careka din li ser textê mîrîtiyê rûnişt. Rabû xeber şand pey temamê eşîrên Bohtan., ji wan re got:

-Ma hûn dixwazin ez bibim mîrê we? Yê naxwaze bula derkeve meydana cengê.

Eşîran jî gotin:

-Em cenga bi te re naxwazin, tu mîrê me yî, li ser seran, li ser çavan.

Bedirxan Begê Bohtî ji nûh ve mîrîtiya xwe xurt kir û hukmê xwe domand.

Çîroka min çû nav devîyan, rihmet li dê û bavên me hemîyan.

(*) Ev çîrok, di sala 1989'an de li gundekî Qamişloyê ji aliyê Nayîfo (Bavê Azad û Xêredin) hatiye gotin. Emrê wî wê çaxê di ser 70'yî re bû.

Derheqê rastnuştena kirdkî (kirmanckî) de kombiyayîşê Stockholmî

Roja diyina aşma tebaxe (menga agustose) de, Stockholm de, kirdkî (kirmanckî, dimilkî, zazakî) ser o kombiyayîşê dest pêkerd û hîrê rojî (2-3-4ê tebaxe) ramit. Komeleya Nuştexanê Kurdistan-Swêd de (Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê) no kombiyayîş amade kerdbî. Kombiyayîşê Stockholmî de nê pancês kesî amade bîy:

Sait Aydoğmuş (*Pîran*)
Osman Aytar (*Sêwregî*)
Mûnzûr Çem (*Dêrsim*)
Memo Darrêz (*Bongilan*)
Haydar Diljen (*Sêwregî*)
Nihat Elî (*Sêwregî*)
J. Espar (*Pîran*)
Cemil Gündoğan (*Dêrsim*)
Lerzan Jandîl (*Gimgim*)
Çeko Kocadağ (*Gimgim*)
M. Malmîsanij (*Pîran*)
Selîm Mûrat (*Palu*)
Kamer Söylemez (*Dêrsim*)
Kazım Temürlenk (*Dêrsim*)
Harun Turgut (*Palu*)

Bêguman no kombiyayîş wareyê zîwanê kurdî de û hîna zaf zî wareyê lehçeya kirdkî/kirmanckî de gamêda muhîm a. Nê kesan no kombiyayîş de rastnuştena kirdkî ser o meylê xwi tesbît kerdî. Nê kombiyayîşî de meselanê

cêrînan ser o yew bi yew û derg û dila munaqesey bîy. Şîma nê nuştî de netîceyanê nê munaqeseyan û meylan wanenê. Netîceyê ke ze meyl tesbît bîyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan îfade kenê. Nê, ze tewsiye û teklîfi yê. Keso ke biwazo şîno zey nê meylan binuso.

Tanî çeku (kelîme) yan zî formê çekuyan ê ke ma no nuşte de ze nimûne nuştê, tanî mintaqayan de ciya yê.

1)Herfî

Herfê elfaba ewroyin a kurdkî nê 31 herfî yê:

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Tanî nuşttoxî nuştlayanê xwi de herfanê zey "Û" û "Ğ" nusenê yan zî herinda herfa eyn a erebkî de îşaretê apostrofî (') ronanê. Madem ke elfaba kurdkî de çînî yê, ganî nê herfî û îşaretî nêrê nuştene. Ma vajî, ganî herinda "ğerîb"î de "xerîb", herinda "Hezretê 'Elî" de "Hezretê Elî" binusiyo (bêro nuştene).

2)-an

Kirdkî de, tanî cayan de, herinda "-an"î de "-ûn", "-on", "-û" yan zî "-o" vajiyêno. Herinda "-am"î de zî tanî cayan de "-ûm" yan zî "-om" vajiyêno. Labelê nuştene de ganî ebe formanê "-an" û "am"î binusiyo. Çend nimûney:

Meylê kombiyayîşî: mangan, dewan, banan, zanayan

Formê bînî: mûngûn/mongon/mûngû/mongo, dewûn/dewon/dewû/dewo, bûnûn/bonon/bûnû/bono, zûnayûn/zonayon/zûnayû/zonayo

3)-am

Meylê kombiyayîşî: cam, dame, lamba, name, tam, tamam, zama

Formê bînî: cûm/com, dûme/dome, lûmba/lomba, nûme/nome, tûm/tom, temûm/temom, zûma/zoma

4)Tarîxî

Tanî nuşttoxî nuştena tarîxan de îşaretê - yan zî apostrof (') xebitnenê (gurênenê). Meylê kombiyayîşî aw o ke tarîxî bê nê îşaretan binusiyê.

Meylê kombiyayîşî: 25ê aşma nîsane/25ê aşma nîsani, 1ê gulane, 17ê temmuze

Formê bînî: 25-ê aşma nîsane, 1-ê gulane, 17-ê temmuze

25'ê aşma nîsane, 1'ê gulane, 17'ê temmuze

5)Kilmnuştene (abréviation)

Çekuyan yan zî nameyanê kilmkerdeyan dim a apostrof esto. Labelê

herfane kilmerdeyan dim a nuqta nêronêna. Nimûne:

Meylê kombiyayîşî: Kesê welatperwerî lejê YNK'î û PDK'î nêwazenê.

Formê bînî: Kesê welatperwerî lejê Y.N.K-î û P.D.K-î nêwazenê.

Kesê welatperwerî lejê YNK-î û PDK-î nêwazenê.

Kesê welatperwerî lejê Y.N.K.î û P.D.K'î nêwazenê.

I-NAME

Nuştoxê kirdan/kirmancan ewro tanî nameyan ebi forman û çekuyanê ciya-ciyayan nusenê. Cêr ra ma derheqê tani nameyan de meylê kombiyayîşî nusenê:

1)nameyê rojan

Nameyê rojan ebi herfa werdî (qice) dest pêkenê û wina nusiyênê:

Kirdkî/kirmanckî: şeme, yewşeme, dişeme, sêşeme, çarşeme, panşeme, îne

Tirkî: cumartesi, pazar, pazartesi, salı, çarşamba, perşembe, cuma

2)nameyê mewsiman

Nameyê mewsiman wina nusiyênê:

Kirdkî/kirmanckî: wisar, hamnan, payîz, zimistan

Tirkî: ilkbahar, yaz, sonbahar, kış

3)nameyê qıtayan (kontînentan)

Nameyê qıtayan ebi herfa girde dest pêkenê û wina nusiyênê: Asya, Ewropa, Amerîka, Afrîka, Awıstralya, Antarktika

4)nameyê şaristananê (bacaranê) Kurdıstanî

Ze prensîp, nameyê şaristananê Kurdıstanî, zey vatişê şarê aw (ay) şarıstanî nusiyênê. Nimûne: Dêrsim, Gımgım, Bongılan, Dıyarbekır, Mêrdın.

5)nameyê zıwanan û lehçeyan

Nameyê zıwanan û lehçeyan ebi herfa werdî dest pêkenê.

Nimûne: kirdkî/kirmanckî/dımilkî/zazakî, kurdkî, tirkî, fariskî, frenskî, İngilizkî

6)nameyê dınan û mezheban

Nameyê dınan û mezheban ebi herfa werdî dest pêkenê.

Nimûne: misılmanıye/mısılmaney, xırıstıyanıye/xırıstıyaney, yahudênî/cıhudey, elewıyênî/elewıyey, katolıkênî/katolıkey

7)nameyê mensûbanê milletan

Nameyê mensûbanê milletan ebi herfa werdî dest pêkenê. Nimûne:

O kurd o

A tirk a.

No lajek alman o.

Nê keynekî ereb ê.

Sifet û zêrfê ke nameyanê milletan û dewletan ra viraziyênê zî ebi herfa werdî dest pêkenê. Nimûne:

Keyneka kurde (kurdi) kirdkî wend keyneka tirke (tirki) tirkî wend.

Tanî xortê kurdperwerî ewro zîndan de yê.

Gelek unîversîteyan de îranolojî esto labelê kurdolojî çinê yo.

8)nameyê mensûbane şaristanan

Nameyê kesan ê mensûbanê şaristanan, mensûbanê dewletan û milletan ebi herfa werdî dest pêkenê. Nimûne:

O pîranij o.

A dêrsimij a.

No lajek îranij o.

Nê keynekî gurcîstanij ê.

Seyîd Riza dêrsimij (dêrsimiz) bî.

Ehmedê Xasî yo ke kitabo kirdkîyo verên nuşto hezanij bî.

Not: Herinda ”-ij”î de tanî cayan de ”-ic” yan zî ”-iz” zî vajiyêno. Nimûne: dêrsimiz, pîranic, çewlîgic/çolîgic.

Sifet û zêrfê ke nameyanê şaristanan ra viraziyênê zî ebi herfa werdî dest pêkenê. Nimûne:

Gedeyîya mi de mûndîya lawure Pîran de biqîmet bî. (Çekuyê ”lawure”, nameyê şaristanê ”Lahor”î ra yena.)

Ma hete camêrdan di tewir şalwarê siyay xwi pay kerdênê, tewiro yew qeremendû aw bîn zî awrûpa bi; labelê awrûpa hîna vay bi.

9)nameyê kesan ê xerîban

Nameyê kesan ê xerîban ke orîjînalê xwi ebi elfabeya latînî nusiyênê -ma vajî nameyê ewropayijan û amerîkayijan-, zey orîjînalê nê nameyan nusiyênê, teleffuzê yî nî parantezan miyan de nusiyênê.

Nimûne: René Descartes (Röne Dekart), Shakespeare (Şekspîr), George Bush (Corc Bûş)

Nameyê kesan ê orisan, ereban, farisan... ke orîjînalê xwi ebi elfabeya krîlkî, erebkî/fariskî... nusiyênê, zey teleffuzê nê nameyan nusiyênê.

Nimûne: Gorbaçov, Îbnî Xeldûn, Sedîyê Şîrazî

Nameyê kesanê misilmanan û şarê Rojhelatê Miyanînî (Ortadoğu) zey teleffuzbiyayena nê naman nusiyênê. Hafîz Esed, Seddam Huseyn, Mehmûd Derwîş, Xumeynî, Muhemmed Îqbal.

Eger îmkanê nuştana orîjînalê naman ê xerîban -hetê herfan ra- çînê bo, aw wext herfê nîzdîyê nê herfanê xerîban tercîh benê. Ma vajî herinda "Kungsträdgården"î -ke nameyêdo îsveçkî (swêdkî) yo- de merdim şîno binuso "Kungstradgarden". Çimkî herfê "ä" û "å" Kurdkî de çînîyê û beno ki daktîloyê Kurdan de zî çînê bî.

10)nameyê kitabana û nuşteyan

Her herfa verîn a her çekuyê kitabana yan zî nuşteyan (yaziyan) gird nusiyêna, labelê nê nameyan de herfa verîn a edatan û konjunksiyonan (conjonction, bağlaç) gird bunusiyo zî beno, werdî binusiyo zî beno. Ma vajî nameyê kitabana Mûnzûr Çem, J. Espar û Qemerê Alî wina nusiyênê: Hotay Serra Usifê Qurzkizî, Tanî Estanikî û Deyîrê Ma, Adir û Asme.

II-FÎL

Kirdkî de yew fîl esto ke tamam niyo, zek erebkî de vajiyêno "fîlo naqis" o yanî "fîlo nêmcet" o, tena demeyê nikayine (présent) de anciyêno. Nameyan, zemîran yan zî sifetan dim a yeno, menayêda newa dano yînî. Muqabilê nê fîlî frenskî de "être", îngilizkî de "to be" yo.

Ganî nuşttox xwi vîrî nêko ke fîlo corîn zemîran, sifetan û nameyan ra ciya nusiyêno. Tiya de ma çend nimûneyan nusenê:

ez a
ti yî
ti ya
o yo
a ya

ma yê
şîma yê
ê yê

Ez kurd a.
Ti kurd î.

Ti kurd a.
O/yû kurd o.
A/ya kurd a.

Ma kurd ê.
Şima kurd ê.
Ê/yê kurd ê.

Ez gird a.
Ti pîl î.
Aw/ay defter o.
A qelem a.

Menfîyê (negation) nê fîlî
ez nîya, ez nêbîya, ez nêbîbîya
ti nîyî, ti nêbî, ti nêbîbî
ti nîya, ti nêbîya, ti nêbîbîya
o nîyo, o nêbî, o nêbîbî
a nîya, a nêbî, a nêbîbî

ma nîyê, ma nêbîyê, ma nêbîbîy
şima nîyê, şima nêbîyê, şima nêbîbîy
ê nîyê, ê nêbîyê, ê nêbîbîy

Ganî ma naye zî vajî ke him zemîrê şexsî him zî antişê (conjugaison) nê fîlî
ca ra ca ferq kenê. Ma vajî şîweya Dêrsimî de wina yê:

ez ûne/ez o/ez û/ez a
ti ya
o wo
a wa

ma yîmê
sima yê/şima yê
ê/î yê

Ez kurd ûne.
Ti kurd a.
O kurd o.
A kurd a.

Ma kurd îme.
Sima/şima kurd ê.
Ê/yê kurd ê.

Ez gird ûne.
Ti pîl a.
O defter o.
A qelem a.

Ma zaf îme.
Sima/şima senik ê.
Ê zanaye yê.

Menfiyê (negation) nê fîlî
ez nîyûne, ez nêbîyûne, ez nêbîvîyûne
ti nîya, ti nêbîya, ti nêbîvîya
o nîyo, o nêbî, o nêbîvî
a niya, a nêbîye, a nêbîvî

ma nîme, ma nêbîme, ma nêbîvîme
sima/şima nîyê, sima/şima nêbîyê, sima/şima nêbîvî
ê/yê nîyê, ê/yê nêbîyê, ê/yê nêbîvîyê

Herçiqas ke no fîlo corîn fîlê "bîyene"/bîyayene" maneno zî no "bîyene"/
"bîyayene" niyo, yewna fîl o. Muqabilê fîlê "bîyene"/"bîyayene" frenskî de
"devenir", îngilizkî de "to become" o û wina anciyêno:

bîyene/bîyayene/bîyayiş
ez bena/ez beno
ti benî
ti bena
o/yû beno
a/ya bena

ma benê
şima benê
ê/yê benê

Şîweya Dêrsimî de
ez benû/ez beno/ez bena/ez ben
ti bena

o beno
a bena

ma beme
sima/şima benê
ê/yê benê

Fîlo piyabeste

Fîlo piyabeste (verbe composé, bileşik fiil) çend tewirî yo. Cêr ra ma meylê kombiyayîşî gore nuştene nê tewiran nusenê:

1-prefikso yewheceyin + fîl

Gege yew prefiks (önek) û yew fîl piya yewna fîlê newî virazenê. Yanî prefiks + fîl = fîlo piyabeste.

Çend prefiksê yewheceyinî: a-, ci-, de-, ra-, ro-, we-, pa-, pê-, po-, tê-, to-.

Fîlê ke hîna zaf nê prefiksan dim a yenê û fîlêdo newe virazenê nê fîlî yê: ameyîne/ameyîş, dayene/dayîş, guretene/girewtîş, kerdene/kerdiş, kewtene/kewtiş, mendene/mendiş, fistene/vistiş.

Prefikso yewheceyin û fîl, mesder (infinitif) de piya nusiyênê.

Nimûne (hetê Dêrsimî de): rabîyayene, rakerdene, rasanayene, raverdene, wekerdene, wedardayene

Nimûne (hetê Pîranî de): akardiş, dekerdiş, dekerwtîş, padayîş, pakardiş, pêşanayîş, pokerdiş, radayîş, rodayîş, ronayîş, têşanayîş, tokerdiş, wekerdiş

Nê fîlî cayan gore di tewirî anciyênê. Tanî cayan de fîl ke ancîno, prefiks fîlî ra ver yeno.

Nimûne: akerd, rakerd, dekerd, pakerd, wekerd, rona

Tanî cayan de zî fîl ke ancîno, prefiks fîlî ra pey yeno:

Nimûne: kerd a, kerd ra, kerd de, kerd pa, kerd we, na ro.

Zeke nimûneyanê corînan de zî aseno, eke antena fîlî de prefiks fîlî dim a bêro, fîl û prefiks -antene de- ciya nusiyênê. Labelê eke antene de prefiks fîlî ra ver bêro, prefiks û fîl piya nusiyênî.

2-prefikso zafheceyin + fîl

Eke prefiks (önek) zafheceyin, yanî yew hece ra zafêr bo, prefikso

zafheceyin û fîl ciya nusiyênê. Yanî prefikso zaf heceyin ze yew çeku, fîl zî ze yew çeku nusiyênê. Bêguman nê her di kelîmeya fîlêdê newî virazenê.

Çend prefiksê zafheceyinî: bider-/bere-/bede-, cira-, tira-/dira-, pede-, pêra-, pêro-, pira-, piro-/pero-, tede-/tedi-, têra-, têro-, tiro-.

Nimûne (hetê Dêrsimî de): pêra bîyayene, pira guretene, piro dayene, piro ginayene, piro kerdene, têra çarnayene, têra kerdene, têro cinitene

Nimûne (hetê Pîranî de): pêro dayîş, bere şanayîş/bede şanayîş, tira kerdiş/ dirkerdiş, pede kerdiş, pêra nayîş, pira kerdiş, piro şanayîş, tede mendîş, tiro kerdiş

Nê fîlî cayan gore di tewirî ancîyênê. Tanî cayan de fîl ke ancîno, prefiks fîlî ra ver yeno.

Nimûne: pêro da, dirkerd, têra kerd, tede mend

Tanî cayan de zî fîl ke ancîno, prefiks fîlî ra pey yeno:

Nimûne: da pêro, gina piro, na pêra

Her di tewiran de zî prefiks û fîl ciya nusiyênê.

3)name/sifet + fîl

Gege name û yew fîl yan zî sifet û yew fîl fîlêdê newî (fîlê piyabestî) virazenê. Nê tewir fîlan de name û fîl zî sifet û fîl zî ciya nusiyênê.

name û fîlî ra

aw dayene/aw dayîş, bare bîyayene, bawer kerdene, ca ardene, dawet kerdene, pars kerdene, pers kerdene

sifet û fîlî ra

berz kerdene/berz kerdiş, derg bîyayene, gird (girs) kerdene, pak bîyayene, sîya kerdene, sûr kerdene, weş kerdene

4)fîl + fîl

amayîne kerdene, amayîne vatene, dayene guretene, dayene kiştene, dayene vatene, dayene wendene, dayene zanayene

Fîlan de menfîyey (negation)

Kirdkî/kirmanckî de fîlî ebe "nê-", "ni-" û "me-" menfî benê. Fîl û "nê-", "ni-", "me-" piya nusiyênê. Nimûne:

nê-: nêweno, nêzano, nêva, nêkerdo, nêveşenê, nêwanena, nêşimeno,

nêantbî, nêşutbî,

nêdekerdbî/denêkerdbî, nêrakerd/ranêkerd, nêrakerwto/ranêkerwto
nêda pêro/pêro nêda, pira nêguret, piro nêgina
weş nêkerd, sûr nêkerd, bawer nêkerd, nêard ca, nêramit ser, nêda wendiş/
wendiş nêda, veng a ci nêda/veynda yê nêda

ni-: nişno/nişkeno/nêşkeno, nizonono

me-: mebere, meke, mevaje, mewane, merake/rameke, meagêre/megêr a,
meraşane/rameşane, wa nêraşano, wa nêdeko/wa denêko, wa nêagêro/wa
nêgêro a, meake, cira mevaje/tira mevaje, sûr meke, bawer meke, meşo war,
veng a ci mede/veynda yê mede, mede wendene, ramekewe/merakwi, wa
nêrakerwo/wa ranêkwo, mewene, wa nêwano

III-EDATÎ (PREPOZÎSYON Û POSTPOZÎSYONÎ)

Kirdkî/kirmanckî de edatî hîrê tewirî yê û çekuyanê bînan ra ciya nusiyênê.
Cêr ra şîma çend nimûneyan wanenê:

1-Prepozisyonî

be ... /ve ...

Ez şêna **be** Diyarbekir.

Xatir **be** to./Xatir **ve** to bo.

Êno **ve** dewe.

Mi îman **ve** pîrê xo ardo.

bi ... /ebi ... /ebe ... /eve ...

Bi peranê xo erînawo.

Ebi des camêrdan rayîr kewt.

Eve dest werd.

bê ...

Bê to ma nêşinê.

Bê wendene menusênê.

pey ...

Pey peran gurey xo viraşt.

ver bi ...

Mêrdek ver bi hêgay şî.

Not: Eke "bê-" çekuyê ra ver bêro û sifetê virazo, "bê-" û çekuyo ke dim a yeno piya nusiye. Na "bê-"ya ke sifetan virazena rolê prefiksî vîna. Nimûne: bêaqil, bêbext, bêçare, bêhêş, bêhêvî, bêkar, bêkes, bênamûs, bêsol, bêşeref, bêveng.

2-Postpozîsyonî

... de/...di/...der/...dir

Lajek tenge de wo./Lajek tenge der o./Lajek tengi di wo./Lajek tengi dir o.

Çanteyê mi di qelemî çinî yê.

Dewe de çi esto çi çin o?/Dewi di çi esto çi çinê yo?

.... ra/... a/... ya

Mi ra pey ame.

To ra girewt.

Ma ra va.

Ez semedê şima ra ameya.

Lajekî lewi keyneki ra day./Lajekî lew keynek a day.

Ez semedê şima ra ameya./Ez semedê şima ya ameya.

... ro

Şiwani bizê xwi ko ro berdê, deşte ro nêberdê.

... ya

Mêrdek di xizmekaran zî kêney xwi ya şaweno.

3-Prepozîsyonî û postpozîsyonî piya

a ... ra

Lajek çinayanê xo dano a xo ra.

beynatey ... di/beyntarê ... di

Beynatey min û to di çî çinê bi./Beyntarê min û to di çîyekî çinê bi.

bi ... a/bi ... ya

Mêrdek bi yew cenê ya amewo.

bi ... bê/ebi ... bê

Keyneki bi fek bê xwi vato./Keyneki ebi fek bê xwi vato.

ede ... de/di ... de

"Xidê Momid, ede raya trêna Erzingan de tasaron bî."

"Tayê cênî, cûwamêrd, domon, eskeronê şuarû day arê, ede Korta Hêmez

de bêrd.”

”Hen eve o qêyde ede dustê bononê Çê Ferê Bilêj de bî vînd şî.”

”Çiqas bon, ede o Estemol de, cawonê bînû de, hemêgê ma ra amê virastene nîno hesavkerdene.”

”Naye ser o ez niştûne ro taxsî, tekî û şûne Hêyder Pasa (Haydar Paşa), mi ede trêne de pêguret.” (Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, r. 83, 96, 104, 205, 209)

pey ... ra

Mêrdek pey berî ra vejîya.

ve ... ra/bi ... ra

Ez ve to ra pîya some.

IV-HÛMARÎ

Kirdkî/kirmanckî de vatişê tanî hûmaran de ca ra ca ferq esto. No kombiyayîş de ma hîna zaf vîst hûmaranê verînan ser o vindertê.

Hûmaranê ”yew” ra heta ”des”î (1-10) ser o meylê kombiyayîşî: yew, di, hîrê, çar, panc, şeş, hewt, heşt, new, des.

Formê bînî: yo/jew/jû/zû, didi, hîrê, çeher/çihar/çor, panj/ponc/ponz, ses, hawt/hot, heyşt, no, des.

Hûmaranê ”yewendes”/”des û jû” ra heta vîstî (1-20) ser o di meylî bîy. Meylê nêmeyê amadebiyayoxan (kesanê haziran) û nêmeyê bînî ciya bi.

Meylô yewin: yewendes, diwêş/duyes, hîrêş, çarêş, pancêş, şiyêş, hewtêş, heştêş, newêş, vîst.

Meylê diyinî gore, merdim şîno ebi nê her di formanê cêrînan binuso:

a) yewendes, diwêş/duyes, hîrêş, çarêş, pancêş, şiyêş, hewtêş, heştêş, newêş, vîst.

b) des û jû/des û jew, des û didi, des û hîrê, des û çar, des û panc, des û şeş, des û hewt, des û heşt, des û new, vîst.

"De vaji Margos, ti kotî ra yî?"

Migirdîç Margosyan

Qeçkeya mi di, eki kes hina rast vajo gama ki qama mi hema yew vincew bî, demewo ki ez teyšan bînî, ebi gindirbiyayişi, ebi bulikî, zor ebi payraşiyayişi mi xwi dayka xwi resnaynî, pêşê fistanê yay ê çîtinî tepîştinî û hetanî ki mi ra ameynî mi kaş kerdinî û waştinî vaja ki ez teyšan biya. Mi no vatiş, ebi yew ziwano ki mi bi xwi îcad kerdbi, vatinî:

-Bu, ba, bua!

Dayka mi fahm kerdinî, zanaynî ez çî fekê xwi di bilbilêna. Mi dayka xwi banderê ziwane xwi kerdbî. Yay zanaynî gama ki mi va "bu, ba" tira pey ez dest pakena vana "bua, bua, bua", eki goş mi nêna ez dest bi zurriki kena; rayna yay zanaynî ki mi yew ray dest bi bermî kerd ez lezalez nêvindena. Cuwera cadi tasa ma ya qelakerda girotinî, dori ra biney aw dekerdinî û mi fek a naynî. Eki karê yay vêşî bibînî, ma vajî eki kişlonî ser o, semedo ki nêqesîyo, doyê germa duveni biviyarnaynî (têw bidaynî), eki şit adirî ser o bibînî û kela şitî şiyayişi ser o bibînî yan zî eki ay hing di mîr bielawitinî, yew hewawo lezkanî tasa ki aw dekerdibî, mi dest a naynî û vazdaynî karê xwi ser. Wezîyetanê anasarênan di, yanî gama ki tas gillî ra aw bî û seredê mi ra girdêr bî û mi ganî tira aw bişimitinî, mi nêmey aw xwi ro kerdinî û ebi abi hewa, bê ki ez biwaza, mi tikê serey xwi zî şutinî.

Demewo ki ez veyšan bibînî, bê ki ez metodanê xwi bivurîna (bibedelna) mi dayka xwi dînî û pêşê fistanê yay kaş kerdinî, mi pîrnîkê xwi antinî û seki bermi mi qiriki ro bipêşîyo, ebi ay vengî, veng daynî:

-Pe, pe, pepe, pepe!

Mi ferasetê dayka xwi ra şuphe nêkerdinî. Ay rojo ki ez amebiya dîna, mi

çimanê dayka xwi ra fahm kerdbi ki ya gelekî biaqil a û ziwane mi zî gelekî lezi musaya. Demewo ki mi bivatinî "pepe, pepe" yay a gami fahm kerdinî ki ez vana "ez gêsti mirena". Hema gama ki nêmey qiseya "pepey" fekê mi ra biveciyanî, yay zanaynî ki ez sey tûtî (papaxanî) hinzar rayî eynî çîy pê ser o vana; semedo ki zanaynî ki ez peynî peynî yay teqena, hema lezi ver bi banê peyenî (mêneb) şînî, textaya ki teştê ma yê sifrênî yê girdî ser o bî hewa naynî, yew letey nanî girotinî, texta reyna teştî ser naynî, seki "pepey" bika çimanê min ê veyşanan, mi dest a naynî. Ez seki caran mird nêba, ebi ay hewa mi "pepe" kotinî. Nika şima sey namedê xwi zanî ki "pepe"yo ki ez qalê yê kena nan o.

Gege gama ki mi bîlla sebeb pêşê fistanê dayka xwi kaş kerdinî, yay cadi fahm kerdinî ki ez nika dest pakena vana "pepe, pepe". A hili ez xwi veriki naynî, lewî mi ra daynî û ez berdinî metbaxa ma ya heray a ki qulçikê hewşî di bi; ez kursiyê hemamî ser o roşanaynî û yew uskuraya xişni mi ver di ronaynî. Dim a pêlekê mastê bêtalihî yo ki hinzar rayî poşman biyo ki ameyo dina, pêleko ki hetanî peyniya emrê xwi ganî leqnaye bimana, çangalî ra ardinî war; lay pêlekî sist kerdinî, fekê yê akerdinî û kewçika darêni reydi biney mast -eki kes rast vajo, no mast semedo ki awa yê neselaybî, hest bibi, bibi mastê pêlekî- vetinî, ebi tulumbaya keyeni a bîrê miyanê hewşî ra aw antinî û biney aw kerdinî mastî miyan, ebi kewçiki yew hewawo weş têdaynî, kew kewtinî doy ser, tira pey yew letey nanî girotinî do di fereknaynî. Uskura di nano wişk û do pê şa bînî, keyfan ver nan weferaynî û hema hema ki uskura ser di şînî. Hinî gama ki nan û do yan zî şorba nanî hadire bînî, semedo ki mi nîşaynî bipawa, mi sebir nêkerdinî, mi ebi yew hewawo lezkanî uskura antinî xwi ver û weşanaynî bide; sere û çimê xwi tede verdaynî û norûdor ra çirçî kerdinî. Dayka mi ebi keyfweşey û ebi baldarey mi ra ewniyanî. Tira pey ez ca verdaynî û şînî gurey xwi kerdinî: ya teştê cilan ver di ronîştinî ya xelevicînanî ya zî siski viraştinî.

Şima rasti persî, ay wext yanî gama ki ez hema yew vîncew biya, mi nê çîy heme nêzanaynî, fahm nêkerdinî. Mi tena karê dayka xwi yê hergû rojinî yew hewawo matmende temaşe kerdinî. Nika ma qandê Hûmay rê rast vajî! La mi çi zanaynî ki dayka mi kincan şuwena, mi senêwa û kotî ra zanaynî ki dayka mi xînçanê werdiyanê ki Şeytanî kerdbî xelî miyan vicînena? Nay ra teber mi xelevî nas nêkerdinî. Hetta mi nêzaynî ki "pepe"y mi xelî ra virazêno.

Ebi wardişê nanî û şimitişê aw mi qam eştinî, ez pîl bînî. Ebi qama mi, hûmarê dindananê mi zî vêşî bînî. Esas ganî ez vaja ki ay rojan di mi derheqê hûmaran di zaf çî nêzanaynî. Gama ki ez vana dindanê mi vêşî bîyî, ez wazena vaja ki mi nanî ra teber dest pakerdî iskişî, dendikê gozan, bastêx û kesme zî cawitinî.

Hetî ra dindanê mi bînî vêşî, heta bîn ra zî hêdî hêdî herunda vateyanê ki

mi falmedê xwi ra vetbî, vateyanê ziwane mi girotinî. Mi dest pakerd ”pepe” ra armenkî ”hets” û aw ra zî ”çur” va.

Gama ki ez di-hîrê serra biya, aw û nan ra teber hema hema ki eynî rojan di ez yewna kelîma musaya. Na kelîmaya newa ez bawkê xwi Sikey ra musaya. Halbuki ez namey nanî û aw dayka xwi ra musaya.

Demewo qama mi di vincewî bî, bawkê mi ez girotinî verika xwi, çokanê xwi ser o roşaynaynî, destê xwi porê mi ro, ridê mi ro kerdinî û persaynî:

-De vaji lacê mi, ti kotî ra yî?

Eki kes rast vajo ay rojan di mi nê qiseyanê bawkê xwi ra çiyekî fahm nêkerdinî. Raştay yê, mi nêzanaynî ez ganî (gere) na persa bawkê xwi ra çî fahm biko û mi nêzanaynî ganî ez çî cewab bido yê. Dêka mi Kure Mama, a pîra nêwenda, rojo ki dêkeya mi kerdbî, hema ay roj ebi ardimê tecrubeyanê xwi yê serran, şiklê seredê mino ki kuy mendinî ra yan zî bêşikleya seredê mi ra ewniyaybî, hêdikî goşdê bawkê mi di vatbi ki ez zaf biaqil nêbena, hetta vatibi beno ki ez biney kemaqil ba zî; herçiqas ki yay ebi inhewa mizgîna verîni daybî bawkê mi zî, yê zaf goş nê qalan nênabi, hetta pîzzedê xwi di vatbi ki beno ki qutiya burintî ya sêmên a ki heze xelaya dêkey daya Kure Mama qey weş bê yay nêşiya; heta bîn ra zî bawer kerdbi ki bindi hêş seredê na pîri di nêmendo cûka nê qalanê bêfesalan kena. Cuwera qando ki mi banderê çîyanê newan biko, çî dest ra ameynî apey nêdaynî. Bê ki qama min a di serra ra biwaniyo, to vatinî qey Încîlê Pepaz Der Arsenî ver di suwend werdo, qando ki kelîmaya hîrina ki gore bê yê hunkifê kelîmanê nan û aw bî, banderê mi biko qewqezaynî. Demewo ki mi awa vava ya hewşê ma ya lêşini reydi kay kerdinî, demewo ki mi kila binê ardî reydi tereqaynî, demewo ki mi çaringê ki şeqalê dêsê banê ma di halin viraştbi fetelnaynî, hema bawkê mi ez girotinî verika xwi û ez rast berdinî kujê sedîrî yê corênî, xwi hetî roşanaynî; destê xwi por û ridê mi ro kerdinî û persaynî:

-De vaji Margos, ti kotî ra yî?

Tira pey zîq miyanê çîmanê mi ra ewniyaynî û ebi peşmiriyayiş cewabê persa xwi yê bi xwi daynî:

-Herîdan^(*) ra!

Mi zî seki Kure Mama nêva, ne çiyê ki bawkê mi vatinî mi fahm kerdinî, ne zî mi zanaynî ez se vava. Ez wina matmende ewniyaynî ay çîmanê yê yê sîyayan ra ki mi ser o bîy, ez seki vateyanê ki fekê yê ra vejîyênî reydi kay bika, hewaynî. Hewayîşê mi ser o bînî tîqtîqa bawkê mi, tira pey ageyraynî û yew hewawo ciddî vatişê xwi tekrar kerdinî:

-De vaji, vaji Herîdan!

Hinî wexto ki qama mi bîbî hîrê vîncewî, rojê gama ki fekê mi ra, herf bi herfi, hece bi hece ”He-rî-dan” vejiya, bawkê mi verî goşanê xwi ra bawer nêkerd, la dim a gama ki eşnawit ki ez xwi rê na kelîma reydi seki kay bika, ez pê ser o, pê ser o vana; endî keyfê yê ame ki, ez vana qey ay rojî ez biyo sebeb

ki keyfen ver hesrî çimanê yê ra bêrî. Hergû raya ki na kelîmeya ki mi menay yay nêzanaynî, la roj bi roj hina weş bê mi şînî, mi vatinî, bawkê mi ez ebi keyf û şayî girotinî verika xwi, lewî alişkanê mi ra, çaredê mi ra daynî, ez sînedê xwi ro şidênaynî û cadi çiyê werî taneka xwi ra vetinî, daynî mi. Çiyê ki daynî mi gege yew wirdêsa fistiqaşê şamî, çend fistiqê entabî, dendikê vaman, findiqî, gozî, dendikê vamanê şekerinan, lebleboyê şekerî, iskijî, mişmişê wişkî, sayê wişkî, bastêx, tuyê wişkî, încilê wişkî, alunçey û sewbî çiyê anasarênî bîy. Mi nê çiy heme werdinî, yê dest por û ridê mi ro kerdinî; ez bibiba sey kutikanê Pavlovî. Hergû raya ki bawkê mi ez girotinî verika xwi yan zî ez xwi ver di roşanaynî û destê xwi porê mi ro kerdinî û dim a eştinî taneka çakêt yan zî yelegê xwi ki cay çiyê bido mi, mi hinî zanaynî perso ki mi ra perseno çi yo. Xwira yo zî bê ki erey bikewo persaynî:

-De vaji ma veynî şêrê mi, ti kotî ra yî?

Çimê mi taneka bawkê mi di, mi cadi vatinî:

-Herîdan ra!

Mi hîrê kelîman ra vîşêr nişaynî sewbî çiy ezber bika, la nê hîrê kelîmeyê ki mi ezber ra zanayanî, sey suxtanê ki dersê xwi fek ra wanenî, bê ki ez erey bikewa, bê ki ez şaş bika û xwi ra zaf bawer, mi pê ser o, pê ser o sey tûtî, vatinî. Hergû raya ki mi vatinî "Herîdan ra" bawkê mi zî ebi keyfê bêhesabî û pîzze ra şabiyayîşî reydi, seki biwazo derheqê mi di şaşfikiriyayîşê Kure Mama îspat biko, veng dayka mi daynî:

-Xino, bigoştari veyni, vatişê lacê mi bigoştari!

Dayka mi zî seki caran nê vatişê mi nêşnawa, seki bincaran xebera yay çinêba ki semedo ki bawkê mi mi banderê na kelîma biko şew û roj xebetiyayo, ebi ay hewa ameynî heta mi ra û ebi hewayîş persaynî:

-Dayka to to rê heyran, vaji ma veynî paşay mi, ti kotî ra yî?

Bînî tîqtîqa mi û mi dayka xwi rê hina vêşî nazî kerdinî û vatinî:

-He-rî-dan ra...

Hesrê dayka min ê keyfan ver, şînî hesranê bawkê mi ser û herdiyan destê xwi alişkanê mi ro kerdinî û nêzanaynî mi rê se bikî, vatinî:

-Eferim, eferim, ti kalik û pîrik bibî!

-Ti hinzar serre bî lawo! Ti pîl bibî, hinzar serri biciwî û şêrî Herîdano ki ma te de dayka xwi ra bîy, bivînî!

Mi no şabiyayîşê dayk û bawkê xwi, ebi ay halê xwi yê qeçeqey, tey vetinî, labelê mi weş fahm nêkerdinî ki derdan ver yan zî keyfan ver hesrî alişkanê yînî ra herrikiyênî.

Yew deme ra pey axrikî hûmara dindananê fekê mi, bîy hinda muyanê kejan ê erîşa cîranê ma Xal Sagoyê Qeççiyê Kosî yê ki nê muy bi nête erîşi verra daybî û ebi yînî paye kerdinî. Ay wext mi hinî şiyaynî gozanê pêtan ê Sêwregî, vamanê tamweşanê vamêranê veradê Koyê Dayk Meryemi -nizdî Erqenî yo- ki dewijanê Kurdan ê ki bawkê mi dindanê yînî antinî gege xwi dest

di ma rê ardinî, ebi dindananê xwi bişikna û sey meymunan zerey yîni veja û deka dennedê xwi. Nika hinî semedê guranê anasarênan, seki mi verî kerdinî, ez yew demewo derg û dila kuçaya ma di qandê vînayîşê yew siya munasibi veng ra nêgeyranî, wext vîndî nêkerdinî. Çimkî mi hinî zey namedê xwi zanaynî ki dindanê mi siyanê pîranê giloveran ê "Direkçi Sokağı" ya Xançepekî ra pêtêr û qasidiyêr î.

Kure Mama çend şîna wa vaja ki ya hinda muyanê porê xwi yê sur û heneyinî wayirê tecrubî û ehlê karê xwi ya, zey pepazê kilîsedê ma Der Arseno ki Încîlî fek ra waneno ya zî çend tira yeno wa vaja ki ez qeçekan pîzzedê dayka yîni yê şinikî ra yew ray di ancena, hetta wazena wa vaja Der Arsen nîşno Încîlî verapey biwano la ez ebi hunerê xwi pitanê kemaqilanê ki herunda ki serî ser o bêrî qini ser o yenî, hina weş xelesnena; çend tira yeno wa inhewa wazan bida û vaja hunerê mi dayeyê Hûmay o; hetta hema rojo verîn ra tena şikil û şemalê seredê mi ra ewniyayîşî reydi çend şîna wa hukmê xwi bida û vaja "no yewdo ehmeq o"; çend tira yeno wa vaja ki ya teşhîskerdişê meselanê anasarênan di caran xeletay nêkena; welhasilî kelam ya wazena wa biberma, wazena wa bihewa, ez seki Kure Mama biteqna, hinî sey namedê xwi zana ki: yew fotografê bawkalê min Migirdîçî yo ki bawkê mi zî vîrî nîno û namey yê mi ra nawo, dêsê banê ma yê çîvîtkerdeyê kerpîçinî ra leqnaye yo û no yew fotografê qijî ver ra amebi girdkerdiş û nêmedê riyê yê di ebi herfanê erebkî kam çi zano namey kam memurê dewleti nuştebi; bawkalê mi ebi serran, binê fesi ra ebi ay çimanê xwi yê sîyayan yew çarçeweya lêmini miyan ra ma ra ewniyaynî; datê mi Apraham ki bawkê mi semedo ki vîran ra nêşêro namey yê birayê min ê pîlî ra nabi û ebi paye hil û gami qalê yê kerdinî û vatinî "kekoy min ê pîlî Xarpêt di kolej wendo", rayna ez zana di datê min ê binî, Nîşan û Xaçedur, "Kafle" di rayirê Ruha di nêweşî ver û ebi perçanê şerapnelanê topanê frensizan verika dayka xwi di merdbî; de ez kamî vaja kamî nêvaja! Nê heme ay rojanê tarîyan ê Cengê Cîhanî yê Yewinî di veşaney, nêweşey, zor û zehmetey ver, xerîbey di, beno ki Şam di, Heleb di, Dêrezor di, rayîranê derd û belayinanê Anadoluy ki ne vernî ne peynîya yîni bîy; deşta Ruha, Entab û Edena di vîndî bîy, şîy û şîy. Seki dayka mi gege ebi kurdkî vatinî "berdan berdan" bîy. Yanî hergû yew hetî ra şîy û vîndî bîy. Dim a, nê "berdan berdan" biyayeyan ra qorrînî, çîyo ki tira vajiyêno nuştişê çarî yo ki kes nêzano ebi kam ziwani û kam elfaba nusiyayo, labelê sayede nê qederî di -hema zî yeno bawkerdiş ki çareyan di nuşte yo-yewbinî dîyo. Labelê mergê dayk, bawk, way û birayan wa ewca mano, cayê yîni yê ki yîni qeçekey di ca di verdabi, cayo ki timûtim bêriya yê kerdinî, yanî dewa yîni Herîdan, caran yîni vîr a nêşibi; vîrakerdiş wa ewca di mano, no ca hêşê yîni di newe ra ganî biyo û mezgê yîni di biyo se neqîş, zerra yîni ser o biyo yew zîyara muqeddesi û biyo yew halîno mubarek.

Û Herîdan bibi yew dalpa gonîya ma û reyanê ma di herikiyaynî. Nanê ma

biney Herîdan bi, awa ma Herîdan. Rašta zî engura ma, bastixê ma, vamê ma, ebi kilmey heme çîyê ma yo weş, şîrin û lezzetin biney Herîdan bi yan zî buya Herîdanî ti ra ameynî.

Dayka bawkê mi Saroy vatinî: "Nê incilî zaf şîrin î! Tamê yînî incilanê Herîdanî maneno." Semedo ki dindanê yay heme kewtbî, incilê tezey û nermî ebi goştê herunda dindananê xwi wardinî.

Dayka mi mîr teştê sifrên ê qelakerdî di elawitinî û seredê mi ser naynî ki ez bera firni di bipewja, gama ez ki firni ra ameynî, semedo ki pey keyfê mi biyara û seki yew xela bida mi, esas şîma rasti bipersî semedo ki nê suxran bi mi bida heskerdiş, yew çengê tuyanê wişkan dekerdinî taneka mi û goşê mi di vatinî:

-Nê tuy zaf weş î. Zey tuyanê Herîdanê ma şîrin î. To vîrî yeno mi to ra vatbi, a tuyera ki ez şîbiya ser û tira kewtbiya war û mi polê xwi şikitibi, eynî zey tuyanê a tuyeri... De bigîri biweri!

Ez ay serran di kuçanê Diyarbekir di, ebi eşnawitişê cumleyanê anasarênan pîl biya: "sey tuyanê Herîdanî", "sey mirvanê Herîdanî", "na aw zaf serdin a, eynî zey awa Meleyniyê^(***) Herîdanî", "biewnî na aw ra, ti vanî qey eyniyê Zakarî ra yena."

Semedo ki ez pîl biya ez ze çirax erşawita xalê min ê kureçî hetî. Xalê min o ki ebi ereqê çaredê xwi nanê xwi vetinî; ay ereqê yê yo ki verî çaredê yê di pêser bînî û dim a dalpey kerdinî orsê kureçiyey ser û asinê surbiyayeyî ra cadî bînî bux zî, biney buya Herîdanî daynî. Xalê mi şarê dewan reydi ya kirdaskî ya zî kirdkîya ki Herîdan di musabi qisey kerdinî. Mêxê nalan ê ki yê bi xwi viraştinî ebi kirdkî destê dewijan rê yew, di, hîrê hûmaritinî. Dim a şarê ay cayan ra, Herîdanî ki tede dayka xwi ra bibi, la ca di verdabi, nêşiyabi qeçkekeya xwi ewca di viyarno, persaynî; cewabê ki girotinî, gege ridê yê di bînî hewayiş, gege peşmiryayiş, gege zî bînî kederêk. Ebi bîrî û hesreta Herîdanî ki zerra yê ra nêveciyaynî, orsî ver di, çakuç dest di, asinê surbiyayey têkutinî, tira sirsî, vaştirî û damê luyan viraştinî.

Mi rê wina ameynî ki xalê mi ay sirsî û vaştirî ki vîşaney yînî bi destê xwi viraştinî, bêriya serran ver seki bierzî xwi paştî û ray mano şêro, lujineyê ki koyan û zinaranê Herîdanî miyan di mendîbî biramo; xeleyê zerd ê serediyayey, cewî, gilgilî reyna ebi vaştirîyan û kelendiranê têjan ki yê bi destê xwi viraştî, biçîno. Dim a seki şalaganê hebî wegîro bero biko banê peyenê bawkê xwi, pîrr biko. Eynî seki verî bawkê dayka mi Xaloy, yan zî ebi name bê xwi yê raştikênî Garabetî kerdinî.

Rayna mi rê wina ameynî ki xalê min o ki demewo ki mi nexaf antinî ez ewniyaynî polanê yê yê hêzînan ra û mi hesri pîro antinî, gama ki ebi derbanê çakuçî hinî şiklo peyen daynî asinê surbiyayeyî û awa serdini ro cenaynî û aw ra "kijj" veng vejyaynî, damanê bêhesaban ra ki hetanî ewro qandê verg, luy û hargûşan viraştibî ra seki yew bigiro û yew rojê zimistanî rast ver bi koyanê

Herîdanî vazdo, serd û pûkê û vewri di şîro seyde luyan.

Herîdan, Herîdan, Herîdan, wecaxê bawkî, verika dayki!... Yew qewm ebi erz û eyel to ra qerteliya, to ra ame qile'ynayîş, berdan berdan bi. Labelê caran ti xwi vîr a nêkerdî, nişiyay xwi vîr a bikî. Ti lewan di bîy muçî, peşmiriyayîşî di hezn, zerri di bîy bêrî. Ti bîy xeml û xêzê heddanê gorrîstanî, bîy neqşê yînî.

Herîdan, Herîdan, Herîdan!... Ma ay heddan ra, ay xaçanê mermerinan ra yewda newa hema vizêr Şîşlîya Estembulî di berzîne gorê bawkê mi, Sikî ser o rojanay. Ma nê xaçê mermerinî ser o ebi herfanê armenkî çîyo ki ma bawer kerd yo hetan hetanî pey şa beno, nuşt:

”Sarkîs Margoso Herîdanij, 19.11.1989”

Tirkî ra tadayox: J. Espar

(*) Herîdan: Yew dewa qeza Pîranî (Dicle) ya. Dewleta Tirkan namey na dewi kerdo Kırkpınar. (J. E.)

(**) Gore bê vatişê Hacîyê Herîdanijî, namey eyniyane Herîdanî wina yo: 1.Eyniy Xeyrî 2.Eyniy Dabo 3.Çirriki 4.Melemî 5.Warey Luy 6.Kûrrnî 7.Hewrêr 8.Derey Xiyûnek. (J. E.)

Konferanseke navneteweyî

Kurd û bajar (The Kurds and the City)

Bi pêşengîya kurdnasên wek Joyce Blau û Martin van Bruinessen û bi alîkarîya çend zanîngehên Fransî û Hollandî di terîxa 19-21 Îlon 1996'an de li bajarê Sewrê li Fransê konferanseke navneteweyî li ser Kurdan pêk hat. Vê konferansa bi navê *Kurd û Bajar* (The Kurds and the City) sê rojan ajot û qasî 31 kurdnas û nivîskar tevî konferansê bûn û gotarên xwe pêşkêş kirin. Ji aliyê din gelek mêvan û guhdarvan jî tevî konferansê bûn. Ev konferansa yek ji wan konferansên serfiraztirîn bû ku heta niha li ser Kurdan hatine çêkirin. Ew kesên ku di konferansê de gotarên xwe pêşkêş kirine, ev in:

- 1) **Martin van Bruinessen** (Utrecht, Berlin): *Di Împaratorîya Osmanî de bajarên "Kurd": destpêkeke kurd*
- 2) **Wolf Hutteroth** (Erlangen): *Di sedsala 16'an de bajarokên herêma Başûra Dîyarbekirê*
- 3) **Evgena Vasileva** (St. Petersburg): *Aborîya polîtîk ya Sanandajê li Emîreta Ardalanê*
- 4) **Mirella Galletti** (Bologne): *Bi çavên gerokên Ewrûpî bajarên Kurd*
- 5) **Olga Jigalina** (Moskova): *Berî sedsala bîstan li Kurdistana Îranê bazirgan û xwediyên erdê*
- 6) **Abbas Welî** (Swansea): *Bajarekî Kurd li Persîya Qacar: Kermanşah*
- 7) **Florence Hellot-Bellier** (Paris) : *Di destpêka sedsala bîstan de li Urmîyê xirîstyan û misilman: biratîyeke dînî ya nû*
- 8) **Rohat Alakom** (Stockholm): *Di destpêka sedsala bîstan de cimaeta hemalên Kurd li Constantinopelê*
- 9) **Thierry Zarcone** (Taşkent): *Di salên nûjen û hevdem de pizmamtîya biratîyên dînî yên sufî li Îstenbolê*
- 10) **Mustafa Aslan** (Aix-en-Provence) : *Sazîya civakî li sê bajarên Kurdan: Qamişlî, Nurcîn û Kahta*

- 11) Hamîd Bozarslan (Berlin) : *Li bajarên Kurd seferberbûna polîtîk*
- 12) Şamîl Eskerof (Baku): *Dîroka bajarê Kelbajar: Paytextê xwemuxtarîya Kurd li herêma Laçîn (Kurdîstana Sor)*
- 13) Mirazê Uso Ceferof (Tiflîs) : *Jîyîna civakî û çandî ya Kurdên Tiflîsê*
- 14) Kinyaz Mîrzoef (Almata) : *Cimaeta Kurd li Almata*
- 15) Nelida Fuccaro (London) : *Kurdên Şamê di bin hakîmîyeta Fransayê de*
- 16) Kemal Mezher Ahmed (Bexda): *Di navbera herdu şerên cîhanê de Kurdên Silêmanîyê û Bexdayê*
- 17) Michael M. Chyet (Waşîngton): *Gelo Kurmancîke bajarî heye?*
- 18) Joyce Blau (Paris) : *Pêşketina edebîyata Kurdî li bajarên Kurd*
- 19) Tanya Tuncker (Bale, Paris): *Di edebîyata Kurdî de bajar*
- 20) Maria O'Shea (London) : *Pêşketinên stîlên kincên Kurdan yên bajarî li Sanandajê*
- 21) Annabelle Böttcher (Şam) : *Pêşengên Kurd yên Kaftarîyaya - biratîke dînî ya Neqşîbendî li Şamê*
- 22) Mehmed Tayfun (Stockholm): *Çalakîyên Komela Kurd ya pêşîn - Kürd Te'avûn ve Teraqqi Cemiyeti - li Îstenbolê û bajarên mayîn*
- 23) Pauline van Gelder (Amsterdam): *Di salên 1990'î de Dîyarbekir*
- 24) Ali Babakhan (Paris): *Kurdên Feylî li Bexdayê*
- 25) Andrea Fischer (Leipzig): *Koçerîya bi zor berbi mucamma'at (kampên berevkerîyê) li Kurdîstana Iraqê*
- 26) Christine Allison (London): *Mucamma'at (kampên berevkerîyê): tîpeke nû ya cimaetê li Kurdîstana Iraqê*
- 27) Michiel Leezenberg (Amsterdam): *Partî, patron û protesto: dirûvên civakî û polîtîk yên bajarîyê li Kurdîstana Iraq*
- 28) Issam al-Khafaji (Amsterdam): *Piştî zîyadebûna petrolê li Kurdîstana Iraqê dewlemendên nû*
- 29) Shahrzad Mojab (Montreal): *Jin li bajarên Kurd li Îranê*
- 30) Nazad Bekighani (Paris): *Malbatên bêmêr li Kurdîstana Iraqê*
- 31) Heidi Wedel (Berlin): *Di sala 1990'î de jinên Kurd li Îstenbolê*

Bangek ji bo 1'ê Îlonê

Sekreterê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, Rohat Alakom ji bo munasebeta 1'ê Îlonê di 26.8.1996'an de daxuyaniyeke çapemeniyê belav kir. Di daxuyaniyê de di pey behsa kirinên dewleta Tirkîyeyê li hember azadiya fikrî û mafên mirovî, ji bo bicihanîna hin wezîfeyên nivîskarên Kurd û Tirk weha tê gotin:

"Eger platformeke aşîyîyê di nav wan de saz bibe, bêguman ev yeka wê li ser raya giştî bandûreke mezin nîşan bide. Di vî warî de çend gavên giring û kêrhatî hatine avîtin, em van xebatan bi baldarîke mezin ve teqîb dikin. Êdî gelek caran peyvên nivîskar û aşîyîyê li bal hev tînin bi kar anîn û ev herdu peyv gazî hev dikin. Bi rîya aşîyîyê dawîhatina wan grevên xwebirçîhîştinê de û di xebata bi rîyeke aşîyîyê çareserkirina pirsê Kurdan de çend nivîskaran pêşengî kirin, ev hewldayînen dîyalogê, me gelekî dilşad dikin.

Komela me - Komela Nivîskarên Kurd li Swêdê qîmetekî gelek mezin dide toleransê, dîyalogê, aşîtî û pir-çandîyê. Divê em careke din bidin dîyar kirin ku em timê piştgirtîya van xebatan dikin. Di van rojên ku 1-Îlonê wek roja aşîyîyê tê pîroz kirin, em hemû zordestîyên polîsî û leşkerî yên li dijî nivîskar û hunermend, rojnamevan û kesên ku di zîndanên Tirkîyê de ne, bi hemû hêza ve rûreş dikin û ji raya giştî re didin dîyar kirin ku em timê li bal wan in, ev wazîfa me ye.

Ji hemû nivîskarên Tirk û Kurd re! Werin em hemû bi qelemên xwe ve, van çek-sîlahên ku jîyan ji gelê me re kirine jehir, bédeng bihêlin. Werin em ji bo cîhanê ku çek-sîlah li wê derê pas bûne û li şuna wan qelem deng dikin, seferber bibin."

Medyaya Kurdî û hin problemên wê

Komeleya Nivîskarên Kurd

li Swêdê di roja

5.10.1996'an de li

Stockholmê li

Medborgarhusetê bi

navê "Çend pirsên

teorîk ên dîroka

rojnamegerî û

edebiyata Kurdî"

semînerê çêkir.

Semîner ji aliyê Emîr

Hesenpûr hate dayin.

Hesenpûr bi awayekî

giştî li ser hin pirs û

pirsgirêkên medyaya

Kurdî sekîni û li gor

lêkolînên xwe yên li

ser vê babetê hin

mîsalên balkêş dan.

Hesenpûr li ser

têkiliyên modernîzmê

û medyaya Kurdî jî

sekîni.

Di beşa duyem de

beşdaran hin pirs

pirsîn û li ser hin

nêrinên Hesenpûrî

dîtinên xwe anîn

ziman. Emîr Hesenpûr

nuha li Kanadayê li

Unîversîteya

Torontoyê wek

lêkolîner kar dike.

"Şerê birakujiyê dilêşiya me zêde dike"

Komîteya Kargêr a Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê di roja 10.9.1996'an de li ser şerê birakujiyê ku li Kurdistanê Başûr bi hin rûdanan gihişt merheleyeke nû, agahdariyeye çapemeniyê belav kir. Di agahdariyê de di pey behsa rudanên dawiyê û hin têkiliyên PDK (Partiya Demokrat a Kurdistanê)'ê û YNK (Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê)'ê ku wek sebebên şer tê nîşandan, ev daxwaz û pêşniyar tên kirin:

"Bûyerên dawiyê ku di gel hin zirarên din bûn sebebê koçkirina bi dehhezaran kurdan, wekî her kurdê/a ku rûmeta destketinên Kurdistanê Başûr baş dizane, xemgînî û dilêşiya me jî zêde dikin. Sebeb çî dibe bila bibe, em dijî hemû babetên şerê birakujiyê ne û li gor baweriya me bi riya aştiyê çareser kirina pirsan riya herî baştir e. Herweha şaşiyeye mezin e ku di rewşeke weha hessas de hêzên dewletên ku Kurdistan dagir kirine bi daxwaz an alikariya hin hêzên Kurdistanê têkilevê pirsên navxweyî yên kurdan bibin. Pir mixabin di vî warî de çewtiyên balkêş hene û ev, zirarên mezin didin pirsê kurdî.

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, bangî PDK û YNK'ê dike ku li ser bingeha parastina berjewendiyên neteweyî di wexteke herî nêz de werin gel hev û pirsên xwe bi riya aştiyê çareser bikin. Girtiyên ku di destê PDK'ê de ne divê bîn berdan. Mal û canê kesên siwîl divê bê parastin û rê naye dayin ku hêzên Îraqê li dijî hin kurdan û mixalifên din operasyonan bikin."

Li Kurdistanê Rojhilat rewşa xebata kulturî

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê di roja 11.8.1996'an de li Stockholmê li Medborgarhusetê li ser li Kurdistanê Rojhilat û Îranê rewşa xebata kulturî semînerê çêkir. Semînerdar, Mihemed Salih Îbrahîmî bû. Salih Îbrahîmî di destpêkê de behsa tesîrên îslamiyetê li Kurdistanê kir. Li gor Salih Îbrahîmî, di Kur'anê de jî bi awayekî îndîrek behsa Kurdan tê kirin. Salih Îbrahîmî behsa xebatên kultura Kurdî yên ku li Mehabadê, li Urmîyeyê û Tehranê bi awayekî êşkere tên meşandin, kir. Kovarên Awêne û Sirwe perçek ji van xebatên kulturî ne. Di beşa duyem a semînerê de guhdaran pirsên xwe pirsîn û dîtînen xwe anîn ziman. Mihemed Salih Îbrahîmî nuha li Tehranê li unîwersîteyê mamostetiye dike.

ERZAN-ERZANÎ, ERZAN-ERZANÎ, ERZAN-ERZANÎ, ERZAN-

PENCÎNAR

ÇAPXANE û Weşanxaneya Çanda Kurdî

- Îmkaneke taybetî ji bo çapkirina pirtûkên bi zimanê kurdî: Nivê biha pêşin û nivê din bi dabeşiya şeş mehan.
- Tiştên ku têne çapkirin: Pirtûk, kovar, belavok, broşûr, zerf, kaxezê nameyan û her cûre qert.
- Pirtûkên kevn têne tamîrkin û qab ji her cûre pirtûk, kovar, rojname û belgeyên kevn re têne çêkirin.
 - * Ji bo pirtûkên folkori, %10 erzani heye.
 - * Ji bo endamên Komela Nivîskarên Kurd û sazgehên kulturî, %5 erzani heye.

Tel: 08-372601

Rojên kar: Dûşem-În, saet: 13⁰⁰-17⁰⁰

Navnîşana Postê: Box 3088, 161 03 BROMMA
Navnîşana Serdanê: Grundtvigsgatan 25 NB,
BLACKEBERG

Bac (mons) %25 îe stendin

Ji Weşanên APEC`ê 4 kitêbên zarokan yên nû

Ji zarokên xwe re kurdî bixwînin û bidin xwandin!

GUNILLA WOLDE گونبلا فولده

TÛTE XANÎ ÇÊDIKE

توتە

خانوو دروست دەکات



APEC



GUNILLA WOLDE

گونبلا فولده

YEKEMROJA EMMAYÊ LI KREŞÊ

یه‌کهم رۆژی تێمما
له باخچهی منداڵان



APEC

GUNILLA WOLDE تێمما و برا بچکۆله‌کهی

EMMA Û BIRAYÊ BIÇÛK گونبلا فولده



APEC

GUNILLA WOLDE گونبلا فولده

TÛTE PAQIJİYÊ DIKE

توتە

گسک دەدات

APEC



Her kes û dezgehên ku ji 10 an zêdetir kîteban bikirin, ji % 20 ji wan re erzani heye. Her weşanxane an ji kîtebfiroşên ku ji 100 daneyî zêdetir kîteban bikirin, ji % 40 ji wan re erzaniheye.

Navnîşana xwestinê:
Apec Tryck & Forlag
Box 3318
S 163 03 Spanga/Sweden

Navnîşana seredane:
Spångavägen 345, Spånga
Tel: +46 8 761 81 18
Fax: +46 8 761 24 90